Goranê helbestvan her di destpêka jiyana xwe de xerîkê kurdayetiyê bû ye û heya dawîya jiyana awata vê çendê hebû ku hertim gelê kurd bigihije awat û armancên xwe. Ji ber vê jî bi her awayî li dijî rejîmê û faşîzmê xebat dimeşand û daxuyanî li dijî wan belav dikirin. Ji ber vî karî jî ji bo cara duyemîn tê girtin. "Li 1954/10/17'ê de bi komek ji aşîxwazên Silêmanî re tê girtin û hukmê salek girtîgeh û salekê ketina dibin çavdêriya polîs bi ser de tê sependin. Heyama zînsana xwe li silêmanî, Kerkuk, Kût , Be'qûbe û Nogra Selman û heyama binçavdêrîbûna xwe jî li Bedrê dimîne".⁴² Li vê demê de jî li

³⁹M. Cefer, Rêbwar Tofîq, h.b, r. 88.

⁴⁰ Xeznedar, h.b, r. 574.

⁴¹ Helebçeyî, h.b, r. 74.

⁴²Helebçeyî, h.b, r.75.

girtîgehê bi cûreyên cuda tê azardan û îşkence kirin. “li sala 1955’ê li girtîgehê şarezerdevaleyê weke îşkence berdane wî”.⁴³ Di vê heyamê de jî temenek tijî eş û azar û dûriya mal û malbatê derbaz dike.

Lê li gor gotina helbestvan, ku ji çavkaniyeke din tê girtin, sedemê girtina yekemîn ya wî sûcdarkirineke bê bingeş bû ye. “sala 1950’ê bi sûdeke bê bingeş tê tawanbar kirin ku du sala di girtîgehê de dimîne û ji azadiyê tê bêpar kirin lê sedem tenê ev bû ku qesdeyek li ser Koriyaya Aza li dijî dagîrkerên Emrîkî gotiye ku vê demê şerê dagîrkirina Koriyaya Aza kirine.”⁴⁴

Eve jî parçeyek ji helbesta ji bo Koriyaya Aza ya bi navê “Lavkê sor ji bo Koriyaya aza”⁴⁵

Azadîxwaz, Girî Girî
 Kewte jêr pêy dirinc, Perî
 Koriyay azad! Seranserî
 Dîsanewe bo “Sigman Rî”
 Text û taracî têk dira
 Le fermanî “Mak Arser”
 Mak Arserî xway Sîgman rî
 Azadîxwaz! Girî Girî

Goran hertin hez ji azadî û aşirtiyê dikir. Ne tenê ji bo Kurdistênê belku ji bo hemî cîhanê aşitî hîva û awata wî bû. “Goran ji bo aşitiyê bi tenê di sinorên nebûna şer û xwînrijandinê de nasekine û dixwaze ku aşitî di hinav û laşê hemî takên civakê de cih bigre, bi awayekê ku aşitî di roxsarê hemî takên civakê de diyar be û rengvede”.⁴⁶

⁴³ M.Cefer, Rêbwar Heme Tofîq, h.b, r. 502.

⁴⁴ Xembar, h.b, r.18.

⁴⁵ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 185.

⁴⁶ Aware Kemal Salih, Rexney Komelayetî û Piraktîzekirdinî le Şîirekanî Goran, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r. 212.

Helbestvan di derbarê ev parçe helbestê de bixwe vê dinvîse ku “eşkereye ku xelkê Koriyayê momonîst in. herçenda ku ez bisilman im û li gor baweriya siyasî democrat im û bi şerefa nasnameyê hevvelatîyê îraqê me, lê cudahiya ayîn, cudahiya boçûn, sudahiya peyrewa ferdandariyê (pergala serweriyê), xwedê çi tiştêkin ku li ser hest û dilovaniyê ku ji kûriya çavkaniya mirovî diqolqole? Bi du çavên ziq dibînim ku kêr xistina ser goştê neteweke azadê azad. Tenê ji ber vê çendê ku çawa dixwaze wisa jiyane dîke. parêzvanê rasteqîn yê demokrasîyê ne, bi hemî dilreqîya xwe dibêjin em çawa hez bikin dê wisa jiyane bikin. Tu kes nezane jî em rûniştîvanên Rojhilata Navîn in. baş dizanîn ku ev dixwazin komên blindest yê di bin desthilatdariya wan de çawa bijîn! Evcar heger bi boneya serhatîye damav ya Koriyayê rondikek dilsozane li ser birînen her du alîyan û xwe birêjim, bawer nakim ku tu kes bikaribe qaweta berlêgirtina min hebe.

Goran

Hewlêr, sala 1951'ê”⁴⁷

Paş ev hemî azar û îşkencê û pîrsgirêkan, car din tê desteser kirin û paş azadbûn ji girtîgehê “li 1956/09/12'ê hukmê girtina wî bi dawî dibe, demek kurt bi sede diçe û dîsan li hêrişa mîrî de ya ku li dijî welatparêzan çêbû, bi sedema destdirêjiya sê alî ya li ser Misrê tê girtin, li 1956/11/17 mehkemeya ûrfî li Kerkûkê hukmê sê sal girtîgehê û her wisa 1000 dînanan weke tezmîn jê re erê dîke da ku heya sê salan tu gotina wî nebe û kiryareke wisa sûc jî neke ku mîr pê xembar bibe, pêwîst dîke ku goran hezar dînareke vegeerîne lê nikare û ji ber vê çendê jî dubare dîkeve girtîgehê û heya 1958/8/10 û paş serkevtina selhildana 14'ê gelawêjê li girtîgehê azad dibe. Goran vê heyamê li girtîgeha Kerkûkê derbaz kiriye”.⁴⁸Paş azadbûn li girtîgeha xwe ya sêyemîn seredana Yekitiya Soviyetê û çîna Millî û Koriyaya Bakûr ya Demokrat dîke û her wekî ku me amaje pê kiribû jî: “di vê demê te tenê bawerî bi Yekitiya Soviyetê hebû, heya jî vê detê vegeeriya û li gel şêx Letîf û yê din Meseleya Kurdan pêşniyarî Yekitiya Soviyetê kirin. ji ber ku ji aliyê berpîrsên vê derê ve hatibû gazî kirin. Dema ku dît tu bala xwe nadin wan vegeeriya.”⁴⁹

⁴⁷ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 184.

⁴⁸ Helebçeyî, h.b, r. 77.

⁴⁹ M.Cefer, Rêbwar Heme Tofiq, h.b, r. 103.

Li gel ev hemî girtin û nexweşiya jiyana vî, hin kesên paşketî li ser yekem girtina vî lêkolînê dikin û dilê vî birîndar dikinku çima ûji ber kîşan sedemê hatibû girtin. “paş derketina ji gitrîgehê û dema berpirsiyariya rojnameya Jînê girte ser milê xwe, kevneperestan ev mijar dîsan sax kirin û li her alî vê çendê belav dikin û Goran jî bi parçe helbestekê bi navê (Segore) bersiva wan dide ku cara yekem li kovara Jîna belav dibe û di vê helbestê de amajê bi wan gode gord û propagandaya nerewa û nemerdane dike û bersiva wan gotinên xirab dide”.⁵⁰ dibêje ku:

Segwer

Ji bo wan yên ku bixwe jî dizanin ku ji neheqiyê dê genî bin:

Tûley dergay axayan gişt
 Kilkî naye sernerey pişt
 Serî kêşa, Dî: binî aw
 Tûley Tîyaye ser dakêşaw
 Goêçkey qut kird...Goçkey qut bû
 Ke boy miran...boy miran zû
 Hep, Hep... Hep, Hep
 Hep, Hep... Hep, Hep
 Bitnême jêr be gaz be qeb
 Bitnême jêr be gaz be qeb⁵¹

Di wan çend malikane de bersiva wan dide ku qise û qiselokan li pişt serê wî dibêjin û bi neheqî gefê lê dixwen û wan dişibîne (se) û ji wan dipirse ku çima weke Sey direvine wî û hepe hepê dikin. tu tiştê ji destê wan nahê û her wekî ku pêşîniyan jî gotine rûbar bi devê sey pîs nabe. Di wir de armanca helbestvan jî ev e ku vê bêje wan. Li gel ev hemî azar û talî û nexweşyane jî, Goran welatparêz e û tu caran natirse ku li dijî wan dijmin û nehezên netewa xwe raweste û heya ku ji desetê wî tê jî ji bo gelê xwe dike û heya dawî nefesa jiyana xwe di xizmeta gelê xwe û hişyarkirina lavên gelê xwe bû ye.

⁵⁰M.Cefer, Rêbwar Heme Tofîq, h.b, r. 477.

⁵¹Belawkirawey Panîz, h.b, r. 293.

5. Malbat û Hevjînên Wî

Helbestvan di jiyana xwe de du caran hevjinî pêk aniye ku navê her du hevjinên wî “Sebrî” bû ye. “Sala 1928-1929’ê Sebriye Ebdullseîd Es’ed dibe hevjinê wî. Ji vê jinê gelek zarok hebûn. Heşt keç û kur. Li hevjinê wî ya duyemîn jî pênc zarok hebûn. Sê kur û du keç. Li jina vî ya yekemîn tenê zarokê maye ku navê wî jî Hohir e. hin ji wan zarokan di zaroktiya xwe de mirin e. Hîva kûr û zarokê wî yê yekemîn e ku sala 1930 tê dinê û sala 1932’yê dimre”.⁵²

Di derbarê karesata mirina Hîvayê kurê xwe perçe helbesteke watedar û tirajedîk bi sernavê “ji bo Hîvayê Kurê Min” dinvise û dibêje ku:

Bo Hîway Kurim⁵³

Hiwa, megrî, heniskî nîwe şew bes helde, bes bgrî!
 Le çawî bêqerarim boçî dermanî wenewiz ebrî?
 Kûrî xom korpelem mîwanî dinyay taze xulqawim
 Eda giryat be zerbey çîz, le rohî pir gilarawim
 Çîye em girye bêxaye, kirûzey nîweşew xurpên?
 Çîye em qetre wîrdaney le çawit bê meal erjên?
 Legel ew xûnçe sawayey Leser xelfî behar erwê
 Çîye ferqit? leberçî ew hetaku sîs ebê enwê?

“Awayê şîvena ku Goran li ser mirina Hîva dike dibe sedem ku helbesta kurdi gelek ber bi jor biçê. Taybetmendiya helbestî gelek berz dike. Bi hesteke helbestî wesfa vê halî dike ku bixwe têde dijî yanî di dema mirina zarokên xwe de”.⁵⁴ Paşê ev hemî diltengî û azar, xwedayê mezin kurek din dike nisîbê wî. “li sala 1934’ê Hogir têde dinê, sala 1936’ê jî Ejîyê kurê wî ji dayîk dibe”.⁵⁵

⁵² M.Cefer, Rêbwar Heme tofiq, r. 86-103.

⁵³ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 159.

⁵⁴ M.Cefer, Rêbwar Heme Tofiq, h.b, r. 501.

⁵⁵ M.Cefer, Rêbwar Heme Tofiq, h.b, r. 95.

Paş demeke kurt ji ber sedema anîna jina duyemîn, dîsa di jiyan û malbata wî de girift derdikevin. Her bi vê sedemê jina wî ya yekem anku diya Hogir û Ejî ji mal namîne û diçe. “sala 1940’ê Sebriye Ebdulkerîm dibe hevjinê wî ya duyemîn û lê jina vî ya yekemîn bi zarên xwe re vî diterikîne. Lê dîsan jî hevkarîya wan dike ji ber ku vê demê li Hewlêrê bû û wan li Silêmaniyê jiyan dikir. Paş demekê ku bi vê jînê re jiyanê dike vî diterikîne û bi zarên xwe re diçe Bexdayê û dîsan mêrê xwe dike. paş vê buyerê jî dîsa Goran vedigere bal hevjinê xwe ya yekemîn. Helbestvan tu helbestek di derbarê hevjinên xwe de negotiye û tenê bi awayeke giştî ji bo jinê helbest gotiye”.⁵⁶

6.Nasnavên Wî

“Her çiqaş ku kale wî beg bû ye jî(Silêman Beg), lê ev nebû Ebdûlla beg. Li destpêkê wele Ebdûlla beg dihate gazî kirin. Lê dema ku dest bi helbest gotinê kur û hate nasîn, nasnava Goran kete serê û li serê ma”.⁵⁷Di derbarê vê nasnavê de yanî (Goran), du bîr û boçûnên cuda hene. An mirov dikare bêje ku bi du cureyan hatiye bas kirin. Hin kes li ser vê bawerê ne ku “Demam ku nakokî û dijmindariya Cafan hebû ye li gel Goranan de, bavê wî Caf bû ye û Cafan bi awayeke neqenc li Cafan mêze kiriye û eve jî li dijî Cafê navê xwe danaye Goran. Da ku ev du eşîrane li dijî hevdu der nekevin. Her li genciya xwe de hesta Kurdayetî û netewî pê re bû ye”.⁵⁸

Hin kesên din jî li gor çavkaniyeke din di vê baweriyê de ne ku helbestvan (Reşîd Necîb) ji bo wî ev nasnav hilbijartîye. Ev her du kes hevalên hevdu yê hezkirî bûn. “di havîna 1930’ê de Reşîd Necîb çend helbestek ji bo wî di rojnameya Jiyan de weşandin û bixwe ev nasnav ji bo Goran hilbijart”.⁵⁹Her wekî ku di dîwana Reşîd Necîb de jî hatiye, nasnava wî ji aliyê Necîb ve hatiye hilbijartin û wî jî qebûl kiriye û pê razî bû ye ji ber ku “Goran bi çavê mamoste û hevalê xwe ji Necîb mêze dikir. Ji ber vê çendê jî nasnava navborî qebûl kiriye û ji ber daxwaza Reşîd Necîb, (Ebdulla Begê Silêman Beg) di helbestê de dibête Goran.”⁶⁰

⁵⁶M.Cefer, Rêbwar Heme Tofîq, h.b, r. 95-98.

⁵⁷ M. Cefer, Rêbwar Heme Tofîq, h.b, r. 108.

⁵⁸h.ç, h.r.

⁵⁹ Refîq Hîlmî, şîr û Edebiyatî Kurdî, r.152.

⁶⁰ Omîd Aşîna, Reşîd Necîb, Jiyanî û Berhemekanî, Weş.Yekem, Weş. Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2001, r. 6.

Hevdem hin nasnavên din jî hebûye ku beriya Goran bikar aniye. “Ebdulla beriya ku nasnava Goran hilbijêre, nasnava wî (Sebrî) bû ye. her wekî ku di gotarekê xwe de li (Pêşkevîtin)ê de av nasnav bikar aniye. Yanî nivîsiye (Ebdullayê Sebrî, Malbata Silêman Begê Katibê Farisîyê). Lê ev nasnave tenê çend caran hatiye bikar anîn û her bi nasnava Goran berhemên xwe pêşkêş kirine”.⁶¹

7. Berhemên Wî

Ku em çavxişanek li ser serhatiya jiyana helbestvan û derbazkirina vî, hevdem li gel vê çendê ku piraniya demên jiyana xwe bi girtin û derbiderî û azara bû ye jî, lê neketiye bin bandorê û hin berhemên bi tam û watedar li paş xwe hêlaye û kurdê pê zengîn kiriye lê di dema jiyana xwe de nekariye wan biweşîn e. “di heyama jiyana xwed de, ji aliyekê nedarî û destkurtî û ji aliyê din rewşa xirab ya siyasî û nebûna dezgehên ronakbîrî û belavkirinê ji aliyê din, nekariye ku piraniya berhemên xwe weke berhemên weşandî bibîn e”.⁶²

Ji ber her sedemekê be jî, çî siyasî an aborî, nekariye ku berhemên xwe biweşîn e. Lê paşê mirina wî hin berhemên wî li ser erkê hin kesayetiyên hatîne weşandin. Weke mînak: “Beheşt û Yadigarî sala 1950’ê ji aliyê mamoste Elaidîn Seccadî ve hatiye weşandin. Paşê jî her di vê salê de Firmêsk û Huner û du havînegeşt ji aliyê Reşîd Arif ve hatîne weşandin. Sala 1980’yê mamoste Mohemmedê Mela Kerîm hemî helbestên wî kom kiriye û (Gişt Berhemên Goran, bergê yekem, Dîwana Goran), ji aliyê Yekîtiya Nivîskanê Kurd belav kiriye. Dîwan yê kiriye 13 beş. Sala 2002’yê jî beşek ji nivîsinên Goran ji aliyê Omêd Aşîna ve hatîne kom kirin û li hewlêrê hatîne weşandin”.⁶³

⁶¹M. Cefer û rêbwar, h.b, r. 96.

⁶² Ebubekir Ebdulla Hesên, Lêkçûn û Ciyawazîyekekanî Nûkirdinewe Lay Goran û Nîmayoşîc, Namey Doktora, Hewlêr, 2007, r. 43.

⁶³Ebubekir Ebdulla Hesên, h.b, h.r.

Gişt berhem û helbestên Goran:

Komeley Yekem:

Beheşt û Yadigarî, Bexda, 1950.

Beheştî Dil

Yadigarî Kon

Lasayî Edebî Osmanî

Komeley Duyem:

Firmêsk û huner legel du havînegeşt, Bexda, 1968

Şîven û firmêsk

Hunere cûwanekan

Du Havîne Geşt

Komeley sêyem:

Sirûşt û Derûn, Silêmanî, 1969.

Sirûştî Cûwan

Dengî derûn

Komeleya çarem:

Lawik û Peyam, silêmanî, 1969

Komeley Pêncem:

Le Kurî xebata

Dilopî Mirwarî

Komeley Şeşem:

Operêt

Komeley Hevtem:

Piyes Leyek perdey Kurta

Komeley Heştam:

Şirî Gep

Komeley nûyem:

Sirud

Komeley Deyem:

Şir bo mindalan

Komeley Yazdeyem:

Wergêraw

Xeyyam Be Kurdî

Şirî be pexşan werğîraw

Komeley Dewazdeyem:

Boza Xawî Mêşil

Komeley Sênzem:

Hemecûr⁶⁴

“Komeley çûwardem:

Gula Xwînî(Piyes)

Komeley Panzem:

Bûka Xemgîn(Piyes)”⁶⁵

Babeta Duyemîn

⁶⁴ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 5-12.

⁶⁵ Receb îçmen, Ebdulla Goran(1904-1905), Helbestvan û Nivîskar:

Tavrost.blogspot.com.tr/2015/05/abdulla-goran-1904-1962-helbestvan.html.

MIJARA DUWEM: QONAXÊN HELBESTA GORAN:

Livir de derbarê hemî qonaxê nivîsina helbesti jî layê helbestvani dixine ber çava:

1. Destpêka Helbestgotinê

Her wekî tê zanîn ev heblestwane li malbateke ronakbîr û zîrek û jêhatî hatiye dinyayê ku bav û kalên vî helbest gotine. Vê sedemê jî bandor li hesta helbestvan kiriye ku helbestan binvîse û bi helbest û nivîsînê re jî nasiyar be. Her wisa, tevî ku evîndarê sirûşt û ciwanîyên Kurdistanê bû ye jî, bi taybet sirûştê balkêş yê Helebçe û Hewramanê, ku bi xwe li helebçeyê hatiye dinê û ev dîmenên rengavreng û şax û bax û bîstanên ciwan yê Helebçeyê bandor li derûn û hesta helbestvan kiriye ku mijûlê helbest gorinê bibe. Bibe fotogirafereke rasteqîne yê ciwanîyê sirûşt û helbesta jiyanê û ciwanîya afiret û jinên kurd ku bala helbestvan kişandine aliyê xwe.

Ji bilî wan jî diyare ku helbestvan di bin bandora helbestvanên berê bû ye û helbestên wan jî xwandine û bûne çavkaniya helbestên wî. Her wisa hîn bûn û zanîn û şarezabûna li ser çend zimanan jî bû ye sedem ku di navbera Goran û helbestê de nasiyarî derkeve. Ev hemî behre û seliqeyên ciwan ku di helbestên goran de tên dîtin, pir caran li helbestên jîmanên din hatîne sîd girtin û ki gor wan helbest gotiye. Heyaku bûye ev helbestvanê mezin. “Goran derdora (12-13) saliya xwe de hêdî hêdî dest bi xwandina wan helbestan kiriye ku bi farisî û kurdî û bi awayeke sanahî hatîne nivîsandin û jê fam kiriye. Her di vê serdemê de car car li ser rêbaza kevin helbest gotiye”.⁶⁶

Lê de jî bo me eşkere dibe ku helbestvan di zaroktiya xwe de xwedê behreya helbestgotinê bû ye û her di zaroktiya xwe de çend ziman zanîn e. Ev jî bû ye sedem ku bi helbest û wêjeya gelên din re têkeldar bibe û sîdê jê bigre. Helbestvan di heyama jiyana xwe de 5 ziman zanîn e. (Kurdî, Erebî, Farisî, Ingilîzî û Turkî). Ev ziman jî bûne sedemê serketina wî. “Beriya her zîmaneke biyanî, bixwandina (Eskendername) û bi hevkarîya bavê xwe hînî zîmanê Farisî bû ye. paşê jî bi sedema xwandina li dibistanê weke şagirt û paşê jî bi rêya mamostatiyê hînî Turkî û erebî yê bû ye û hind ku bikaribe ferhengê bikar bîne jî hînî zîmanê Ingilîzî bû ye”.⁶⁷

⁶⁶ Hilmî, h.b, r.150.

⁶⁷ Hilmî, h.b, h.r.

Goran helbestvaneke mezin û pêşketî bû ye û hertim di jiyana xwe de hewil daye ku nûkirin û afirandin di helbesta kurdî de hebe û li form û rê û rêbazên helbesta kevin dûr bikeve. “Helbestên xwe tenê bi kurdî nivîsandine û lê xwedê wergera ye, helbest ji bo Ingilîziyê wergerandiye û birîtaniyaiyan ev helbest ji bo Filistinîyan kirine goranî û ev helbest di îzgê de jî xwandîneve”.⁶⁸

Li destpêkê de goran zor bi sadeyî û sanahî dest bi helbestê kiriye. Her wekî ku bixwe dibêje “Helbesta vî ya yekemîn di jiyana vî de çar-pênc malik e û ku îro her çî qas têkoşanê dike jî ji bilî du malikan nahête bîra wî. Ev jî wekî diyar bi kêra nivîsînê nahên. Ji ber ku li gor gotina vî bi zimaneke bêşerm a zarokan e û di derbarê hevaleyê xwe yê zarokiyê nivîsandî ye. her di vê serdemê de Goran Xezela xwe ya yekemîn ya heft malikî gotiye ku malika vî ya yekemîn eve:

Le tawî firqetî yarim dilim daîm perîşane.
Weko mecnûnî wêlî kej û deşt û biyabanîm.

Ev perçe helbestê ji bo mamoste Bêxur rê dike. Mamoste Bêxud jî qebûl dikê û pevyâ (Yarim) diguhere û dike (Leyla). Diyar e ku mamoste Goran nezaniye ku li bal Mecnûn yar tenê Leyla ye”.⁶⁹

Vê demê paşde hêdê hêdê Goran bi hunerê re nasiyar dibe û vê carê nasiyariyeke zêdetir bi helbestê re peyda dike. Ji bo saxhiştina helbesta kurdî pênuşa xwe li nivîsînê naragire û li vexwandina her helbestekê diçe jiyaneke din û wêneyê rasterast ya rastiye nîşan dide, ji ber vê çendê jî “Helbest gotina bi dilê goran li sala 1929 û 1930’yê dest pê dike. Havîna sala 1930’yê Reşîd Necîb çend helbestên vî di rojnameya (Jiyan) de diveşîn e û nasnavê (Goran) jî Reşîd Necîb ji bo vî danaye. Helbestên Goran yê herî baş ev in ku hatîne veşandin. Piraniya yê ku nehatîne veşandin jî ev in ku li ser şewaza kevin hatîne gotin û tijî peyvên biyanî ne”.⁷⁰

⁶⁸ M.Cefer, Rêbwar, h.b, r. 91.

⁶⁹ Hilmî, h.b, r. 151.

⁷⁰ Hilmî, h.b, r. 152.

Di destpêkê de helbestên vî tijî peyvên sade û biyanî yên zimanên din bûn. Her wekî helbestvanên berê dest bi helbestê kiriye û paşê dema ku dikeve nava dinyaya wêje û hunera biyanî de, ji bo nivîsandina helbestên xwe pir sûd ji wan girtiye. “Goran xwedê gelek berhem û helbestên hêja bû ye ku evîndarî û civakî û welat perwerî bûn e. Gişt berhemên wî sala 1980’yê di dîvana Goran, çapa yekem de hatîne kom kirin. Goran ji zimanên din çend nesir jî werger kiriye zimanê kurdî. Goran li kovara Hawar li Soriyayê, rojnameyên Jiyanêve, Jîn, Azadî û Kovarên Gelawêj, Dengê Gîtiya Azad, Hîvam, şefeq, Beyan, Bilîse, Ronahî û Namêlke, Diyarî lavan û Yadigarî Lavan yên îraqê helbestên xwe belav kirin e”.⁷¹

Goran di destpêkê de li ser şêwaza kevin helbestên xwe belav kirin e. an ku mirov dikare bêje ku bandora nerîta erebî û terîqeta îslamî li serê hebû ye. ji ber vê çendê jî ku bixwazîn l user ezmûna helbestvan Goran binivîsîn, bêşik bêyî lînêrîna ji rebirduya helbest û qonaxên derbazkirî, dîroka helbesta kurdî nayê zanîn. Her wekî ku tê zanîn helbest jî di hêla demê de li ser du deman hatiye dabeş kirin. helbesta kevin an ya kilasîk û helbesta serdem. Her yek ji wan serdemane jî xwedê çend beş û yasa û rêbaz û programên taybet bi xwe hene. Goran jî di wan qonaxan de derbaz bû ye û helbest gotiye. “Goran di destpêkê de wekî hunerên berê helbest gotiye. Ev awayê helbestan di dîwana wî de gelek in lê paşê vê şêwazê tune dike û hizra ev kelha kevin di dilê wî de hildiveşe û dikeve hizreke nû û di helbest û wêjeya kurdî de serhildanê dike. Hevçerxên wî jî dikevin bin bandora wî û şêwaza nû ku wî bikar aniye. Goran bi ev karê xwe yê girîng karî ku wêjeya kurdî pêxe ser piyan û lapereya hizra kevin biguhere ji bo lapereya hizra nû”.⁷²

Li ser vê esasê jî ji bo me eşkere dibe ku helbestvan her di destpêkê de dest ji helbesta kevin û yasa û rêsayên vê dikêşe û hêdî hêdî ber bi nûkirina helesta kurdî pêngavan radike.

⁷¹ Helebçeyî, h.b, r. 81-82.

⁷² Sidîq Sefizade, Borekeyî, Mejuy Wêjey Kurdî, Weş. Yekem, Weş. Çihir Tebrîz, Bane Kurdistan, 1375k, r.698.

2. Qonaxên Helbesta Goran

Goran yek ji wan helbestvana ye ku di derbarê nûjînkirina helbesta kurdî de xwedê bandoreke mezin e. hevdem li gel anîna navê mamoste Goran mirov dikare navê dibistaneke/pirtûkxwanekeye nû ya kurdî bîne. Ev helbestvanê navdar di çend qonaxan de derbaz bûye û ziman û wêneyeke helbestî ya ciyawaz bikar aniye. Di nava helbestên xwe de xwedê rê û rêbazên taybet bûye. Ji ber vê jî ji hêla helbesta civakî û welatperwerî û sirûştî û ciwaniya sirûştê û bedewiya jinê, weke rêber û bavê nûkirina helbesta kurdî tê nasîn. “ li ser hestên herî resen û nirxdar yên welatperwerî bandorê dike ku mirovan jibo naskirina mafên rewa û xizmet bi av û xak û welatê xwe û xweragirî li hember dijminên gel û parastina sinorên welat han dide”.⁷³

Dema ku behsa helbesta Goran tê kirin, an jî dema ku helbestên vî dixwînîn, ji bilî wate û armanc û peyvên helbestê tam ji hunerên di nava helbestê jî tê birin. Bi awayekê ku mirov dibe nava dinyayeke din de û xeyal û hizra mirov dagîr dike. Ji ber ku wêje û ziman û mosîqaya helbestên wî di asteke jor de ne û bitam in. Di be sedem ku xwendevan di nava deryayeke hunerî de qûm bibe. Her ji ber vê çendê jî “helbesta berz tenê bi wateya xwe ya sereke nahête hilsengandin. Belku tîkeliya ev wateyê li gel ev wate û wêneyan tê hilsengandin ku di ruhê xwendevanên helbestê de çê dike û nîrxê helbestê bi jor de birina hêza îlhambexşîna vê zêdetir dibe”.⁷⁴

Goranê helbestvan jî di helbestên xwe de xwedê taybetmendiyên hunerî yên cûrbicûr bûye ku em di vir de dê amajê pê bikin:

2.1. Zimanê Helbestê

her wekî ku tê zanîn ziman tenê rêye ji bo derbirîna qîse û gotin û alugora qîse û peyvyan di navbera takên civakê û her wisa ji bo ji hevdu tîgîhiştin û avakirina tîkeliyê di navbera takên civakê de. Ji ber vê jî hemî awayên tîkeliyê di jiyana mirovan de bi rêya ziman dibe. Wekî tîkeliyên civakî, ayînî, siyasî û hwd. Lê ziman di helbestê de wekî zimanê asayî yê axiftinê nîne û ciyawaz e. Helbestvan hewil dide ku zimanekê bikar bîne ku tijî peyv û tîgehên bitam û giran û nazik. Ji ber ku “Helbest ev huner e ku

⁷³ Omer Farûqî, Şîrî Kurdî û Şêwazekanî Le Sereta Heta Emro, Weş. Roşenbîrî Hewlêr, 2011, r. 30.

⁷⁴ Mohemmed Ebdul-salam Kefaîy, Edebî Berawirdkarî, Wer. Hejar Rehîmî, Weş. Yekem, Weş.

Rojhelet, Hewlêr, 2011, r. 93.

kereseyê vê ziman e”.⁷⁵ pêwîste ku zimanê helbestê dilê xwendevan bi wêne û kêş û peyvên razandî û hêmana û remzên cûr bi cûr bi coş bîne. Ev tişte jî di helbesta goran de bi awayeke zelal û eşkere tên dîtin û her wekî ku helbestvan bixwe dibêje ku: “wêje û helbest û bi giştî hunerên bedewin her eve ji şerên jîyanê car na carekî leşê mandîyê me ji hembêzê digrît dilê nerehetê me dilawînît her ewe jî carekî dibîte zubanê olî u carekîdî jî dibîte zubanê felsefê û zubanê serkirdeyên şorişê û raperînên gelê, me dikete hember cewr û sitemê, ji xerabîya me diparêzît û bo başîya me han didat, jibo rastîyê û edaletê û mirovîniyê”⁷⁶ di vir de ji bo me eşkere dibe ku Goran bi rêya helbestê bas ji hemî babetên jiyana rojane dike. Çi hêla baş be an xirab an jî kareke baş be an sûc û zilim kirin, helbestvan hewil daye ku bi rêya helbestê afirandinê bike û peyv û têghên nû û îstatîk bikar bîne.

Kemal Xembar di derbarê ziman de dibêje ku: “ziman wekî diyardeyekê ye, an ku sastiyeke ceribandî di nav xwe bixwe de berovajî civakî ye, ev jî destpêka sê asta ye ku yek ji wan pergaleke taybet bi civakê ye ku jê re اللغة tê gotin. ev care ev peyvên ku pê tê axiftin jê re الكلام tê gotin.”⁷⁷ Di çavkaniyeke din de jî di derbarê ziman de dibêje ku: “Helbest çavkaniya xwe ji hest û derûniya helbestvan verdigre û bi ziman peyvên xwe dide der û duvre helbestvan ji aliyê form û naverokê ve dikave nava zimanê afirandinê yê taybet bi xwe.”⁷⁸ Ji ber vê jî helbestvan ji girîngiya zimanê helbestê egehda e û kariye ku di helbestên xwe de bi zimanê bilind û bi bandor helbestan bihûne.

⁷⁵ Mohemmed Endulkerîm îbrahîm, Pêkhatay Zimanî şîrî le Rewangey Rexney Edebî Nû ve Ezmonî şairanî Hewlêr Wek Nimûne, Weş. Yekem, Weş. Mukiryani, Hewlêr, 2012, r. 13.

⁷⁶ Nesrîn Reûf îsmael, Erkî şîr le edebî kûrdî de salanî (1920 - 1958), Weş. Yekem, Weş. rojhelat, Hewlêr, 2010, r. 99.

⁷⁷ Kemal Huseyn Xembar, çend Lêkolîneveyekî Edebî, Weş. Roşenbîrî, Hewlêr, 2006, r. 75.

⁷⁸ Ehmed Heqnas legel Mesûd Perîşan, Towanaxwazî Dengêkî Taybet Le Herzî û Werzî Cuwamêrî da, G.Nûserî Nûê, J. 66î şubatî 2014, r. 16.

Di vir de mirov dikare “zimanê helbestê yê Goran bi ser van qonaxane de dabeş bike”⁷⁹:

2.1.1.Qonaxa Yekemîn: Texlîdkirin

Texlîdkirinê du pêngav pêvîst in:

2.1.1.1.Texlîdkirina ji Helbestvanên Kilasîk:

Di vê qonaxê de, goran jî weke helbestvanên berîya xwe di detpêkê de bi texlîdkirina helbestvanêb pêş xwe dest pê kiriye. Ev tişte ku texlîda helebestvanên weke Nalî, Salim û Kurdî bike, ji aliyê Goran ve weke destpêka danana helbestê tê binavkirin. Bandordariya xwe ji wan girtiye. Her wisa di helbesta wî de gelek peyvên biyanî hene. Peyvên weke Erebi û Farisî û Turkî. Ji ber vê jî her çî qas ku rêjeyeke kêr jî be wî ev rêbaze ceribandîye. “Dinyaya kilasîk di hêla şewaz û babetê de dîtiye”.⁸⁰

Helbestvan bixwe ji jî vê çendê mukur tê ku li destpêka de li ser şewaza kilasîk helbest gotiye. “li destpêka dîwana xwe ya (Beheştî yadigar) de dibêje ku parçeyeke mezin ji helbestên wî yê berê li ser kêşa Eroz e û bi kurdiyê kevin hatîne nivîsandin û gelek peyvên biyanî tede ne. şewaza wan jî kevin e an ku weke Nalî û Salim li ser şewaza Xezel hatîna hûnandin an jî ev şewaz beke bingeh hetîye dîtin ku mamoste Norî û şex salim û hevrêyên wan ji zimanê Osmanî vergirtin û di heyameke sinordar de(1920-1930) helbesta kurdî ya navçeya silêmaniyê pê nûjîn kirin”.⁸¹

⁷⁹ Pexşan Elî Ehmed, şewazî şîrî Goran, Weş. Yekem, Weş. Renc, Silêmanî, 2009, r. 183.

⁸⁰ Fazil Mecîd Mehmûd, Sirût Le şîrî Goran de, Weş. Yekem, Weş. Dezgay çap û Pexşî Serdem, 2007, r.33.

⁸¹ Hilmî, h.b, r. 162.

Di dîwana Beheşt û Yadigar de Gorin ev cûreyê şêwazê ceribandiye ku di vê helbestê de (Tawê Negara) dibêje:

Tawê negera çerxî moxalîf be hîsabim
 Bê nale niya saniyeyek tarî rûbabim!
 Her lehzeyekî mehdî hezar girye bû efsûs
 Salanî mialîm û hemû omrî şebabim
 Ger raste melek nameyî e'imalim enûsê
 Ba sor bê wekû xwênî cîger xettî kîtabim
 Şemêke le ser lêvelerey meynetî min roj
 Estêreyî şew şahîde min sextet ezabim⁸²

Di vê helbestê de helbestvan peyvên (Moxalîf, Hîsab, Saniye, Robab, lehza, omr, şebab, E'imal, şef'I, Meşahîr, Ezab, ... hwd) bikar aniye ku wekî helbestvanên kilasîk peyvên biyanî bikar aniye. Her wisa di helbesta (Ey şewqî Gelawêj) dibêje ku:

Ey şewqî gelawêj beyan nûrî nîgahit
 Ey etrî sefa bûy nefesî zolfî siyahit
 Ey husnî tulû'I wêneyekî feyzî huzorit
 Ey huznî xurûb rojî reşî durî tebabit
 Ey kuşk û seray baxî behest meylî sewabit
 Ey agirî duzex şererî xeşmî gunahit
 Ey îffeteket daxî hesed bû dilî cibrîl
 Her bû hewes û îşweye xolare kulahit⁸³

Di vir de helbestvan peyvên (Etir, Siyah, Husn, Tulu'i, huzur, huzn, qurûb, teba, serab, efîf, kolah, ... hwd) bikar aniye ku hemî peyvên pêgane ne. Ji ber vê jî hatiye gotin ku "Her helbestek turiyeke di bin keproka êmîşê wêjeyê de"⁸⁴

Di wan helbestane de girîngiya ziman bi awayeke eşkere xuya dibe. An ku helbestvan çava dikare bi rêya zanîna zimanên din bi wan helbestan bilîze û ezmûna xwe di derbarê peyvên farisî, erebî û turkî di helbestê de peyda bike. Ji ber vê jî dikarin bibêjin ku "Helbest hunereke ku helbestvan bi rêya zimanê xwe ve bi şêwazeke rêk û

⁸² Belawkirawey Panîz, h.b, r. 80.

⁸³ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 79.

⁸⁴Kejal îbrahîm Xidir, Tarîkî şew û Pencerey îşq, G.Nûsrî Nûê, J. 660, şubatî 2014, r. 32.

pêk û teknîkî danûstandineke hunerî, di firehiya ferhenga ziman de qayîm dike”.⁸⁵Li gor lêkolînek ku pexşan elî kiriye, Goranê helbestvan “di gişt 167 helbestên vî de tenê 37 helbest bi zimanên têkelav hatîne nivîsandin û 130 helbestên din bi zimanê kurdiya resen hatîne nivîsandin. Ev jî tê vê wateyê ku piraniya helbestên wî bi zimanê kurdiya resen hatîne nivîsandin”.⁸⁶

2.1.1.2. Texlîdkirina Wêjeya Osmanî

Di vê qonaxê de jî her wekî ku li nav û nîşanan de derdideve, Goran di bin bandora wêjeya Osmanî de helbest gotiye û an ku weke qonaxa berê di helbestên xwe de peyvên biyanî bikar aniye, ev car sedem çibe, siyasî be an her sedemeke din, di vê derbarê de helbestvan bixwe mikur tê ku di bin bandora helbest û wêjeya turkî de bû ye û dibêje: “nivîskar û helbestvanan dinivîsand. Bi taybet şêx norî û Reşîd necîb û min ku bi hev re di bin bandora wêjeya turkî de bûn û me bi hev re dinivîsand. Lê tenê şêx nûrî helbestên xwe diveşand lê min belav nedikir û ev di vê derbarê de bi neşatê re rûbirû dibû. Wêjeya turdî pirtûkxwaneyeke helbestan yê nû tede peyda bibû ku ji wan re digotin (Odebay Fecrî Atî), di nava wan de jî Tofîq Fîkret û Celal Sahîr bûn û wêjeyaneke din yê turkî ku navê wî Ebdûlheq Hamid bû. Her çiqas ku di vê komê de nebûn jî lê dîsa jî ketîne bin bandorê de”.⁸⁷

Her wisa ji ber ku serdemê Kurdistan di bin dagîrkeriya Osmanîyan de bû, dibê ku ev tiştê bibe sedem ku bandor li wêjeyan û nivîskar û helbestvanan bê kirin. Cebbar Ehmed dibêje ku: “Bandora zimanê turkî bingeh û sedemeke siyasî hebû ji ber ku di vê serdemê de Kurdistan ketiye bin desthilata siyasî ya Osmanîyan. Lê li kêlega vê jî bandordariya wan di zimanê helbestê de pir kêmtir”.⁸⁸

⁸⁵ Azad Ehmed Mehmûd, Bunyadî Ziman le şîrî Hawçerxî Kurdî de (1985-2005), Weş. Duhem, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r. 17.

⁸⁶ Pexşan Elî Ehmed, h.b, r. 187.

⁸⁷ Ebdulrezaq Bîmar, Danîştinêk Legel Goran, G. Beyan, J. 2, Bexda, 1970.

⁸⁸ Cebbar Ehmed Huseyn, îstatîkay Deqî şîrî Kurdî Kurdistanî îraq(1950-1970), Weş. Yekem, Weş.

Dezgay çap û pexşî Serdem, Silêmanî, 2008, r. 122.

Goran kariye di vê qonaxê de jî bi awayeke balkêş û bi afirandin û dahênaneke di asteke jor helbestan bihûnîteve ku têde gelek peyvên turkî û kurdî hene. Di vê debarê de Refîq Helîm dibêje ku: “ev helbestên Goran ku bi awayeke nûjen hatîne hûnandin, ji şêwaza helbestvanên kevin dûr nîne. Di şêwaza Tewfîq Fikret helbestvanê nîştîmanperwer yê turk e ku yek ji wan mirovên zîrek e ku bû sedema hişyarbûna gelê turk û rêxistina ajave û serhildana Osmanîyan di serdemê Ebdulhemîd de. Mirov dikare bêje ku ev Mostezad a Goran di (Le behar de) dema ku bi mostezadeke Tofîq Fîkret tê hilsingandin a Goran di hin hêlan de ji ya wî bedewtir tê berçavan”.⁸⁹

Ev peyvên ki Goran ji bo nivîsandîna helbestên xwe hilbijartine, piraniya wan ji bo xwandevanan nasiyar in û di jiyana rojane ya girseyê de tîn bikar anîn. Berî vê çendê ku helbestvan bikar bîne, xwendevan nas dike û agehdarê wan e. helbestvan bixwe navê hin ji helbestên xwe daniye (Lasayî Edebî Osmanî). Ku ev jî weke belgeheyê bi hêz tê dîtin ji bo vê qonaxa helbestvan tê de. Di helbesta (Jin) de dibêje ku:

Jine ke cîlweyî husnî be îşiq eka perwaz,
 Jine ke qûat exate xeyalî reqis engîz ,
 Jine mûallîdey îşiq û jinîşe îşiq newaz,
 Jine ke tarî rûbabî heyat ekate hizîz!
 Semayî wasîyî dil ger le jin bikey xalî
 Tecellîyatî bedaîy erûb eka, deycur ...⁹⁰

Di vê parçe helbestê deçend peyvên biyanî bikar aniye ku ji bo xwendevanê kurd biyanî nahên. Weke mînak peyvên Husn, qovvet, reqsengîz, mowellîd, robot, eyat, tehzîr, wasî'I, tehelliya, bedayî û ezub û hwd. Her wisa di helbesteke din ya bi navê (Cîlwey Şanû) de ku Refîq Helîm di derbarê vê helbestê de dibêje ku: Cîlwey şanû karê hemî helbestana nîne ku bînin ziman. Ji ber vê jî her çiqas peyvên Farsî û Erebi û têde hene jî, dîsa jî li gor nerîna me di wêneya helbestî ya de di asteke jor û nirxdar yê kurdî tê nasîn. Ev peyvên ku li zimanên biyanî hatîne vergirtin, ziman û guhê xwendevan û wêjevanêk kurd baş dinasin û nebûne sedemê şikesta helbestê. Belku ev peyv li gor babetê xezelê pêdiviyek e ji bo wêjeveke bilind. Ji ber ku wan helbestan xwendevanên xwe yê taybet yê hey. An ku li serevey sinorê wêjeve gel in”.⁹¹

⁸⁹ Hîlmî, h.b, r. 195.

⁹⁰ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 85.

⁹¹ Hîlmî, h.b, r. 196.

Helbestvan di helbesta (cîlwey şano) de dibêje ku:

Le pir ke balî reşî helbirî qelî perde
 Perîy ciwanî, firîştey semayî na dîde,
 Le erşê şanode
 Be îşwe peyda bû:
 Nîgahî mest weku şûley hîdayetî sewda
 Tebessumî mutawalî şîfay hîway mirdû
 Îşaretî hemu nutqî fesîh û elhanî
 Weku kitabî muqeddes bilind û rûhanî
 Be sinetêk eleqê pûzî wek sitûnî sipî,
 We pêy biçukî meharet le erdî zerbe eda ...⁹²

Di vê helbestê de jî peyvên (erş, îşve, nîgah, şoile, tebessom, motewalî, îşaret, notq, fesîh, elhan, kîtab û hwd) biyanî ne. Helbestvan di vê helbestê de bi awayeke giştî komeke peyvên gelek hunerî û bedev û balkêş bikar aniye ku guhê xelkî wan dinasin û wan peyvan sîmayeke kurdî yê hey.

2.1.2. Qonaxa Duyem: Qonaxa Kurdiya Resen

Her wekî ku tê zanîn di helbestan de zimanê zikmakî û resen bandoreke girîng yê hey li ser hûnandina helbestê û li ser xwendevanê helbestê jî gelek bandorê dike. Li ser vê esasê jî: “ di helbestê de zimanê netewî weke yek ji taybetmendiyên resen tê nasîn. Ev ziman mîrata netewî ye. di dawiyê de weke alaveke giştî tê hijmar kirin. helbest pêwîste li gor rêzimana zimanê xwe peyva hilbijêre û bikar bîne û hevokên xwe ava bike. Vê demê jî li gor afirandina xwe ya hunerî a herî taybet teknîk û binyadnana vê alavê di helbesta xwe de ava bike”.⁹³

Di bê qonaxê de zimanê helbesta Goran li helbesya kilasîk ber bi zimanê kurdiya resen guherî. Ji bo vê armancê jî helbestvan zimanê fulklur û pevyên rojane yên gel bikar anî. Di vê derbarê de Xeznedar dibêje ku: “Goran yek ji wan helbestvana ye ku di resenkirina zimanê kurdî di nivîsên wêjeyî (Helbest û pexşan) de xwedê bandoreke xurt e

⁹² Belawkirawey Panîz, h.b, r. 106-108.

⁹³ Cemal Hebîbulla Bîdar, Derwazey şîrnasîn, Weş. Yekem, Weş. Bazarî Zanist, Hewlêr, 2013, r. 41.

Her wisa peyvên hêsan û watedar û hevokên kurt û hêsan bikar tîne. Ev karê vî tenê zimanê wêjeyî zengîn nekiriye belku bi awayeke giştî bandor li ziman kiriye yanî ziman bi awayeke giştî mifa jê girtiye”.⁹⁴Di vê qonaxê de goran xwastiye ku zimanê kurdî û zimanê helbesta xwe li oeyv û wişeyên biyanî paqij bike. Ji bo wêjeyê nû a kurdî hewil daye. Peyv û têgehên kurdiya resen alavên sereke bûne ji bo wêjeya nû ya kurdî, her wisa ji bo derbaz bûn li rêzik û yasayên kilasîk û ji aliyê din jî ji bo pitir nêzik bûna ji zimanê xelkê asayî û fêhmkirina helbestên wî ji aliyê gel.

Her wisa sirûştê vê qonaxê jî wisa dixast ku be bi nûjenkirinê pêngavê rake ji ber ku: “ev rewşa aloz ya siyasî li destpêka sedsala bîstan de hakim bû bandor li jiyana civakî ya gelê kurd kir. Di hêla wêjeyê de bû sedema têketina naverokek nû ku pêdiviya wî bi zimanekê bû ku li zimanê gel nêzik be û di sata têgihîştina wan de be. Ji ber vê jî hevdel li gel selhildana bizava nûjenkirina zimanê kurdî û bilindbûna hesta netewî, zimanê helbestê jî bi guhertinê re rûbirû ma û li zimanekê telihev ku helbestvanên kilasîk bikar dianîn guherî û bû zimanek din ku zimanê kurdiya resen bû”.⁹⁵

Yanî ev rewşa siyasî bû sedem ku naveroka wêjeyê bê guhertin û naverokeke nû têde peyda bibe û helbestvan naveroka helbestên xwe biguherin û zimanê xwe nûjen bikin ji bo afirandina berhemên xwemalî û resen. Borekeyî di vê derbarê de dibêje ku: “bi rastî Goran yek ji biwêjên herî bilind yên kurd ku nerîta texlîdê şikandiye û xwe girêdayî kêşê û paşilê nekiriye. Rêyeke nû di helbesta kurdî de afirandiye û helbestvanên serdema xwe han daye ku binê ser rêya wî”.⁹⁶

Sedemeke din ya vê qonaxê zanebûn û şarezabûna Goran li zimanên biyanî ji bilî zimanê zikmakî bû. Her wisa haydarbûn ji rêbaz û bizavên nû yên wêjeya serdem. Ev jî bûne sedem ku helbestvan pêngaveke nû ji bo bikaranîna peyva resen ya kurdî rabike. “haya Goran li van bizavên nû hebû ku di vê serdemê de bala navendên zindî yên wêjeyê kêşabû yên weke nûjenbûna wêjeya turkî û wêjeya romantic a îngilîzî. Bi rastî jî Goran gelem nivîsên romansî yên bedev yên weke Robert Hîrt û şelî û kêyts û Bayronî wergerandiye zimanê kurdî û weşandiye”.⁹⁷

⁹⁴ Xeznedar, h.b, r. 577.

⁹⁵ Pexşan Elî, h.b, r. 193.

⁹⁶ Bûrekeyî, h.b, r. 755.

⁹⁷ Omîd Aşîna, Goran, Nûsîn û pexşane Wergêrawekanî, Weş. Yekem, Weş. Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2002, r. 9.

Goran gelek zû hest bi vê çendê kir ku pêwîste di helbesta xwe de guherîne pêk bîne û wan rêbaz û nerîtên kevin ku berê bingeş digirt bikar neîne. Her ji ber vê çendê jî hevdem li gel derketina wan rêbazên nû jî, wî jî dest bi nûjenkirina helbesta kurdî kir. Dema ku rêbaza romantîzmê serhilda, komeke rêzîkên taybet bi xwe hebûn. Wî jî di destpêkê de li gel wan heman rêzîk bikar anîn. “yek ji taybetmendiyên romantîzman vegeryan ji bo zimanê giştî an zimanê resen bû. Word Wors ku yek ji helbestvanên romansî yê birîtanî bû, li ser vê bawerê ye ku pêwîste mijar ji nava çîna giştî bê hîlbijartin. Zimanê ku babeta heyî rawe dike jî pêwîst e ku li zimanê girseyê bê girtin ku hêş neketiye di bin bandora şaristaniyetê. Ji ber vê jî goran weke helbestvaneke romansî ber bi aliyê zimanê qisekirina gel û xizîneya folklorê kurdî vegeriya”.⁹⁸

Her çî qas helbestvan zimanên biyanî jî dizanîn, bitaybet zimanê inglîzî û her wisa bizavên nû yê wêjeyî jî nas dikirin, sedemeke din ku bandor li goran kir ber bi xizîneya folklorê gel û netewa xwe vegere, mamostetiya wî li gundên Hewraman û Helebçê bû ku bala wî ji bo ev sirûştê bedew dikêşa ku di helbesta vî de diyar e. Vê çendê jî li ser resenbûna zimanê helbestên wî bandor kiriye. “ji bo vê armancê jî bi zîrektî hin rê ceribandî weke mînak, berê xwe da xizîneya netewî ya di helbesta helbestvanên berê û bi taybet Mewlewî û folklorê kurdî û her wisa heyameke dirêj ya mamostetiya di gundên Kurdistanê de ev kare pitir ji bo wî hêsan kir. Ji ber ku çûna vî bo nava xelkê de bû sedem ku xizîneyeke nû bixwe kom bike û di helbestên xwe de bi awayeke bedew û serkeftî bikar bîne û di hêla rêzîman û hunera helbestan de gelek agehdar be”.⁹⁹

Ji ber vê jî kariye ku ji zimanê girseyê sûd bistîne û vî zimanî di helbestên xwe de bikar bîne. Ji ber vê jî dikarin bêjîn ku goran yekem kes e ku karî xwe ji ziman û peyvên biyanî rizgar bike û zimanê folklorê netewa xwe bikar bîne. Di vê derbarê de Hilmî dibêje ku: “heya beriya giran wisa hizir dikirin ku bi peyvên resen yê kurdî helbestek di asta bikind de nahê gotin. Lê ji ber şewaza ku Goran bikar anî ev nerîn hate guhertin”.¹⁰⁰

⁹⁸ Pexşan Elî, h.b, r. 194.

⁹⁹ Fazil Mecîd, h.b, r. 119.

¹⁰⁰ Hilmî, h.b, r. 169.

Ev bîr û baweriye jî li gor guherîna qonaxên civakî li bal her takekê tûşî serhildabê tê û “ neteweperestî û welatperwerî li gor wateya xwe ya zanistî berhemê qonaxeke tayber yê guhertinên civakî yên mirovahiyê ne û beriya vê qonaxa nû nebûne”.¹⁰¹ Hevdem li gel vê qonaxê jî helbestvan helbestên xwe li jiyaneke sade û civakî ya gundan wergirt û wêneyeke bedew û sade ava kir. “zimanê Goran poxte û sax û resen û bedew û rewan e. xwe naêxe tengasiyê û resentiya xwe ji zimanê xelk û xizîneya resen ya netewî verdigre”.¹⁰²

Helbestvan di helbesta Kurdistanê de dibêje ku:

Kurdistan: cêgamî cêy hezar salem;
 Perwerdey em dûl û serlûtkey yalem,
 Henasem têr bonî bay kwêstante,
 Dû lêwim parawî befrawante,
 Sirincim rahatoy zîwî zerkefte,
 Be zerdey ser befrî êware wexte,
 Guwê m fêre bîstinî xurey qelbeze,
 Lew astey jûr befre, dawên giyay sewze,
 Zimanim pişkuwtûy qisey ciwante,
 Qisey naw goranî şaxekante, ...¹⁰³

Goran di vê helbestê de bi awayeke gelek balkêş bas ji dîmen û sirûştê kurdistanê dike, ev jî weke helbestvanên din ji wênekêşana sirûştê dîr nîne. Her ji ber vê çendê jî “hatîye gotin û tê gotin ku parçeyeke zêde ji helbesta kurdî ji xwezayê îlham digre. bi wê wateyê ku ferhenga helbesta zimanê kurdî bi piranî ferhengeke sirûştî ye. parçeyeke mezin ji ferhenfa zimanê helbesta kurdî ji alavên sirûştî yên nava sirûştê kurdistanê pêk tînin û ne sirûştê destkirî yê di nava jiyane bi awayeke taybet û jiyana şaristanî bi awayeke taybet”.¹⁰⁴

¹⁰¹ Mohemmedî Mela Kerîm, Nalî le Kilawrojney şîrekaniyewe, Weş. duhem, Weş. Aras, Hewlêr, 2009, r.54.

¹⁰² Izeddîn Mistefa Resûl, Edebiyatî Nûeyî Kurdî, Weş. Ferkirdinî Bala, Hewelêr, 1990, r. 149.

¹⁰³ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 152.

¹⁰⁴ Zana Xelîl, Ferhengî Zimanî şîr û çend Xwendineweyek Dike, Weş. Yekem, Weş. Rojhilat, Hewlêr, 2013, r. 6.

Goran jî ev peyv di helbesta Kurdistanê de bikar aniye ku li gor sirûştê bedew yê kurdistanê ye. Zimaneke nazik û tijî peyvên hêsan û resen yên kurdî bikar aniye. Bi vegera ber bi folklorê kurdî û welatê bav û kalan ku Kurdistan e, Qeredaxî di derbarê vê helbestê de dibêje ku: “helbestvan bi awayekê gêrêdaîbûna xwe bi welatê bav û kalên xwe berceste dike ku hemî hebûna wî tenê çavkaniya xwe li vê derê digre. Sedemê evîndariya kurdistanê sedemeke romansiye an jî wateyeke xurt yê hey û ev girêdayî bûn berhemê hest û hişyariya netewî ye”.¹⁰⁵

Her wisa li helbesta (Geşt le Hewraman) de ku ji hin parçeyan pêk tê, helbestvan bi awayeke şareza peyvên bedew û resen yên kurdî bikar aniye û dibêje ku:

Komelê şaxêk sext û gerdin geş, “Dîmenî rêga û ban”
Asmanî şînî girtota bawes,

Pêş ewey bigey be awatî dê “Rêgay Naw bax”
Ekşête naw bax tûle marî rê.

Serçawey awêk: kelekêk leser, “Kanî jinan”
Jinêk tîy eçê, jinêk dête der

Jinî hewraman: sertapay xişil, “Jin”
Serçawey bonî mîxek û simil

Eşqî êwarey sere rêyî kanî “Goranî”
Ber edate çem kilpey goranî! ...¹⁰⁶

Ku bala xwe bideyn wan çend parçe helbestên li jor, mirov dibîne ku piraniya peyvên wê ji kanî û xezîneya folklorê sirûştê bedew yê Kurdistan û Hewramanê û ji jiyana civakî ya xelkê vî çavkaniya xwe digrin. Ji ber vî jî tê gotin ku: “ziman berhemeke civakî ye. mala civakê ye. ji ber vî jî li ser pêdiviyên gel tê ava kirin û xwedê

¹⁰⁵ Eta Qeredaxî, Deselatî Ciwanî Sirûşt û be perawêzkirdinî xwedy Kurd wekû biker le şîrî Kurdistanî Goran da, G. Karwan, J. 188-189, 2004, r. 4-5.

¹⁰⁶ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 117-120.

ev gel û ev civakê ye”.¹⁰⁷ her wisa Alan dibêje ku “zimanê teksta wêjeyî zimanêke şexsî ye ku bi rêya axaftina rojane peyda bû ye û hatiye ser rê (Xerîb) û (Mecazhez)”.¹⁰⁸

Mirov ji xwandina helbestên Goran pi tanê dibe û hizr û xeyala mirov ber bi vê sirûştê bedew dikşîne, bi awayekê ku “hemî ev wêneyên ku Goran pêşkêş dike, wêneyên rasterast yê gûndewariya kurdî ne û bi awayeke îdealîk hatîne saz kirin, her wekî ku kurteyek be ku li dûv rastiye dikeve bi şewazeke helbestê ku kakilê vî jî romansiye”.¹⁰⁹ Helbestvan di piraniya helbestên xwe de hewl daye ku bas ji rastiyeke civakî yê kurda bike û di vê derbarê de jî şoreşeke mezin kiriye. Mijarên xwe li jiyana civakî hîlbijartiyê û tablukeye bedew û hunermendane awa dike. her wekî ku di helbesta “Gûlî Xwênawî” de dibêje:

Kur: Birwane! şaiye, çopiye lew male

Gwê bigre! zurnaye, dehole, şimşale!

Zerd û sûr têkel bûn, jin û pîyaw, heraye

Lew nawe her harey heyasey to naye!

Sa tûxwa xêrake ba biroîn dest bigrîn

Bekamî dildari pêkewe helperîn!

Kiç: Gûl nebê bo serim al çepkê, zerd çepkê

Nayem bo zemawen, nayem bo helperkê!

Di vir de goran wêneyek ji gotûbêjeke sade û sanahî a di navbera keçek û kureke civaka kurdî hildibijêre ku di nava gelê kurd de gelek ... bû ye û şahiya reşbelekê yek ji diyardeyên jiyana kurdan e ku di dema xweşî û şahiyê de di berê de heya îro heye û her maye. Goran di vê helbesta xwe de bezma ev qîz û kurey bi şewazeke hunerî pêşkêş dike ku di vê de kur daxwazê ji qîzîkê dike ku bêt bo nava şahiyê û destê hevdu bigrin û dawetê bikin lê qîzîkê vê çendê qebûl nake û dibêje ku heya destegukekê rengavreng ji bo ber serê wî nebe ahengê nagêre û dawetê nake. Di dawiyê de jî kurik bi destê dijminan tê qurbanî kirin. di derbarê vê helbestê de Hilmî dibêje ku: “helbest û wêje ev nîne ku tede

¹⁰⁷ Azad Zal, Zimanê Kurdî, Weş. Duhem, Weş. Bizim Buro Enqere, 2015, r. 26.

¹⁰⁸ Alan Remezani, Destpêkek ji bo zanista edebiyata modern, Weş. yekem, Weş. peywend, îstanbûl, 2015, r. 94.

¹⁰⁹ Ebdulla Debax, Goran û Goldesmet û tazekirdinewe lu honrawe de, G. Roşenbîrî nwê, J. 118,

Hozeyranî 1988, r. 103.

peyvên guhdarnekirî hebin an jî bi wateyeke din hewl bide ku hizreke sade û wêneyeke sanahî di xwe de veşêre û bi awayeke bê sûd balê bikşîne. Wêje ev e ku bikaribe bi çend peyvên sade lê mosîqavî û bi ageng û nexme, perde ji ser wêneyeke şirîn hilde an jî bala wan yên ku gelek balder nîn bixe ser wêneyeke bedew yê ku nayê fikirîn ”.¹¹⁰Bi wî awayî helbestvan karî bi rêya zimanê sade û nû û di helbesta kurdî de, bibe rêberê nûkirina helbesta kurdî û dîrokeke serkêş qeyd bike di nava lapereyên helbesta kurdî de.

2.2. Mûzîka Helbestên Goran

Gorankariyên di hêla aborî û siyasî û civakî ku di sedsala bîstan de li gişt herêmên cîhanê rû dan rêxweşker bûn ji bo geşedan û nûbûna wêjeyê bi awayeke di hemî welatan de bi awayeke giştî. Wêjeya kurdî jî ji vê çendê bêpar nebû û mil bi milê welatên din di pêşvebirina helbest û wêjeyê berdewam bûye û kariye ku wêjeya xwe nûjen bike û di rê û rêbazên helbest û wêjeyê de guherînkariyan pêk bîne. Wêjevan û helbestvan karî ku gişt şêwazên helbestê ber bi pêş biben. Ziman û wêne û mûzîka helbesta xwe nûjen bikin. Mûzîka helbestê jî ji kêlega ziman û wêne yek ji bingehên girîng yên helbestê ye û bingeha helbesta bihêz û xurt e. ji ber ku awaz û mûzîka her helbestekê hest û tameke zêdetir dide xwendevanan û lertzê têxe mêjî û dil û laşê mirovan. Mûzîk bingehêke bingehîn e ji bo bedewî û îstatîka helbestê. Li ser vê esasê jî “Mûzîka helbestê di şêwaza helbestê de bingehêke wêjeyî ya girîng e. ji ber ku mûzîka helbestê bandorê li hesta bihîstina mirovan dike. bitaybet ku asta nazîkbûna hesta bihîstina helbestê li bal hin kesan bi awayeke gelek balkêş hevdem li gel tirpe û awaza mûzîkavî ya helbestê ber bi jor dibe”.¹¹¹

Di vê hêlê de helbestvanên kurd bi awayeke giştî û Goran bi awayeke taybet hevdem li gel guherînkariyên sedsala bîstê helbestên xwe guherandin. Ji ber vê jî “Helbestvanek weke Goran her di sedsala bîstan de bi gûr û tîn hat û heya roja dawî ya jiyana xwe sar nebû û berhemên nû pêşkêş kirin”.¹¹²

¹¹⁰ Hîlmî, h.b, r. 171.

¹¹¹ Rizgar Omer Fetah, Romansizm le şîrekani Hêmin û mihemmed Nuri de, Weş. Yekem, Weş. Mukiryani, Hewlêr, 2013, r. 187.

¹¹² Omîd Aşîna, Reşîd Necîb Jîyan û berhemekani, r. 14.

Goran di mijara nûkirina mûzîka helbesta kurdî de bandoreke xurt hebû. Awazeke bedew û balkêş daye peyvên xwe. Ji ber vê jî parçeyek ji helbestên vî ji ber bedewî û xweşbûna awaz û mûzîka peyvên wan kirîne stran. Goran gelek zû xwe ji form û kêş û rêsa û rêzikên kilasîk dûr kir û karî mûzîkeke bi cûş û xorûş bide helbestên xwe.

Mûzîka helbestê dibe du parçe:

2.2.1. Mûzîka Derweyî ya Helbestê

Mûzîka derweyî ya helbestê hemî wan hêlên bedew nîşan dide ku rûyê helbestê dagîr dikinku ji kêş û beşavend (qafiye) pêk tê.

Kêş û beşavend jî di helbesta helbestvanên hemî netewan de heye, lê di her zimanekê de bi awayên cîyawaz tê bikar anîn. Di nava zimanê kurdî de jî rîtm û mûzîk û kêş û beşavend xwedê girîngî û taybetmendiyên xwe ye û mirov dikare bêje ku mûzîka derweyî helbestê ji mûzîka nava vê girîngtir e. Ji ber ku mûzîka derweyî helbestê awayeke cûş û xurûşê dide çav û huhê xwandevevanan û pitir bala vad dikşîne.

Mûzîka derweyî helbestê jî ji kêş û beşavendê pêk tê.

2.2.1.1. Kêş

Kêş yek ji bingeh û esasên helbesta kurdî ye û li kêlega beşavendê mûzîka derweyî ya helbestê pêk tînin. Di pênaseya xwe de jî helbest nivîseke ku ji kêş û beşavendê pêk tê, ji ber ku kêş “li kêlega beşavendê hevdu temam dikin, her du bi hev re vê deng û awaza taybet didin helbestê ku tewjimeke derbirîn û bandorkirinê didenê”.¹¹³

Di vir de girîngiya vê pênasê bi awayeke eşkere diyar e. Hebûna cûreyekê kêş û mûzîkeke bicoş pêdiviya herî girîng ya helbestê ye. Bêşik em hemî agadarîn ku helbestvanên kurd jî an baştir e bê gotin helbestvanên kilasîk jî di destpêkê de bi kêşa eroz ya erebî dest pê kirin e. Paşê jî hevdem li ger guherînên siyasî û civakî û ayînî û aborî û hwd yên serdemê û derketina rêbaz û bizavên cîyawaz, helbestvan jî hêdî hêdî dest bi nûjenkirina helbestên xwe kirin û guherînên bingehîn bi ser de anîn. Sirûşt û

¹¹³ Ezîz Gerdî, Kêşî şîrî Kilasîkî Kurdî û Berawirdkirdinî legel Erozi Erebi û Kêşî Farsî da, Weş. Yekem, Weş. Wezareti Roşenbiri, Hewlêr, 1999, r. 84.

folklor a kurdî û xezîneya kelepora netewî û kêşa xwemalî hembêz kirin. ji ber vê çendê jî mirov dikare bêje ku “di helbesta nû ya zimanê kurdî de du awayên rêçkeyan hene:

Rêçkeya Yekem: ev bivêjên ku tên gotin û li gor bivêjên me yên kevn in û li mêj e ku bi rêya zimanê farisî hin taybetmendî ji eroza erebî vergirtin e.

Rêçkeya Duyemîn: rêçkeya bivêjîn nû ye û li ser bingeha hejmara kêteyan diçe. ji her pêngaveke dirêjên helbestê bi wêneya kêşa ferensizî”.¹¹⁴

Ji bo goran jî nûjenkirina helbestê hat wateya guhertina nasnameya kêşa helbestê. Mirov dikare bêje ku goran bi awayeke giştî sê cûreyên kêşê di helbestên xwe de bikar aniye. Ev jî (kêşa eroz ya erebî, kêşa penceyî an xwemalî û kêşa têkel in). Di derbarê kêşa helbesta goran de Refîq Helmî dibêje ku: “di demekê de ku pir kes jî bo beşavendê êxsîr diman, Goran beşavendê êxsîrê xwe kir. Ji bo beşavendekê taybetiya rawanê û saxlemiya hizra xwe têk nedida û bi meyla xwe kar bi beşavendan kiriye”.¹¹⁵

Av jî tê vê wateyê ku helbestvan gekek zû xwe ji kêşa helbesta kevin rizgar kiriye û di helbesta xwe de kêşa nû bikar aniye. Ev kêşe ji aliyê Xelîlê Ehmedê Ferahîdî ve hatiye afirandin û bi rêya helbesta Farisî derbaz zimanê kurdî bû ye.

2.2.1.1.1. Kêşa Eroz ya Erebi

“Kêşa eroz di helbesta kurdî de bi awayeke zêde tê dîtîn. Her wisa ji aliyê helbestvanên romantîzmê jî kêşên wekî Hezec û Remel hatiye bikar anîn”.¹¹⁶

Ji ber vê çendê jî her wekî ku ma got, Goran di destpêka helbest gotinê de, ev awayê kêşê bikar aniye. An ku bi texlîdkirina helbestvanên berê dest pê kiriye. Lê zûde hewil daye ku xwe ji vê çendê dûr bigre. “yê ku cihê baskirinê ye ev e ku Goran girêdayî kêşa eroz nebû ye û xwe jê dûr girtiye. Her çiqas ku zimanê kurdî xwedê hin taybetmendiya ye ku li gel zimanê erebî yek nagirin”.¹¹⁷

¹¹⁴ Aşina, Goran niwîsîn û pexşane vergêrawekanî, r. 157.

¹¹⁵ Hîlmî, h.b, r. 174.

¹¹⁶ Rizgar Omer, h.b, r. 189.

¹¹⁷ Fazil Mecîd, h.b, r. 126.

Di derbarê kêşa eroz di helbestên Goran de Doktor Marif Xeznedar dibêje ku “Goran li behrên erozê ev bikar anîn e: (Hezec, Moctes, Mozarî’I, Remel, Xefif, Miteqarîb, Recez), pirit ji çil parçe helbestan di vê derbarê de heye”.¹¹⁸

Goran di helbesta (Eroy Oxir)¹¹⁹ de kêşa Hezec ya Heştâ temem bijkar aniye.

E/roy/ o/xir/? E/roy/ o/xir/? Ne/zer/ na/key/ e/roy/ o/xir
 + - - - + - - - + - - - + - - -
 Mefaîlun Mefaîlun Mefaîlun Mefaîlun

He/yam/, eq/lim/, d/il û/ dî/nim/ he/der/ na/key/ e/roy/ o/xir
 + - - - + - - - + - - - + - - -
 Mefaîlun Mefaîlun Mefaîlun Mefaîlun

“Hezeca heşt ya temem”

2.2.1.1.2.Kêşa Pence

Paş ku helbestvanên guherînxwaz yê kurd xwe ji kêşa eroz rizgar kir, tasa xwe bi xizîneya folklore û kelepura kurdî û qîseyên rojane yê kurdan dagirtin. Vê çendê jî pêdivî bi kêşeke xwemalî hebû. Ji ber vê jî kêşa Pence yan kîte ya xwemalî di helbestên xwe de bikar anîn. “ev ewayê kêşê li ser esasê hejmara kîteyan tê afirandin. Ev kêş li gor bingeh û taybetmendiyên zimanê kurdî ye. gihê vê kêşê jî di wêjeya folklore de heye û gişt behemên zimanê kurdî yê folklorî bi vê kêşê hatîne nivîsandin”.¹²⁰Mirov dikare bêje ku ev kêşa hanê nûbûna wêjeya kurdî diselmîne û Dr.Azad di vê derbarê de dibêje ku: “kêşa xwemalî bi serê xwe kêşeke cûda ya helbesta nû ye ku hebestvan di nava helbestê se kîteyêke hevpar bikar tînin û li ser her du nîve kîteyan de dabeş dikin. ji ber vê çendê jî weke diyardeyekê mirov dikare bêje ku ev kêş bingeha nûjenkirina Helbesta kurdî ye”.¹²¹

¹¹⁸ Xeznedar, h.b, r. 577.

¹¹⁹ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 77.

¹²⁰ Safiye Mihemmed Ehmed, şewazî şîre Kurdiyekanî Pîrbal Ehmed, Weş. Yekem, Weş. Rojhilat, Hewlêr, 2014, r. 54ü

¹²¹ Azad Ebdulwahid, Kêşey Nûkirdinewey şîr, Kêşî xomalî û raberayetî şîrî nwê, G. Karwan, j. 66, 2006, r. 17.

Ji bilî vê jî di çavkaniyeke din de hatiye ku dibêje: “kêşa xwemalî di helbesta hevçerxa kurdî degirêdayî bizava goran e, ku di bikaranînê de çend têgehên weke Xunçe, Pence, hêma, Meqte’i jê re diyar kiriye”¹²² Helbestên goran tijî ev awayê kêşê ne û helbestvan bi awayeke baş bikar aniye û bixwe jî di destpêka Beheşt û Yadigar de dibêje ku: “Helbestên nû bi kêşên (Pence, Hîca) hatîne hûnandin û her çiqas ku helbestên dubeşû yên berê bi vê kêşê nehatîne hûnandin lê ji ber ku kêşa taybet ya me ya netewî ye û li gor taybetmendiyên zimanê me ye, min pêwîst dît ku di heyama hewla xwe ya edebî de roj bi roj vê kêşê pitir bikar bînim. Heya di wan salên dawî de kêşa eroz bi awayeke giştî di helbestên min de derkertiye, ji bilî di dema ku pêdiviyeyeke taybet hebe”¹²³.

Goran di vê de jî gelek kêşên cûr bi cûr bikar aniye. Weke mînak 5,6,7,8,9,10,11,12,13,14,15 û 16 kîteyî. Di derbarê vê kêşê de Dr. Marif Xeznedar dibêje ku: “di kêşa helbesta sêlabî yê xwemalî de xengîn e, hemî awayên kêşê bikar aniye, bitaybet kêşa deh û heşt û heft kîteyî, û yên din jî di nav wane de bitaybet di nava deh kîteyî de bikar aniye”¹²⁴.

Goran di helbesta (Berxekem) de kêşa 5 kîteyî bikar aniye.

Ey berxoleke
Nerm û noleke
Sipîû xirpinî
Wek kulûy loke
Destemo û çeşî
Fêre baweşî¹²⁵

Her wisa di helbesta (Sa goranî kew) de kêşa 7 kîteyî bikar aniye û dibêje ku:

Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq
Şaxî berz û berdî req
Cêgay çêle û cêgay beq
Qeqbe, qeqbe, qeqbe, qeq¹²⁶

¹²² Mohemmed Bekir, kêş û rîtmî şêrî folklorî kurdî, Weş. yekem, Weş. wezaretî perwerde, Hewlêr, 2004, r.18.

¹²³ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 40.

¹²⁴ Xeznedar, h.b, r. 577.

¹²⁵ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 321.

2.2.1.1.3.Kêşa Têkel ya Eroz û Xwemalî

Ev awayê kêşê di bingeha xwe de xuyaye ku têkel kirina du cureyên kêşêdi helbestekê de arman digre, Ku ev çend jî girêdayî jîrbûn û jêhatîbûna helbestvan e. Kêşa têkel jî “ev têkelkirine jî di encama têkelkirina du yan çend kêşan çê dibe û an jî di encama têkelkirina du kêş yan zêdetir pêk tê. An ku di encama têkel kirina kêşa eroz û kêşa xwemalî de. Yanî têkelkirineke tenê di çarçûveya erozê de namîne û kêşa xwemalî jî li xwe digre”.¹²⁷

Goran kariye ku di yek helbestê de komeke kêşên ciyawaz bikar bîne û di kêşa helbesta kurdî de guherînkariyeke baş pêk bîne. Ji ber vê jî mirov dikare bêje ku: “Goran vegeyriyaye ser kit bi kit kêşên kurdî bikar anîne û tê dîtîn ku bi wan kêşa kêşên nû aniye zimanê kurdî de û di helbestekê de çend kêş bikar anîne”.¹²⁸Bikaranîna çend cûreyên kêşên xwemalî weke kêşa 6 û 8 û 7 û 11 û sê kîteyi û du kîteyi di helbesta bi navê (Yar)¹²⁹ de tên dîtîn.

Yar Yar 1+1=2

Şîrîn lenceûlar 2+2+1=5

Çawim riwa 2+2=4

Sebrim siwa 2+2=4

Hêzim lê bira 2+2+1=5

Her nehatî der nekewtî 4+4=8

Boçî tuxiwa 2+2=4

Yar yar Şîrîn lenceûlar 1+1+5=7

¹²⁶Belawkirawey Panîz, h.b, r. 319.

¹²⁷ Pexşan Elî, h.b, r. 82.

¹²⁸Pexşan Elî, h.b, r. 138.

¹²⁹ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 161.

Her wisa di têkelkirina kêşa eroz û kêşa xwemalî de pir xurt bû ye. di helbesta (Awatî dûrî)¹³⁰ de bi baldarî nexşe ji bo vê çendê kişandiye û dibêje ku:

| | |
|--|-------------------------------|
| Ey/ ça/w û/ çeş/nî/ ba/zî/ qe/fes/ hel/we/rî/ pe/rit | Muzarîyê Heştê Exreba Mekfofa |
| Kwa/ ba/le/ tî/je/ka/nî/ nî/gay/ hus/nî/ dîl/be/rit | Mehzof |
| - - + / - + - + / - + - + / - + - | |
| Mefulu faîlatu mefaîlu faîlun | |

| | |
|----------------------------------|-----------------------------|
| Kwa/nê/ du/ ça/wî/ mest/ kwa/nê | Kêşa Xwemalî Ya Heşt Kîteyî |
| Kwa/nê/ bi/roy/ pey/west/ kwa/nê | |

| | |
|---------------------|-----------------------------|
| Kwa/nê/ zul/fî/ reş | Kêşa Xwemalî Ya Pênc Kîteyî |
| Kul/mî/ a/lû/ geş | |

| | |
|-------------------------|----------------------------|
| Kwa/ hey/ke/lî/ ce/mal | Kêşa Xwemalî Ya Şeş Kîteyî |
| Kwa/ hus/nî/ bê/ mî/sal | |

2.2.1.2. Beşavend(Qafiye)

Yek ji bingehên din yên girîng yê mûzîka derveyî ya helbestê beşavend e, ku li kêleka kêş weke yek ji hêmanên bingehîn tê naskirin ji bo mûzîk û awaza derveyî ya helbestê. Her çiqas ku beşavend jî di hemî zimanên cihanê de weke hevdu bikar nahê, li hin cihan xwedê girîngiyeke zêdetir e. Beşavend pêk tê ji: “Deng an komdengeke ku di daviya hemî malikan an yek ji du malikan an an li cihekê de dubare dibe û awaz û mûzîkek ciwan dide hemî helbestê”.¹³¹

Hevdem li gel jidayîkbûna helbestê beşavend jî hatiye afirandin. Beşavend di encama dubarekirina kîteya dawî ya malikan der dikeve. Pir caran helbestvan mandî dike û wateya peyvanji bîra wî dibe, tenê ji ber vê çendê ku bikaribe beşavendan

¹³⁰ Belawkirawey Panîz, h.b r. 45.

¹³¹ Aso Omer Mustefa, Beha îstatîkekanî şîr lay Pîremêrd û şêx nûrî şêx Salih û Goran, Weş. Yekem, Weş. Xanî, Dihok, 2009, r. 118.

biafirîne. Ji ber vê çendê jî pir caran naverok dibe qûrbaniyê beşavendê. “Beşavend di zimanê erebiyê de tê wateya rawestan, ji bo rawestanê. Ev cihê ku pêdiviye helbestvan jê raweste. Bandor dikeve dawiya malika helbestê. Gelek caran ji bo pexşanê jî tê bikar anîn. Lê di zimanên ewropî de tê wateya dubarebûna dengên wekhev di demeke diyar de, bi piranî jî dikeve dawiya malikan”.¹³²

Li destpêka avabûna helbestê de heya îro, di derbarê beşavendê weke yek ji bingehên sazkirina helbestê, hizrên cuda derketine. Li gor hin hizran beşavend pêdiviya bingehîn û sereke ye di afirandina helbestê de û hun caran jî weke parçeyeke ne pêwîst hatiye naskirin ji bo helbestê ku hebûn û nebûna vê tu cîyawaziyekê nake. Ji ber vê çendê jî “Ereb gelek girîngiyê didin beşavendê û weke yek ji hêmanên bingehîn yên helbestê didin naskirin. Ji ber vê çendê jî di pênaseya helbestê de dibêjin ku helbest gotineke xwedê kêş û beşavend û watedar e”.¹³³

Li kêlega vê çendê jî li bal hin netewên din weke hêmaneke ne pêwîst tê naskirin ku tu cîyawazî di navbera hebûn û nebûna vê de nîne û mirov dikare bikar neîne. Di vê derbarê de Folterê Firansîzî li ser vê bawerê ye ku: “îtalî dikarin çavê xwe li ser beşavendê bigrin. Ji ber ku her jîmanek xwedê taybetmendiyên xwe ye. Me weke firansîzî gelek pêwîstî bi dubarekirina hin dengên di hin cihên pêwîst yê hey heya ku helbest û pexşan di zimanê me de tevlihev dibin, ev jî di demekê de ye ku cûreyê xwandina helbestê li bal îtaliyî û îngiliziyan ji bo diyarkirina birgeyên kurt û dirêj kafiye. Ev awayê xwandinê jî parastinê ji awaza helbestê dike bêyî ku tu pêdiviya vê bi beşavendê hebe”.¹³⁴

Helbestvanên klasîk bitaybet yên ku eroza erebî peyrev dikin, yekbûna beşavendê bingeh digrin û mûzîka derveyî a helbestê pê ava dikin. Beşavend di helbesta klasîk û bi taybet ev helbestên ku li ser bingeha eroz hatine nivîsîn de weke pêwîstiyê sereke hatiye dîtin ku hebûna vê weke şerteke bingehîn e di afirandina helbesta klasîk de. Lê di helbesta nû de girîngiya berê yê beşavendê namîne û hebûna vê weke pêwîstiyekê bingehîn ji bo helbesta nû nahête dîtin, her çiqas ku helbestvanên helbesta nû nekarîne çavê xwe bi awayeke tam li ser beşavendê bigrin lê weke rêbaza klasîk jî beşavend bikar neanîne belku awayeke din a beşavendê bikar anîne û di yekbûna

¹³² Azad Ehmed, h.b, r. 96.

¹³³ Pexşan Elî, h.b, r. 95.

¹³⁴ Aso Omer, h.b, r. 119.

beşavenda helbestê de guherînkari kirin e ji bo ku bikaribin naveroka helbestê bêyî hizirîna di derbarê helbestê de biafirîn in. Goran jî jib o ghiştin bi wê armancê guherînkari di helbestên xwe de bikar aniye û beşavendên cûr bi cûr bikar aniye. “Goran jî yek ji rêberên vê bizavê bû ye ku çavê xweli ser ji yekbûna beşavendê digre û beşavenda pirreng û cûrbicûr bikar aniye. “ikarneanîna beşavenda yekbûyî ji aliyê Goran ve tê vê wateyê ku şewaza xwe guherandiye û texlîda helbestvanên kilasîk nake”.¹³⁵

Bi vî awayî jî Goran di beşavendê de guherînkariyeke girîng pêk anîye. Girîngtirîne wan beşavendên ku helbestvan bikar aniye jî ev e ne:

2.2.1.2.1. Beşavenda wekhev

Her wekî ku me amaje pê kir, piraniya helbestvanên kilasîk, helbest hûnandine, Goran jî ji vê texlîdê dûr nebû ye. piraniya helbestên xwe yê kilasîk bi wê awayê beşavendê ava kiriye. Di helbesta (Tawê Negera)¹³⁶ de helbestvan vê beşavendê bikar tîne.

| | |
|--|---|
| Tewê negera çerxî moxalîf be hîsabim | A |
| Bê nale niya saniyeyek tarî rûbabim! | A |
| Her lehzeyekî mehdî hezar girye bû efsûs | B |
| Salanî mialîm û hemû omrî şebabim | A |

Peyvên beşavendê jî di vê helbestê de (Hîsabim, Rûbabim, efsus û şebabim) in.

2.2.1.2.2. Beşavenda cûrbicûr

Ev awayê beşavendê jî hin cûreyan li xwe digre. yek ji wan jî cût-beşavend e ku piraniya helbestên Goran yê ku li ser bingeha kêşa xwemalî hatîne afirandin xwedêyî vê cûreyê beşavendê ne. yanî di du beşên malikê haman beşavend dubare dibe. “ev beşavend weke beşavenda mesnevî ta binav kirin”.¹³⁷

¹³⁵ Pexşan Elî, h.b, r. 99.

¹³⁶ Belawkirawey Penîz, h.b, r. 80.

¹³⁷ Pexşan Elî, h.b, r. 101.

Di helbesta (Hawrêm bêkes)¹³⁸ de helbestvan dibêje ku:

| | |
|------------------------|---|
| Ey Firîştey şîrî ciwan | A |
| Kostî kewtûy herdukman | A |
| Bo em care bêkese | B |
| Ke wtiman bêkes bese | B |
| Şairêk bû, fennan bû, | C |
| eday xur, xiroşan bû | C |

Her wisa Goran di helbestên xwe de gelek cureyên din jî bikar aniye weke mînak: “çuarîn, Mostezad, sêyîne, şeşîne, hevtîne, heştîne, deyîne, terciibern, terkîbbend û beşavenda azad”.¹³⁹ Bikaranîna ev hemî awayên beşavendê di helbestên Goran de sîmayeke din ya guhertinê bitaybet daye helbestên wî û helbesta kurdî bi awayeke giştî.

2.2.2. Mûzîka Nava ya Helbestê

Her wekî ku me amaje pê kir, kêş û beşavend hêmanên bingehîn yên mûzîka derveyî ya helbestê ne. Pêkve û li kêlega mûzîka nava vê awazeke taybet didin helbestê. Helbestvanên texlîdî û yên kevin girîngiyeke zêde didane mûzîka derveyî ya helbestê lê helbestvanên nû pitir girîngiyê didin mûzîka nava helbestê. Girîngiyeke taybet pê hatiye dayîn. Bizava nûkirina helbesta kurdî bingeha xwe li ser guherîna bingehîn ya binyada helbestê dibîne an ku ji hêla arasteyên zimanvanî û şewazgerî û sîmantîka wêneya helbestê û bitaybet ji hêla îqaê ve, helbesta nû kêş û beşavendê red dike.

Tenê girîngiyê dide mûzîka nava helbestê. Armanç ji rîtma navxwe jî ev e ku di encamê de ji rêxistin û paş û pêşkirina peyva di nav malikan rizgar bibe ku jîrîya(selîqeya) helbestvan ji nav dibe. Mûzîka nava helbestê pêk tê ji: “bi rêk û pêk kirineke jîr ya peyv û kompeyvên malikan bi vî şertî ku di nava dangan de têkeliyeke gûncav hebe, an ku tîpên dawîya peyvan wekhev bin. Helbestvan hin caran bi armanç hewl dide ku vî karî pêk bîne û hin caran jî bi awayeke tesadufî çê dibe.”¹⁴⁰

¹³⁸ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 93.

¹³⁹ Pexşan Elî, h.b, r. 131.

¹⁴⁰ Hoseyn Ebûd, El-tebîet fi el-şîr El-erebî El-measir, camîet el-besre, rîsalet macîster, 1984, r. 290.

Pir caran mûzîka nav helbestê û bedevbêjiya peyvan û peyvan helbestê girêdayî hest û soza derûnî ya helbestvan e, ji ber ku di derûna her helbestvanekê de awazeke taybet bi wî heye. “pirdengî mûzîka nava helbestê çê dike, ji ber ku ev peyv dengên cûda di demekê de didin û hesta ciwannasiyê di derûn de hildikin. Ji ber ku tenê guhgir dengê dibihîze, awazên di lezzet û çêjeka taybet hene. bi vî awayî mûzîkeke pirdeng tê afirandin”.¹⁴¹

Goran jî di derbarê bikaranîna peyv û kompeyvên cûda û biawaz û bitam xwedê jîriyeke zêde bû ye û girîngiyeke zêde daye vê hêlê û kariye ku rîtm û awazeke nedîtî bide helestên xwe. Di vê derbarê de Refîq Hilmî dibêje ku: “yên ku kêmezêde haya wan ji wêjeya jêrîhebe û bi awayeke zelaltir ji wêjeya nû agehdar in, tam û xweşiya ev helbestane wan sermest dike û bi mûzîka ku di nav wan helbestane de yê hey demarên laşê wan dilerze û di kurahiya dilê xwe de dem û xulakan fêhm dikin ku di bin bandoreke karebayî an miqnatîsî de derbaz dibin”.¹⁴²

Her wisa Hilmî li ciheke din jî amajê bi mûzîka nava helbestê dike û dibêje ku: “yan ku ji ahenga mûzîkê fêhm dikin û di derbarê mûzîka helbestê de şareza ne, dibêjin ku pêdiviya mirov weke av û hewa bi mûzîkê heye. Di kurahiya dilê xew de mûzîkê hez dike û nîzane jî çima. Dengê biroskên ewrê û şurêna av û ketinexwara pekên darê bi awayekê bandorê jê dikin û yek hizra wî dixebitîne û dilê wî dişuxilîne û yê din mûyê wî li ser laşê wî rast dike an jî dengê dilê wî zêdetir dike û hin ji wan jî xweşiyeke bêsinor didin dilê wî”.¹⁴³

Goran di helbesta xwe de bi awayke şareza yariyê bi pêş û paş kirina peyvan û tîpên peyvan dike û bi awayeke bi cesaret û di dem û cihê gûncav de û li gor armanc û merema xwe bikar aniye. Di helbesta (Gulî xwênavî) de dibêje ku:

Birwane! Şyî ye! çopiye lew male
Guê bigre! Zurnaye, dehole, şimşale
Zerde û sur têkel bûn, jin û pîyaw heraye
Lew nawe her harey heyasey to naye¹⁴⁴

¹⁴¹ Kemal Xembar, Goran Ew Şaire ke Buwe raberî tazekirdinewe G. nûserî nvê, j. 58, 2011, r. 11.

¹⁴² Hilmî, h.b, r. 164.

¹⁴³ Hilmî, h.b, r. 166-167.

¹⁴⁴ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 47.

Di vir de peyvên (birvane, şayî, çopiye, male, bigre, zornaye, dehole, şimşale, heraye, naye) mûzîkeke bitam û xweş dayne helbestê û dibin sedem ku dilê mirov germ bibe û hêzê dide mirov. Di derbarê zanîna mûzîka nava peyvên de pêwîst e ku têkeliya mûzîk û naverokê bê lêkolînkirin. Rêya vê jî rêjeya bandordariya vê ye ji ber ku di navbeta wate û mûzîka helbestê de ... heye ji ber ku wate bi tewawî berze dibe û dema ku helbest ji mûzîka xwe dûr bibe.¹⁴⁵

2.3.Wêne di Helbestên Goran de

Wêneya helbestê yek ji babetên sereke di afirandina helbestê de ye. wêneya helbestê xwedê dîrokek dirêj e. hevdem li gel serheldana helbestê peyda bû ye. lê li gor rêbazên helbestê rol û erk û cûreyên wê hatîne guhertin. Hemî wêneyên gerdûnî di pêşxistina wêneya helbestê de hevbeş in heya ku gihiştîye îro. Erkê wêneya helbestê ciwankarî û zelalkirina bingeha helbestê ye. ji ber ku wêneyên di nava helbestên helbestvanên jîr de weke rêze neynûkan e ku ku di quncên bingehe helbestê de hatibin danîn da ku bi awayeke zelal û geş naveroka helbestê bê avakirin û ev wêne jî bedev û sihravî bin. Ev tenê mijarê bas nakin belku can û sîmayeke razandî jî didenê. Wêne daynemoyahelbestê ye. çend hêmanên sereke di avakirina wêneya helbestê de bandorê dikin ku ev jî (Ziman û soz û hizr û xeyal û hest û waqî'î e) ne. ev hemî bi hev re badorê ji derûniya helbestvan dikin û dibin sedem ku helbesteke wênedar û watedar di dikê helbestvan de bê afirandin. Yek ji hêmanên sereke jîb o afirandina wêneyeke bedew di helbestê de waqî'î e. waqî'î di her halekê dedi afirandina wêneyeke hûnraweyî û hunerî de rola xwe digêre. “helbest wêneyeke axuver e û wêne helbesteke bêdeng. Helbestvan dikare bi peyvên helbestekêd biafirîne. Wêneyek ku zirp û zindî be û jîyanê di xwe de bihevîne”.¹⁴⁶ Her wisa di pênaseyê din ya wêneyê helbestê de tê gotin ku “helbest çî bi awayê kilasîk hatibe dariştin û çî jî bi awayê nû, vê rastiye naguhere ku her tim wêneya helbestê yek ji bingehen avabûna helbestê ye”.¹⁴⁷ Her wisa jî (sî dî luîs) derbarê wêneya helbestan dibêje: “ Her wêneyek bingeha wê çend peyvekin ”¹⁴⁸

¹⁴⁵ Kemal Xembar, h.b, r. 11.

¹⁴⁶ Heme Seîd Hesên, şîr û şemşîr, Weş. Yekem, Weş. dezgay çap û belavkirdinevey aras, Hevlêr, 2004, r.86-87.

¹⁴⁷ Osman Deştî, Hêmin Name, Weş. Rojhelat, 2009, r.140.

¹⁴⁸ Sî Dî Luîs , el-sure el-şîrîye, Wer. Ahmed Nesîf el-cenabî wa axerun, el-kwêt, 1983, r. 21.

wêneya helbestê bingeh û hêmaneke din e ji bo afirandina helbestê ku xwedê girîngiyeke taybet e li bal helbestvan û xwandevan û rexnegira. Ji ber vê çendê jî “helbesta rasteqîn ev helbest e ku bingeha vê wêneyî be û ji xeyaleke xurt bê afirandin”.¹⁴⁹ Wêneya helbestê girêdayî zevq û selîqe û hest û soz û derûniya helbestvan e. Ji ber ku pir caran rengdaneveya karesatekê û vegotina vê ji aliyê kesekê ve bo kesekê din pir cîyawaz e. Her yek ji wan li gor hest û soza xwe û nerîna xwe lê dinêrin. Di wêneya helbestê de şopa destê helbestvanê jîr û nazikhest û bihêz tê dîtin. Ji ber ku “wêne vegotina soz û hişê di demek ji demên jiyane”.¹⁵⁰ Goran jî di encama ev hemî karesat û nexweşî û êş û azaraên ku di heyama jiyana xwe de tam kir û her wisa ev geşt û seferên ku di nava sirûştê bedew yê kurdistanê û hevramanê de kiriye bûye sedem ku di her yek ji wan de wêneyekê bêminak û balkêş û waqî’iresim kiriye di nava jiyana sade ya kurdevarî û waqî’a civakî ya netewa kurd de û ji bilî wan jî weke helbestvanên kilasîk bas ji bedewiya jinê nake bi awayekê ku weke tişteke seyr bide nasandin. Ev wêneyê bedew yê ku Goran li jinê diafirîne, tabloyeke waqî’iye ku li hember bedewiyên jinê wênekêşeke jîr tê diyar kirin. Di vê derbarê de Kemal xembar dibêje ku: “ bi ev zimanê xurt û behest û nazik yê helbestvaniyê, bi ev xeyaka bi hêz, wêneya helbestê dadirêje. Weke hunermendeke nîgarkêş bi hêl û rendan, bi peyvan tabloyên hunerî wêne kir”.¹⁵¹

Goran di geştên xwe yên ji bo Hewraman û Qeredaxê de bi rastî wênekêşeke rasteqîn û bi hêz e di wênekirina sirûştê bedew yê Hewramanê. Di helbesta (Dîmenî rêga û ban) de dibêje ku:

Komele şaxêk sext û gerdengêş
 Asmanî şînî girtote bawêş
 Serpoşî lutkey berfî zor sipî
 Be daristan reş naw dolî kipî
 Cogey awekan tîyaya qetîsmaw
 Her eron naken pêçî şax tewaw
 Hawar û hajey kefçerênî çem
 Bo tenyayî şew laye layey xem¹⁵²

¹⁴⁹ Kemal Huseyn Xembar, çend lêkolîneveyekî edebî, r.75.

¹⁵⁰ Aso Omer, h.b, r. 128.

¹⁵¹ Kemal Xembar, Goran ew şaire Bwe raberî tazekirdinewe, r.11.

¹⁵² Belawkrawey Panîz, h.b, r. 117.

Di vê helbestê de weke tablo û wênekêşekê bas ji bedewiya sirûştê hewramanê dike. xwendevan dema ku helbesta vî dixwîne, wisa hizir dike ku bixwe geşt kiriye. Dîmenên vê geştê ji dîmenên ciyayên bilind û bi berf û asimanê şîn û daristan û cû û kanî û rûbar û rêyên Hewramanê pêk tên. Bixwe jî navê vê helbestê daniye (Dîmenî rêga û ban). Di derbarê wênekêşana hunerî di helbestên Goran de Kemal Xembar dibêje ku: “Di wênesaziya hunerî de Goran du rêya bikar tîne. Rêbaza Stonî, ku tiştên nedîtî weke dîtî, nediyar weke diyar û yên rût weke hestpêkirî dihesibîne.

Rêbaza duyemîn ya ku bikar tîne jî rêbaza asoyî ye. ev rêbaze bixwedi nava mirov û sirûşt de digûncîne, ji bo ku xwaziyarê wî wêneyê bikşîne, ji jor heya jêr ... dibe”.¹⁵³ Ji ber vê jî mirov dikare bêje ku Goran helbestvaneke mezin yê serdemê xwe û paş xwe bû ye. Heya îro jî helbestên wî girîng in û tama xwe ya taybet hene û di nûkirina hemî hêman û şewazên sereke yên helbestê yên wekî ziman û mûzîk û wêneyê û hemî babetên girêdayî helbestê de pir bihêz bû ye. ji ber vê jî weke rêber û bavê nûjenkirina helbesta kurdî tê nas kirin.

¹⁵³ Kemal Xembar, h.b, r. 11-12.

BEŞA DUWEM GORANÛRÊBAZAPERNASÎZMÊ

MIJARA YEKEM :RÊBAZA PERNASÎZMÊ

Livir de derbarê serheldana vi rêbazi taybetmendi u hizr u zaraveyan dixine ber bas:

1.Pernasîzm Beş û Zarevayên wê :

Pernasîzm rêbazekî wêjeyîye. Piştî romansîzmê derketîye holê, li dijî bendên romansîzmê ye. Li ser hest û sozên taybet di sekine. Bi şeweyekê goh nade çî tiştî, tenê ya xwe nebe. Her wekî dibêje : “Pernasîzm rêbazekî felsefî a xeyredînîye. Li ser bingeha rabûna romansîzmê bingeh girtîye. Rêbazekî kesîye di helbestan de derxistîye holê. Sozê taybet ê kesan bi karanîye ji bo nîşandana xwe .”¹⁵⁴

Li gorî pernasîzman huner armance ne amraze. Ji ber wê jî pêwîste huner bi tamamî serbixwebe. Nabe bibe amrazekî ji bo bi cihanîna armancên civakî, sîyasî, reftarî û ayîdlojya. Belku helbest tenê ji bo xweşikbûnêye. “ Ji ber vê jî pernasîzim bi wê hatîye nasîn, ku huner bi armancê dizane ne rêkirina hunerê. Her wiha armanc hellbestê dike babetekî hunerê ji bo ciwanîya di xwezayê de derbixe.”¹⁵⁵Daxwaza serbixweyîya helbestan dike. Ev jî nayê wê wateyê alîgirên pernasîzmê rêzê ji bihayên mirovatî re nagirin. Li gorî wan “ Pernasîzim dijî qutbûn û benda ye, xwe bi çî bawerîyên fikrî û reftarî ve girênade. Diroşma wê jî (Huner ji bo huner) e.”¹⁵⁶

¹⁵⁴Edad alnedwe alalemeyee lilşebab alîslamî, Al biransîye (Mezheb Alfen lilfen), İnternet, (www.protsaid-online.com).

¹⁵⁵Edad alnedwe alalemeyee lilşebab alîslamî, h.s.

¹⁵⁶Edad alnedwe alalemeyee lilşebab alîslamî, h.s.

Ev ê rêbazê nîşa nivîskaran da ji bo belvakirina babet û pirtûkên xwe di derbarê rêbazan de. “ Ji ber vê jî cara destpêkê di sala 1866 an de li Parîsê komek helbest bi navê (Pernas Hevçerx) belav bû. Tê de nivîsên hinek helbestvanan hebû ji van. (Malarmye, Lokont Dolîl, Solî Brodum, Hîrîdya, Franswakobye, Fîrlîn).”¹⁵⁷

Lê belê civîna van nivîskaran li gel hev nebû, ji ber wê jî dibêjin : “ Ev mezinbûne jî bi mezibûnekî demî tê danîn. Ji ber ku piştî (Fîrlîn, Malarmye) ji wan cuda bûn, bû beramberî dibistana Remiz (Sembol) .”¹⁵⁸ Ji ber vê jî pernasîzim buye dibistanekî demî. yan jî buye veguhastin ji nabera romansîzmê û simbolîzmê de. “Ev rêbaze dinav xwe de derbaz bîye, bi nasik çavkanî girtîye. Gehiştîye qonaxekî ku hevsengî di navbera her du alîyan de hebe.”¹⁵⁹ Em dikarin bêjin gehiştîye qonaxa remzê yan jî simbolê.

Pernasîzim ew zareva bû ji bo navlêkirina rêbaza wêjeyî bû. Her wekî dibêje : “Pernas, navê çiyayekê li gorî efsaneyên yonanîyên kevin, epononî xudanê helbestê û van neh xuşkên kû firîştî piştevanîyê hûnerên ciwan bûn kû ji wêrê jiyane xwe birê dikir. Ev nave ji komek helbestan re jî tê gotin.”¹⁶⁰ Ji alîye çend nivîskarên (Pernas Hevçerx) ve komek helbest li Firansa tê belavkirin. Li gorî (Ehedmed Salih îsaw) “Pernasîzim, bi pernasê rêjaye ser bilindî û spîtahîyê, Ev jî bi şikeft befra berdewam hatîye naskirin. Yek ji efsaneyên Yunanîyan behsa vê dike ku ev çiyaye cihê perîyan bû. Pernasîzism jî cihê xwedîyên helbest û muzîkan bû.”¹⁶¹ Ji ber wê jî dibistana Pernasîzim giringîyekî zêde bi ciwanî rumet, zimanevanî, muzîkê dide. rê ji zêdaroîya kesî digrît.

¹⁵⁷ Ahmd Salih Alîsawî, Al brnasye, internet, (www.furat.alwehda.org.sy) 9,1, 2006

¹⁵⁸ Ahmd Salih Alîsawî, h.b, h. s.

¹⁵⁹ Ahmd Salih Alîsawî, h.b, h. s.

¹⁶⁰ Reza Seyid Hisênî, Qutabxaney Edebîyekan, Wer. Heme Kerîm Arîf, weş. yekem, weş. Wezaretê Perwerdê, Hewlêr, 2006, r. 149

¹⁶¹ Ahmd Salih Alîsawî, h.b, h.s.

2. Taybetmendîyên Pernasîzmê

Ev rêbaze jî wekî her rêbazekî din a wêjeyî, xwedîyê çend zagon û bingehên taybete. Evên li jêr me dayîn diyarkirin girîngtirîn bingeha rêbaza Pernasîzmêne :

1- Tenê taybete ji bo helbestan. “Ji ber ku li gorî wan, helbest nîşana kesekêye ku hestên xwe vemirandîye.”¹⁶² Ji ber wê jî helbestên pernasîzman wekî peykerekêye. Helbestên wan wekî neynîkekî paqije.

2- Di hemû armancên exlaqî de dixwaze helbest serbixwebin, tenê jêr navê ciwanîyê debin. “ Ji ber wê jî xwe ji hemû erkên civakî û reftarî dur diparêze. Di cihê wan de pileya yekem ciwan nasîye. Meseleya afirandinê de di form û muzîka helbestê de bi dest dixwe. Helbestvan li gorî wan dur bû ki meseleya soz, endîşeyê. Bi qasî wan yê ku hizra hunera helbestan dikirin.”¹⁶³ Li gorî wan wêje azade, tenê jêr navê ciwanîyê de çêbûye. Dure ji fermanên civakî, sîyasî û nerênîya civakî. Nabe wêje bi taybetî helbest, xizmeta çi alîyên jîyanê bike. Her wiha (Tofil Gotye) di destpêkê de (Mad Mozîl Dî Mupan) dibêje : “ Qet tiştek nikare ciwan be, eger ne di xizmeta tiştekê din de be.”¹⁶⁴

3- Bawerîya Pernasîzman wisan bû, romansîyan bizivirîne kilasîkan. “Bi hişkî berêxwe dabûn kelû pelê Yunanîyan. Bi vê re jî xwe nêzikî Kilasîzmê kirîbûn .”¹⁶⁵ Çavkanîyên xwe jî ji felsefeya Yunanîyan digirtin. “ Li gorî wan Rîyalîst û Romansîyan wekî hev serdemên wanbû. Pêwîste helbestvan bi zivirn ser kilasîkên bab û bapîrên xwe, yanî Girekîyan. Li gorî wan şêwazê bi mînak, xweşik û resen tenê li cem Yunanîyan bû.”¹⁶⁶

4- Alîgirên vê rêbazê ji wan kesan pêkdihar ku rewşenbîrîyek berfireh a wan hebû. Ji ber wê jî “ Alîgirên Pernasîzman wekî bi xwe dibêjin : Komê kesên bi keyfxweş û bilind yê civakên bûn. Helbest li cem wan ne ji bo giştî civakê û rutîya civakê bû .”¹⁶⁷

Di vir de jî armanca serekî xweşiktîye. Kesên asayî nikare bi asanî ji helbestên Pernasîzman fêhm bikin, eger zewqekî ya wan a xweşik nebe.

¹⁶² Reza Seyid Hisênî, h. b, r. 150.

¹⁶³ Hîmîdad Hisênî, Rêbaze Ederbîyekan, weş. yekem, weş. Dezgaha Aras, Hewlêr, 2007, r.206.

¹⁶⁴ Ferhad Pîrbal, Rêbaze Edebîyekan, Weş. sêyem, Weş. Şivan, 2009, r. 131.

¹⁶⁵ Hîmîdad Hisênî, h.b., r. 206 .

¹⁶⁶ Pîrbal , h.b, r. 130 .

¹⁶⁷ Hîmîdad Hisênî, h.b, r. 207.

5- Pernasîman girîngîyekî zêde bi formê didan ew qas girîngî bi naverokê ne didan. Ji ber ku li gorî wan ciwanî û afrandin tenê di formê de berdest dibe. Vîktor Hogo dibêje : “ Pêwîste em bizanîn ji bo çi kar dikîn ne em ne zanin ji bo çi kardikîn.”¹⁶⁸ Ji ber wê jî girîngîya wan a ji bo formê di alîyê vegotin û hîlbijartina peyvê de bû.

6- Yek ji bingehe jîmartî ya pernasîzmê, girîngî dayîna wezin û serwayê bû. (Tîodur Dubanvîl) Helbestvanekî yê vê rêbazê bû, li ser Serwayê dibêje : “ Qafye (Serwa) wekî mîxekî zêrîne, helbestvan xeyalê xwe pê dikote .”¹⁶⁹

7- Pabend bûna hunerê ji bo huner. Wekî Vîktor Hogo dibêje : “Hezar caran ez dibêjim : Huner ji bo huner.”¹⁷⁰Ji ber wêjî helbestên xwe di gehandin lutkeya ciwanîyê. Ji giştî alîyên din ê jîyanê dur diketin. Ji ber wê jî helbest ji bo helbest û huner jî ji bo huner. “ Helbestvanên parnasîn li gorî bawerîya wan nabe helbest kesekê bîne rêjeya kenîne û ne jî kesekê bêxe rêjeya girîne de. Pêwîste tenê ciwan be, armancên xwe di xwenên xwe de bigire.”¹⁷¹

8- “ Objektîf bûn ”¹⁷²(Heyberî) hebûna min nîne tenê helbestvan ji dur ve temaşeyî dîmenan dike. Di vê derbarê de Bodlêr dibêje : “ Li pey gerana bingeha rastîyan ne armanca helbestane, belku armanca wê tenê di nav wê xwe deye .”¹⁷³Helbestvan di her cihekê de dîmenekî ciwan û balkêş berçav dadirêje, bi hebûna karanîna hes û sozê xwe. Ji ber ku rêça wan di helbestê de hunerîye.

¹⁶⁸ Pîrbal, Rêbaze Edebîyekan, r. 133.

¹⁶⁹ Pîrbal, h.b, h. r.

¹⁷⁰Pîrbal, h.b, h. r.

¹⁷¹ Reza Seyid Hisênî, h.b., r. 150.

¹⁷² Reza Seyid Hisênî, h.b, h. r.

¹⁷³ Ahmd Salih Alîsawî, h.b, h.s.

3. Fikrên Di Derbarê Pernasîzmê De :

1- “ Wêje û huner armancekin ji bo bi destxistina xweşîyê ne sodwergirtinê.”¹⁷⁴ Ji ber wê jî li dijî felsefeya (Sant Sîmon) di sekine. Sîmon, daxwaz dikir wêje di jêr navê sud wergirtinê de bi kar bê. Rêçberê civakê be. Lê belê li gorî pernasîzman wêje û huner tenê ciwanî ye. Jiber ku eger bi sud be wê demê ciwan nabe. Gote di destpêka dîwana xwe a (Gote) de dibêje : “ Her hunermendê ku hizra tiştêkî ne ciwan bike ew ne hunermende .”¹⁷⁵

2- “ Şikandîna hemû tiştên kevin, ji bo bingehekî nû a cîhanê tiştêkî valeye. Ji ber ku li gorî alîgirên wê, her hizir û fikir, reftar pêwerên heyî di diştên kevin dene .”¹⁷⁶ Yek ji bingeheên pernasîzman ewe ku pêwîste çavkanîyên huner û wêjeyî ji felsefeya Yunan u êstatîkaya Girekîyan a kevin bi girin. Bi vê re jî nêzî kilasîkên Girekîyan dibin.

3- Mirov bextewerîyê di rêya hunerê de bi dest têxe, ne di rêya zanîstê de . “ Li gorî fikrên Pernasîzman; Her zanîstek, her beşekî çalak ê mirovan berpirsê meydana xweye. Nabe qer beşek .çalak yê mirovan ya din bike û armanca û pîrensîban bike berjewendîyê xwe.”¹⁷⁷ Dema helbest ji bo fêrkirinê be pernasîzim jê dur dikeve. Aramî xweş bextî jî di rêya hunera ciwan bi destan dikeve. Ev jî tamedî taybe a xwe heye ji bo xwendevan. her wisa jî dir katina zanist u fêrkirin u perwerde kirin ji helbest u hunerê bi giştî. ji cehê wî jî giringî bidrêt bi ruxsaru guzarîştên wêjeyî, ne naweroka huner u wêjeyan.

4- “ Jîyan çavlêkirina hunerîye, newekî ku Eflaton û Arîsto dibîne.”¹⁷⁸ Ji ber vê jî ev wate di diruşmên wan de derdikeve. Dema dibêje : Huner ji bo huner. Huner ew qas jî bo wan girînge ku li gorî wan jîyan jî çav li hunerê dike. Li gorî fikrên Eflaton û Arîsto dema dibêjin; wêje çavlêkirina jîyan yan jî xwezayê ye.

¹⁷⁴ Pîrbal, h. b, r. 133 - 134.

¹⁷⁵ Edad alnedwe alalemeyee lilşebab alîslamî, Al biransiye (Mezheb Alfen lilfen), h.s.

¹⁷⁶ Pîrbal, h. b, r.132.

¹⁷⁷ Pîrbal, h. b, h. r

¹⁷⁸ Edad alnedwe alalemeyee lilşebab alîslamî, Al biransiye (Mezheb Alfen lilfen), h.s.

5- “ Alîgirên vê rêbazê wisan dibînin ku ev rêbaze bi destxistina azadîyê ye ku ji alîyên dî de hatîye dizîn yan jî nemaye bi egerê pabend bunê. Her wekî ku çawe di Marksîzim û wêjeya îslamê û çend corên din de heye. Ev jî piştgirîya îdeolojî û fikrên dîyar dike.”¹⁷⁹Di vir de armanc ew bû ku hinek rîsa di hinek rêbazan de heye. “Wekî ; Di kilasîkan de huner armanca wê perwerde û fêrkirin bû.”¹⁸⁰Wekî zagonekê bû pêwîste huner ji bo fêrkirin û rênîşana mirovatîyê be û bi sud be. Pernasîzman hunera di her corekê de bi sud ba ji bo xizmeta mirovatî, dur digirtin. Belku armanca hunerê ew bû ku tenê xweşiktî û tamê bi mirovan bi bexşîne.

6- Pernasîzim rêbazeke na xwaze di xizmeta civak û mirovatî de be. Tenê di vê rêbazê de xweşiktî hatîye xwestin. Ev jî armanc û rêyekî dîyare ji bo ku tê de rêve biçê. Di her rêbazên din de destor û zagonên xwe hebû. Ji ber vê jî “ Ev rêbaze wekî korekê ye naxwaze bi korî jî jîyan bike. Ji ber ku çî rêyên dîyar nîne ku tê de rêve biçê, bi wêjeya îslamê re di nava rêbazên din de tê naskirin . ”¹⁸¹

7-“Rêbaza huner ji bo huner pişt bi hizir û bawerîya felsefeya yek alî ve girê dide. Ev jî di nav wê de Pernasîzim dîyar û misoger kirîye. ”¹⁸² Ji ber vê jî (Pernasîzim) bi navê xwe Yunanîye. Ji ber ku nêzîkî Xerîkîyane û rêça wan girtîye.

¹⁷⁹Edad alnedwe alalemeyee lişebab alîslamî, Al biransîye (Mezheb Alfen lilfen), h.s.

¹⁸⁰Reza Seyid Hisên, h.b.,r,146.

¹⁸¹Fezîle madî, dewir alemîye we mezahîbuhu fi tetewir el-edeb we zuhur ecnasîhî el-edebîye, rîsale macistêr , cezaîr, 2012, r. 245.

¹⁸²Fezîle madî, h.b, h.r.

4. Rêbaza Huner Ji bo Huner

Em dê behsa beş u zaraveyên vi rêbazi u çawaniya bikar anina wi licem pernasan dikin:

4.1. Zarevayê Huner Ji bo Huner :

Ev rêbaza ji bo hunerê bi temamî ji bandora hizra felsefîk, ayînî û ayîdolojî dure. Di vê rêbazê de tîne xweşîktî di sekine, xwedîyên vê rêbazê wiha ji nav dibin. Rizgarkirina wêjeyê ji sudane. “ Ev rêbaze di wêjeyê de belav bûye, wisan dibîne ku pêwîste wêje ji her bihayekê rizgar bibe. Tenê di qesîdeyan de heye tenê ne xweşik be. Wiha di wêjeyê de bi rêve biçu ku çî pîvanên gerdonî û ayînî sudên wan tê de nebe. Armanca vê rêbazê di wêjeyê de bi saya xweşîktî û wêne kişandina endîşeya xweşike. Tenê ev jî jêr navê zivirandina xweşî û şadîya deronîye. Ji ber ku erkê wêjeyê ne ewe xizmeta reftaran bike. Karê wê ne ewe li jêr navê başî û civakê de kar bike. Ew bi xwe di nav xwe de armanceke. Pêwîst nake ji bo armancek din bizivire . ”¹⁸³ Ew e armanca wê xweşîktîyê çêbike û bibe mêrgek kesk di sayê de. Westana jîyane jî bizanibe. “ ” Huner ji bo huner ” Rêbazeke di xwaze, helbest û wêjeyê bike hunerekî babetî. Ji bo bi destxistina xweşîktîyê û bi karanîna wê xweşîktîyê hewildanê dike. Her wiha dur dikeve ji wan hizir, bawerî û reftarên mayîn de. Ji bo karên wêjeyî jî rêgirtine ke.”¹⁸⁴

Evê rêbazê bi temamî bergirîya wê fikir helbest ji alîyê civakî, reftarî û sîyasî durbin. Belku huner belgeyê jîyan û zîndîyane. Tenê tişteke dikare aramîyê bi canê mirovan bi bexşîne ew jî ciwanîye. Ev jî di wê demê de çêdibe dema huner ji hizir, reftar (Exlaq) û felsefeya civakî dur be. (Tîofîl Gotye) di destpêka helbestên xwe de di derbarê hunerê de gotîye : “Em dakukê di hebûna hunerê de dikîn. Huner li cem me ne ew zarê (Wesîle) ye. Belku armanca, Her hunermendek di hizra tişteke de be, ji bilî xweşîktîyê di alîyê mede ne hunermende .”¹⁸⁵Di vir de armanca wî ew e ku ev rêbaz tenê ji bo ciwanîyê derketîye holê. Dure ji alîyên din ê jîyanê, bi taybetî ((Civakî, Ayînî û Sîyasî (Ramyarî) hwd)) . Li gorî wî nabe huner ji bo sud wergirtinê be. Ji ber ku dema her tişteke bi sud be, wê demê nikare xweşik bibe. Parnasîzman li dijî wê bû ku huner bikare civakê bi goherîne. Belku tenê giringî bi ru didan, li gorî fikrê wan her zanîstek berpîrsê meydana xwene. Ji ber wê diruşma wan (Huner ji bo huner) e.

¹⁸³ Waîl Bin Yusif Alerebî, Nezerîye elfen lîlfen, (www.alukah.net) .

¹⁸⁴ Waîl Bin Yusif Alerebî, h.b.

¹⁸⁵ Reza Seyid Hisên, h.b ,r,148.

4.2. Koka Rêbaza Huner Ji bo Huner :

Li ser vê rêbazê gelek lêkolîn û gotin hatîne kirin, fikrên herî girîng jî eve du fikrene:

a-“ Yek ji van fikran, li gorî wan erkê serekî ê wêjeyê perwerdekirin û fêrkirine. Her wekî di vana peyvên Erebbî de jî hatîne dîyarkirin. (edeb, Tadîb , Muedeb) wate; (Kesekî aqil) . Ev fikre jî herî zêde di çand û rewşenbîrên erebande zale .”¹⁸⁶

b-“ Li gorî hinek din jî wêje û huner, corekin ji lehîstok û xwe mijolkirine. Ji ber vê jî di vî zarevayî de nabe pişeyek. Her wiha nikare bibe ragehandina peyamekê.”¹⁸⁷
Ev rêgeze tenê jêr navê ciwanîyê de kar dike. Bi van mercan nikare piştevanîya çî hizir û bawerîyan bike.

4.3. Navên Herî Girîng Yên Vê Rêbazê û Dîyartirîn Kesayetên Wê :

4.3.1. Navên wê :

Rêbaza huner ji bo huner bi pernasîzman dihat navkirin“ Hinek kese sedemên wê wiha dizanîn, Gwaya xwdanê şîr û helbestanli ser çîyayên xwe ji pernasîzma Yunan dî di girt. herwisa ji dibêjin rêbaza (darbrinxwazy). ”¹⁸⁸

4.3.2. Ew Kesên Ji Vê Rêbazê Bandorbûyîn :

4.3.2.1.Lokunt Dolîl : (1818- 1894 z)

“Ev wekî damezrênerê vê rêbazê dihat naskirin. Ev helbestvane berbi Rojhelatê Hîndistanê ve koçkir. Li wir dîmen û rengê we navçeyê çavên wî têrkir û ev bu sedemê ku helbestan binivîse.”¹⁸⁹“Dema cara yekem komek helbest derxist, bala xelkê ne kêşand. Bi xwe jî xwe ji bîrkir heya binav û deng derneketPiştê çû Parîsê û li wir biryar da xwe ji bo lêkolînên di helbestên kevin de misogerkir.Di sala 1852 an de dîwana

¹⁸⁶ Ebdu - elrezaq El-esfer, el-mezahib el-edebîye lede el-xerib, Weş. el-esed , Dîmeşiq, 1999, r. 75.

¹⁸⁷Ebdu - elrezaq El-esfer, h.b, h.r.

¹⁸⁸ Îlîya el-hawî, el-bernasîye aw mazheb el-fen lil fen fi el-şîr el-xerbî wel-erebbî, Weş. duem, Weş. dar el-seqafe, bayrut (lubnan), 1983, r. 44.

¹⁸⁹Îlîya el-hawî, h.b, h.r.

(Helbestên Kevin) derxist. Destpêkek bû ji bo nasandina vê pirtûkxanê Nubîna (Pernasîzmê) datîne. Piştî jî di sala 1862 an de komek helbest bi navnîşana (Şîrê Direndekan) Bi vê re bu rêberê danîna Pernasîzmê.”¹⁹⁰

4.3.2.2. Tîwfil Gutîye :

Helbestvan û nivîskarê romansî Gotye, hevalê (Nîrfal û Bodler) bû. Nivîskarê (Frakas) û çîrokên xorafî bû. Dixwast xwein û revîna di rastîyê de pêşkêşî xwendevanan bike. Karîye di vir de serkeftinekî mezin bi dest bixe.¹⁹¹

4.3.2.3. Şarl Bodlîr (1821-1867) :

Helbestvan û rexnegirê hunera Firansî Boldlîr, di sala 1857 an de cara destpêkê dest bi nivîsîna pexşan û helbestan kir. Her wiha di sala 1861 an de dest bi hewildana ji bo hurbûna pêşniyaz û sitatîkîya kir. Bodlîr, ye ji helbestvanên sedsala 19 an yê herî binav û deng bû. Di cîhanê de yek ji simbolên nû bû. Helbestên wî ji helbestên helbestvanên pêşîya xwe pêşketîtir bû. Heya dawîya mirinê jî gelek xelkê jê fêmedikirin .¹⁹²

4.3.2.4. Stîfan Malaramîye :

Serokê remz û helbestvanê mij û domana Malarmîye. Di 18 adara 1842 an de li Parîsê ji dayîk bûye. Malaramye ji aliyê bavê xwe ve fêrî sistemenkî rast û çir bû. Di sala 1854 an de destbi nivîsînê kir heya niha jî ew nivîsîna wî bi nav û denge ku ew jî eve. (Xiştî Zêrîn). Di dirêjahîya temenê xwe de ji bilî vê nivîsînê çendîn çîrok, helbest, lêkolînên rexneyî û nivîsînên din belav kirîye. Govar û rojnameyên Parîsê gelek girîngî dayîne berhemên wî.¹⁹³

¹⁹⁰ Ebdu-elrezaq El-esfer, h.b, r. 75.

¹⁹¹Edad alnedwe alalemeyee lişebab alîslamî, Al biransîye (Mezheb Alfen lilfen), h.s.

¹⁹² Ebdu-elrezaq El-esfer, h.b, r. 88.

¹⁹³ Ebdu-elrezaq El-esfer, h.b, h.r.

4.3.2.5. Hirîdîya (1842- 1905 z) :¹⁹⁴

Ev helbestvane dilsozê pernasîzmê bû. Di sala 1893 an de komê helbest nivîsî di wir de hemu hunera xwe bi kar anî. Bi şeweyekî her parçeyekî wekî qesîdeye kê bû. Ji ber wêjî gelek bi zorê ziman cuda dikir. Xwendekar çî deman ji xwendina berhemên wî aciz ne dibû. Ji ber ku wezin û serwayekî xweş hebû. Ji bo fêmkirina helbestên wî, pêwîste asta rewşenbîrîya xwendekaran bilind be . Xwendekarên asayî jî pêwîstîya wan bi komê çavkanî û şîrovekirina hebû.

5. Koka (Bingeh) a Hizrên Pernasîzmê :

Ji bo bingeha hemû rêbazekê pêwîstî bi rêxweş û hizran heye ji bo damezirandina wê. Rê xweşker û hizirmend û damezrênerên pernasîzmê evên li jêrin:

1- Her wekî me gotî; Pernasîzm rêbazekî a ciwanîyê ye. Ji alîyek din ve wekî ((Civakî, Aborî û Sîyasîye (Ramyarî) e hwd)) Di helbestan de ne pejiwandîye “Arîsto (383- 332 B.z) yekem kes bû ku di helbestan de êrîşî ser fêrkirin û exlaq kirîye. Ji ber vê li beram berî Eflaton sekinî. Eflaton wiha biryar dabû helbest xizmeta felsefeya exlaqî û fêrkirinê dike.”¹⁹⁵

2- Hêdî hêdî alîyê fêrkirinê serwerbû bi ser wêjeyê. Ji ber wê “ Piştî dawîya imperetoriya Exrîq bi hatina desthilat darîya imperetoriya Roma re fêrkirinê bal da ser wêjeyê.”¹⁹⁶

3- “Kilîsê, kontrola felsefê û wêjeyê kir. Pêşkêşkirina fêrkirinê di helbestan da bû. Lê belê di heman demî de li gorî hinekan baş bû helbest jêr navê sitatîkan de kar bike. Keşe (Oxustîos di pirtûka (Birokey Mesîhyet) de misogerîyê li wê tama hunerî dike ku Încîl pê hatîye nivîsandin .”¹⁹⁷

¹⁹⁴Ebdu - elrezaq El-esfer, h.b, r. 76.

¹⁹⁵Edad alnedwe alalemeyee lişebab alîslamî, Al biransîye (Mezheb Alfen lilfen), h.s.

¹⁹⁶ Edad alnedwe alalemeyee lişebab alîslamî, h.s.

¹⁹⁷ Edad alnedwe alalemeyee lişebab alîslamî, h.s.

4- Pêşkêşkirina Fêrkirinê ew qas bi hêzbû ku kesekê ne dikarî ne pejrîne . “Di sedsala 16 an de pêşketina rexneya wejeyê hîna ne karîye bi sererastî serwerîya xwe bi ser fêrkirina wêjeyê de bike .”¹⁹⁸

5- Di dawîya sed sala 16 an û destpêka sedsala 17 an de tam û girîngîya hunera xwe kir dinava wêje ûhelbestan de. “Ji ber vê di sedsala 17 an de (Bîrkornî) tekez kir ku armanca serekî a di helbestên şanogerîyê de lezata hunerîye.”¹⁹⁹

6- Bi derbazbûna demê re êrîşên li ser fêrkarîyê zêde bûn. “ Bi taybetî jî êrîşên (Ordz ors Şîlî ê helbestvan, Bodlîr û Malaramîye).”²⁰⁰

7- “ Di destpêka sedsala 20 an de rexnegiran piştevanîya fikra huner ji bo hunerê kirin. Ya ku hunere pêwîste ne jêr navê armanc û sudên demikîre bikar bîne.”²⁰¹ Ji ber wê jî nivîskaran hewil dan huner û helbestê dur bixin ji armancê civakî, sîyasî û mirovatî. Perasîzman jî ev ne di pejirandin.

8- Di rastîyê de naveroka hizra (Aleqaîdî)rêbazek heye. Ev rêbaz jî ne ew wêneye ku eywendî bi rêbaza hunerê ve heye. Belku ne pejirandina hizir û bawerîyên exlaqî yên pêşîne. Bi taybetî jî yên ku peywendî bi ayîn ve hene.²⁰²

9- Êrîşên li ser dibistana huner ji bo huner zêde bûn. Bi taybetî piştî wê ev dibistane jîyana hişyarî û jîrîyê paşde da. “ Êrîşkarên wekî (T.S Îlîyot) tekezîya wê dikir ku hemu helbestvan û rexnegirek nivîsînek hebe sudê wê ji bo civak û xwendevanan hebe.”²⁰³

Bi şêweyekî giştî rêbaza huner ji bo huner di sedsala 19 an de bi tamamî çêbû. Di derdora salên 1860 an de gelek gotin di derbarê wêjeyê de hebû. Her wiha lêkolîn di derbarê wêjeyê bi giştî de dikir. Hejmarek helbestvanên dijî romansîzmên rabûn û ketin dibin bandora rêbaza (Huner ji bo huner) de. Bi taybetî jî (Lokunt Dolîl) di rêza pêş ya van helbestvanan de bû. Em dikarî bêtînin mezintirîn nunerê vê rêbazê ye. Di sala 1866

¹⁹⁸Edad alnedwe alalemeyee lişebab alîslamî, Al biransîye (Mezheb Alfen lîlfen), h.s.

¹⁹⁹Edad alnedwe alalemeyee lişebab alîslamî, h.s.

²⁰⁰Îlîya el-hawî, h.b, r. 67.

²⁰¹Îlîya el-hawî, h.b, h. r.

²⁰²Îlîya el-hawî, h.b, r. 69.

²⁰³Îlîya el-hawî, h.b, h.r.

an de komek helbestên (Pernas Hevçerx) ji aliyê komek helbestvanên ciwan û xwîn germ ve belavkir. Êdî ev helbestvana ne bi navê (Parnasîn) binav û deng bûn.

6. Alîyên Baş û Xirap Yên Vê Rêbazê :

Bê goman hemû rêbazekê aliyên wê ê baş û xirap heye. Li jêr emê girîngtirîn aliyên wê bidîn destnîşankirin.

6.1. Alîyên Baş yê Vê Rêbazê :

Gelek bi hişkî hukmê li ser metinê dike. Ji ber wê jî ew rê dide metinê here nav wêjeyê yan jî neçe. Navê afrêner lê bide yan jî lê nede. Ev jî wekî başîyekê tê danîn ji bo piştevanîya vê zorîyê ku di nava metnan de heye. Bi hêsanî bi ser xwendekar de derbas dibe. Yekek din jî başîya vê rêbazê ewe ku wisan li mirovan dike li ber kirokîya xweşiktîya karê wêjeyê bi sekine. Mora xwe li ser afirandina ziman û wêneyê mûzîkê bide .²⁰⁴

6.2. Alîyê Xirap Yê Vê Rêbazê:

Ew qasa ku xwendevan bi ciwanîyê ve mijol dike, ew qas jî ji sud wergirtinê dur dixê. Ev jî wisan kirîye ku huner û wêje ew qas girîng û pêwîst nebin, cihê rexneyê nebe. "Helbestvan " Mihemd Al fitorî " dibêje : Ew çi wêjeye ke naveroka wê ne be? Çawe gotinekê qebol bikîn, çi sudên wê nebe ? Xwendevan nikare berdewam be li ser tiştêkî ku sudê wê nebe, yan jî balkêş nebe bila her xweşik jî be. Dibêje : Ez li dijî wê me ku bêjin huner ji bo hunerbe. Çi helbestvanek nîne ne di jêr navê hunerê debe, merg ji cîhana xeyalî nebe. Ji ber wê jî helbest pêwîstî bi şert û mercên civakê ye û pêwîstî bi êşên wane, pêwîstî bi dahatû û borîyê wane ".²⁰⁵

²⁰⁴ Îlîya el-hawî, h.b, r. 88.

²⁰⁵ Îlîya el-hawî, h.b, r. 91 .

7.Nerîna îslamê derbarey huner ji bo hunerê:

Wêje di îslamyetê de pêwîstî bi piştevanîya bihayê îslamyetêye. Pirensîba yekperest bi temamî dîjayetîya îslamê ye di wênegirtin û bi destxistina pîvana ye. Lê belê huner ji bo huner di hunermenda de xwestek bi pîvane û berbi wênegirtinekî bi xwestek ve diçe. eve jî eksa van tiştane ku petivîye bi wan grêdrayî bin evane jî grêdan bi bingehên fîqhê ku yê herî giring bingeha (لا ضرر ولا ضرار) rêbaza huner jibo hunerêş zîyan bi xwe gehandine mifa wernegirtine û egerê zererêye.²⁰⁶

Di zarokdana (Huner Ji bo Huner) de çend rêbazek din ji dayîk dibin :

- 1- Formalîzîmî (Şêwe Xwazî)
- 2- Binyatgerî
- 3- Şêwazgerî
- 4- Sîmolojîya
- 5- Hilweşandin gerayî²⁰⁷

²⁰⁶ Waîl Bin Yusif Alerebî, Nezerîye elfen lîlfen, h.s.

²⁰⁷Waîl Bin Yusif Alerebî, h.s.

MIJARA DUWEM : GORAN ÛPERNASÎZIM

Tê zanin ku goran kariye gelek rêbazên edebi dinav helbestên xwe de bikar aniye, em livir de behsa bikar anina rêbaza pernasizmê licem gorani dikin:

1.Qonaxên Fikrî û Hizrî di Helbestên Goran de

Goran di dema helbest nivîsandinê de di çend qonaxên fikrî û hizrî de derbaz bû ye. di her qonaxê de jî hin taybetmendî di helbestên wî de diyar in. Omîd Aşina di derbarê Goran de dibêje ku: “helbestvanêke weke Goran her di sedsala bîstan de germ û gur hat û heya vê dawiyê jî sar nebû û berhemên nû pêşkêş dikirin”.²⁰⁸ Dr. Marif Xeznedar du qonaxan ji bo fikra helbestvaniya wî diyar dike:

1. Helbestvanê Afiret û Ciwaniyê
2. Helbestvan û îdeolojiyêke dirarkirî²⁰⁹

Goran di deme nûjenkirina helbesta kurdî de çend gurankarî di helbesta xwe de bicih kiriye ku ev jî ev in:

1- Goran weke helbestvanên kurd tenê çend rêbazên diyar yên weke (Kilasizm, Romantizm, Riyalizm) di helbesta xwe de bikar neaniye û hin rêbazên nû jî di helbestên xwe de bikar aniye. Weke mînak Pernas, Rialîzm, Romantîzm, Rîalîzmî Rexnegirane, Sisiyalîst û şorişgêrane”.²¹⁰ Her wisa hin rêbazên dij jî bikar aniye. Weke mînak rêbazên Si’ibolîzm, Sorréalîzm, ku wan rêbazan jî weke encama jîrî û dinyadîrîbûna xwe şirove dike. ji ber vê jî di helbestên xwe de “malikeke nû, nerîneke hevçerx û cîhanbîniyêke îroyîn di nava berhemên xwe de guncandiye ku beriya wî tu helbestvanekê bikar neaniye”.²¹¹ Ev jî encama şarezaiya wî di derbarê zimanên Erebi, Farisî, Englîzî, û Kurdî ye. Her wisa ji ber agadarbûn û şarezabûna wî ya wêjeyên biyanî ye. ji ber vê jî Goran “yekem helbestvanê kurd e ku kariye pitir ji du rêbazan biceribîne”.²¹² Ev jî bi sedema asta ronakbîrî û şarezabûna wî ji çanda rojavaiyan e.

²⁰⁸Omîd Aşina, Reşîd Necîb, Jiyan û berhemekani, r. 14.

²⁰⁹ Xeznedar, h.b, r. 576.

²¹⁰ Ferhad Pîrbal, reg û rîşekanî tazebûnewey şîrî kurdî, Weş. yekem, Weş. dezgay kurdistan, hewlêr, 2005, r. 197.

²¹¹Pîrbal, h.b, h. r.

²¹²Pîrbal, h.b, h. r.

2- Bandora wêjeya Rojava li ser Goran hebû ye û ev tişt bi awayeke eşkere di helbestên vî de diyar e. di vê derbarê de Ferhad Pîrbal dibêje ku: “Goran bi awayeke raste rast bandor ji wêjeya rojava girtiye û teknîkên helbestê yên îroyîn weke mînak helbesta diramî, operît, çîroke helbest, Geştname, Helbesta zarokan û surud aniye nava helbesta kurdî de”.²¹³ Ev jî ji ber nasiyarbûna vî bi helbesta îngilîzî bû ye. wî xwastiye ku gelê vî jî agadarê wan cûreyê helbestan bin û ji wêjeya dinyayê qût nebin. Her bisa haya wî ji berhemên wêjeyî yên serdemê hebû. Ji ber vê çendê jî di vê derbarê Dr. Mistefa Izeddîn dibêje ku: “bingeha zanist û behreya xwe bi wêjeya gelên cîhanê bihêz kirîye. Ji pênc zimanan bi awayeke tam sûd girtiye. Mirov dikare bêje ku hêz û bexşişa wan ji bo danî di xizmeta zimanê kurdî de û bi awayeke tam û afirîberî bikar tîne”.²¹⁴ Goran karî ku girîngiyê dibe nûjenkirin û ji dayîkbûna pirtûkxwaneyê nû ji bo zimanê kurdî bibe pir û bingehêk ji bo helbestvanên paşî vî sûtê jê bigrin.

Her wisa Dr. Ebdulla Debbax di derbarê goran de dibêje ku: “Goran bixwe wan helbestên Îngilîzî diyar dike ku weke çavkaniya hizra hin ji helbestên wî bûne. Bi taybet dema ku Goran dikeve bin bandora helbesta Îngilîzî yên derveyî serdema romantîzmê, wêneya helbesta navdar ya Robert Hîrîk ya bi navê Guke Nêrgizekan ku di sedsala heftan ya zayînî de hatîne nivîsandin an jî çîroka kurt û remzî ya Oskar Waïld ya bi navê (Bûlbûl û Gul) ku serdemeke direngtir hatiye nivîsandin, goran di wan berhemên de bi awayeke tam tuvê romantîzmê û nerîna xwe bi hev ve girê dide û dike bingeha bizava nûjenkirina helbesta kurdî”.²¹⁵

3-Yekem kesê ku nîşaneyên xalbendê di helbestên xwe de bikar aniye Goran e. her wekî ku di vê helbestê de tê dîtin:

Payîz! Payîz!
Bûkî pirç zerd,
Mîn mat to zîz!
Herdu hawderd!²¹⁶

²¹³Pîrbal, h.b, h. r.

²¹⁴ Huseyn Xazî Kak Emîn, Nûkirdinewey şîrî kurdî salî 1932 ta salî 1949 le kurdistanî îraq da, Weş. yekem, Weş. rojhelat, Hewlêr, 2008, r. 71.

²¹⁵ Ebdûlla Debax, h.g, r. 100.

²¹⁶ Belawkirawey Panîz, h.b, r. 135.

4- Helbestvanên beriya Goran di helbestan de bas ji xet û xal û perçem û egrîcekirin e lê “Goran kete nava cîhana takekesî û azadiyan de û bi rêya takekesû ve hate nava pîrsgirêkên giştî û berovajî jî”.²¹⁷ Goran kariye bi şewazeke nû bas ji kêşeyên giştî bike û di heman demê de behsa takekes jî bike. Her wisa “Goran babet û kêşe û giriftên civakî xiste û siyasî û mirovî ... ku ev jî kareke nû bû”.²¹⁸ Di vir de diyar e ku Goran kariye ku li ser piraniya mijarên helbesta rojane ya gel û hêlên civakî û siyasî û ronakbîrî û mirovî zal be û li gor têgihiştina xwe şiroveya wan babetan bike. Ku ev kû nîşaneyê jêhatîbûn û jîriya Goran e.

5- Goran kariye ku li pesgala kevin ya beşavendê dûr bikeve û her visa rêzik û yasayên beşavendê û bikar anîna kêşa xwemalî ya Penceyî, xatirxwazî ji eroza erebî û bikar anîna kêşa penceyî û awayên beşavendê, weke beşavenda yekgirtî û cût û hwd. Her wisa helbestvan kariye ku beşavenda ewropî û turkî du helbestên xwe de bikar bîne. Weke mînak Beşavenda “şikspîrî, Pîtrakî, şeşîneyên Pîtrakî û hwd.”²¹⁹

6- Goran kariye ku êketîya babetan bînîte nav hozanên xwe, ku ji layê helbestên helbestvanên kilasîk de berçav ne diket. êketîya babetan jî wisaye ku hemî helbest ji dewrê êk babetî bisûret, belam di şîra kilasîk de her beytek behsa babetekî dikir. eve jî gelek aloz bû, mirov bi sanayî fahim ne dikir. yan jî nikarin zal bin bi ser hemî babetan ku dinav helbestan de dihatne behis kirin. Livir de Goran bi xwe jî behsa vî meselê dikat û dibêje: “ êketîya babet derketîye, eve jî aşkiraye ku dinav helbestên kevin de (yê hemî navça nek tenê yê kurda) liser bingeha êketîya beytan hatye danan ... belam li dumahîyê de li serdema nû kirinê ve êketîya giştîya babetan bûya bingehên helbestê. ”²²⁰

7- Goran mîlletê xwe agehdar diket û han didet ku çav vekiry bin digel pêşkeftina mîlletên dunyaê de, çavê wan ji destê kes nebît, her bixwe xebatê biken mandî bibin jibo bidest anina awat u armancên xwe. “Pêçewane hemî helbestvanên kilasîk gencînek ji nerîn tenzîrat u yadaştên xwe derbarê çemkên helbestî u dahênana wî bicih hêlabû ev kare jî tenê helbestvanên hev nesla xwe jî bi degmen kirîne. mînek derbarê rîalîzmê dibêje: rojhelatîyan çavê xwe brîte asmanê, jiber vî çendîye ku di despêka jîyanê xwe çewa bûyne her wisa jî ji cehê xwe mayne, berev pêşçûn bo wan

²¹⁷ Pîrbal, reg û rîşekanî tazebûnewey şîrî kurdî, r. 197.

²¹⁸ Pîrbal, h.b, r. 198.

²¹⁹ Pîrbal. Reg û rîşekanî tazebûnewey şîrî kurdî, r. 197.

²²⁰ Ehmed Taqane, Tofiq fikret û şaire nwe xwazekani kurd, Weş. yekam, Weş. wezarety perwerde, Hewlêr, 2001, r. 50 - 51.

nîne, belam rojavayan çûnkî dizanin jîyana wan liser erdêye çî gava berê xwe nadene asmanê çavê xwe didene dewr û berê xwe”²²¹

Goran bi egerên ziman zanîna xwe agahî ji edebîyata rojava de hebûye û gelek cara kovar û rojnameyên îngilîzîyan xwîndîteve, her eve jî wisa lê kirîye ku agahî hebît ji hemî aliyên helbestan bi giştî. Dr. Hîmdad derbarê Goranî dibêje: “ji rastîyê de Ebdulla Goran ji helbestên xwe de şorişeka berçav çêkirîye bo helbesta nûya kurdî, bi renekî wisa ku bûye serkirdeya helbesta nûya kurdî.”²²²

2. Bandora Pernasîzmê Di Helbestên Goran De :

Gora, yekem helbestvanê kurde ku ev rêbaze bi kar anîye. Ev jî di rêya xwendina wêjeya ingilîz de, her wiha bandora wî ya ji berhemên helbestvanên ingilîz çêbû. Heya demekê jî bandor bû ji bingeha pernasîzmê. Ji ber vê jî di navnîşanên helbestên wî de ev rastîye derketîye holê. Wekî (Jin û xweşiktî, Rewtek Ciwan, Bu ciwanî sererê.....hwd) Ji bilî vê jî gelek helbestên wî li gel bingeha Pernasîzmê hevdu digirin.

2.1. Hêvîbûna (Xweşiktîya Jin û Xweşiktîya Xwezate) di Helbestên Goran De:

Goran di helbestên xwe de ew hêz û amêrên peyvan bi karanîye. Gelek nazik û balkêşin. “Helbest bi xwe hunerekî a xweşikbûna zimanêye.”²²³ Ji bo hunandina helbestên xwe û hêvîyên xwe xweşiktîya jin û xwezayê bi karanîye. her wekî dahênereka mezin keristew dîyardeyên ciwankirina jinka u xwezayê tevlihev biket dinav helbestekî de. Di piranîya helbestên xwe de zîmanekî wisa bi kar anîye ku mirov dikare bêje zîmanê ciwanîyê. jiber wê çendê ji Nizar Qebanî derbarê zîman û xweşikbûna jinê û xwezayê dibêje: “Gul hezimana, sitêrik hezimana, dar hezimana, çav û rûyên jinê û leş û larê wî hezmanin, kenî jî hezimana”²²⁴

²²¹Ferhad Pîrbal, Goran sîrwanî pernas le şîrî kurdî de (www. raman.com).

²²² Hîmdad Hisên, Antolocîya el - şîr el-kurdî, Weş. el-seqafe, Erbil, 2012, r. 287.

²²³ Dîlşad Elî Muhemed, Pêgey şîrî kilasîky kurdî le edebî rojhelatî de, G. Zankoy Raperîn , j. 6, 2016, r.49.

²²⁴ Hawjîn Silêwe Îsa, Rolî wişe haw watakan le binyatnan û ciwan kiridîn şîr, G. Ekedamîyay kurdî, j.19, Hewlêr, 2011, r. 33.

2.1.1. Helbesta Afret û Ciwanî :

Di helbesta afret û ciwanî de Goran hewildide xweşiktîya jinê û ya xwezayê bi hev re girê bide. Karîye di xweza û jinê de wêneyekî nû û xweşik derbixîne. Serbi wêyekû sitayîşekî gelek bi nirxe û xweşiktî ji bo xwezayê dike. belam bi nerîna wî ev hemu ciwanîye ku di pelkêt dara u zivistan u payîz u beharê de hene hemî ne temamin bê buna van nexş u tablo u ciwanîyên ku xudayê mezin be jinka daye u Dibêje :

Belam tebîet hergîza û hergîz
 Bê runakîye bê bizeî azîz
 Bê awazeye denge nermekey
 Ba neyda le giwêm, têr nelêm oxey (b.p, r. 43)

Goran gelek dibin bandora xweşiktîya jinê deye. Li gorî wî “ Xweza çiqas xweşik be jin jî ronahîyê di xwe de bigire. Jin tamamkerê xweşiktîya xwezatê te, nirxê bi wê xweşiktîyê dide.”²²⁵Li cem wî wisane ku xweza bi hemû xweşikbûna xwe ronahîyê nade dil û deronê. Goran bi şeweyekê wisa ji ciwanîyê u xweşikbûna çavreşê u broya u perçemê u rûyên sor u lêvên yarê axaftîye u bi rengeky wisa lêkirye ku pelkêt gûla behemî nazkî u bèn xweşiyê xwe nikarît bigehte asta ciwanîyê qed u bejn u lêv u rumetên sor u cismê yarê, jiber ciwanîya kiçeka genc hemi ciwanîyên xwezaîyê bê beha dizanit. her wekî dibêjt:

Kam estêrey geş, kam gulî kêwî
 Ale wek kolmî ? Goî memkî, lêwî
 Kam reşî ega be reşî çawî ?
 Birjangî ? biroî, egrîceî xawî ?
 Kam berzî ciwane wek berzî balî ?
 Kam tîşk egate tîşkî nêw nîgaî ?
 kam tase, kam meyîl, kam çawenwarî
 telîsmawîye wek hî dildarî ? (b.p, r. 43)

²²⁵ Rêzan Salih Mewlud, Endêşey Şîrî Lenêwan Rêbazî Kilasîk û Romantîkî Kurdî Le Kurmancî Xwaruda, weş. yekem, weş. Şehab, Hewlêr, 2009, r. 128.

Di vir de bilindîya bejna yara xwe li gel bilindîya darên xwezayê berhev dike. Li gorî wî tiştê yê xwezayê nagehe bejna yara wî. Her wiha pesbê giştî endamên din dike, li gel heyînên xwezayê berhev dike. Bi corekê li cem Goran jin mifteya vekirina nîyaza dil. Ji ber wê jî Goran karîye helbestekê binivîse tejî be ji xweşiktîya laşê jinê.

Her wiha dema behsa tîrêjên çavên yara xwe dike, li gorî wî tîrêjên awirên yarê ji yên rojê diwartir. Bi tîrêjên xwe Goran kor dike. Yan jî li gel tîrêjên din ê xwezayê berhev dike ku çî hêzekî germ û ronî ne wekî tîrêjên çavê yarêne.

Di vê derbarê de (Dr Meruf Xeznedar) dibêje : “Pêşîya ku dîrokna û rexnegirên wêjeya kurdî di derbarê babetên Goran de axaftinan bikin, komek kurdên Silêmanîyê navên goran rakirin. ((Helbestvana Afret û ciwanîyê)) ((Helbestvana Qijkalê Lêw Alê)) ev xweşiktirîn berjengin li cem Goran.”²²⁶

Di vir de jî bi eşkereyî dijîtîya Goran a beramberî felsefeya bi sud derdikeve. (Sant Sîmon) . Ji ber ku di xwest huner û wêje tenê ji bo alîyên fêrkarîyê bikar bêt û sudê wê ji bo civakê hebe. Li gorî Goran bervajî vê felsefê tenê xweşiktî di van helbestan de berdest dikeve û li gorî wî xweşiktîya jinê gelek giringtir û bi bihatire ji ya xwezayê. Ev jî zarevayê (Huner ji bo huner) di helbestên Goran de ji bo me destnîşan dike. Wate; (Ciwanî tenê bi navê Ciwanîye) . Pesnê herdu xweşikbûna (Jin û Xwezayê) dike. Ji ber vê jî “Ev bingeha hizrekî Pernase ((Ciwanî tenê bi navê ciwanîye)). Li cem goran bi berfirehî hest pê dike.”²²⁷Her ji ber wê di helbestên wî de jin bi xwezaya xweşik a rastî anîye di nava helbestên kurdî de.

Di vê derbarê de, li gorî (Rêbiwar Fayîq) “ Wêneyê jinê wekî mihwerekî danîye beramberî wêneyê hemû xwezayê. Ji ber ku bi xwe bi gehiştina nava xwezayê ye. Giringîyê bi xweşikbûna xwezayê dide. Lê belê dibêje xweşikbûna xwezayê bi xweşikbûna jînê xweşike.”²²⁸Goranê helbestvan û ciwanperest li gorî wî (Ciwanî, Xweşiktî) pêktê ji deryayekî bê bin, bilintire ji çîyayên asê û berfin u berfireh.

²²⁶ Mamosta Cehfer, Rêbiwar Heme Tofîq, h.b,r. 308.

²²⁷ Ferhad Pîrbal, reg û rişekanî tazebûnewey şîrî kurdî, r, 203.

²²⁸Rêbiwar Fayîq Herzeleyî, Bemihwerbûnî Jin Le Şîrî Afret û Ciwan Goranî şair de, internet (www.pcdk.org), 2008.

2.1.2. Helbesta Rewtêkî Ciwan :

Goran dubare di helbsta (Rewtekî Ciwan) de bişêweyekî hunermendane bingeha hêvî û xweşiktîya jinê û xweşiktîya xwezayê dîyar dike wekî endazîyarekî. Vê carê jî di destpêka helbesta xwe de behsa îstatîkên heyînên xwezayê dike. Dibêje :

Le jêr zerdey Xoretawe .
 Benaw çîmenî gwê awa.
 Çen be aheng, çen sîhrawî.
 Egerê qaz, yan mirawî.
 Ya kem Leser befrî nizar.
 Bo lotkeî hezar be hezar
 çen êsik sûk, çen gurcûgol
 ekşê pişt le toy textî dol
 ya kerwêşkî têr û qelew
 leber tirîfey mange şew
 çen ciwan erwa be qûne qûn
 siek û gurc û sipî û xirpin(b.p, r. 44)

Di vir de jî giringî bi bexşîşên xudayê mezin dide li beramberî xweşiktîya xwezayê. Wekî deryayekî bê bin şeydayê ciwanîya xwezayê ye. Hîna jî xwesteka wî têr naka beraberî ciwanîya jinê. (Dr Maruf Xeznedar) dibêje : “ Rexnegirên rojhelata navîn dildarî kirîne du beş " Dildarîya rastî û dildarîya mecazî ". Yan jî dildarîya asmanî û dildarîya zemînî (Erd). Yan jî dildarîya canî û dildarîya laşî (Madî, Meteryal). Goran jî helbestvanê beşê duweme. Jin Sembola hebûn û cîhanê ye, li cem wî wekî (Peykerekî) hustayîye di wesifkirina wî peykerî de.”²²⁹

²²⁹M. Cehfer, Rêbiwar Tufiq , h.b, r. 308.

Di vir de ji mere tê dîyarkirin ku Goran bi vî awayî Pesan jinê dide. Dilê mirov dema mendkêş dike lerizînê di laşê mirovde çêdike wekî dibêje :

Ewende ciwan lewe ciwantir.

Le şineî baî şew rewantir.

Le lereî pirşang, awaze.

Le xorey aw, şîerî taze.

Be ahengtr, bexo rûştir.

Be giwêçkeî dil dengî xoştir.

Pêy naz enê be ser erza

ciwanê le bejneki berza ! (b.p, r. 44)

Li gorî Goran xweza çiqas xweşiktir be, ji wê xweşiktir jine. Her wiha xişîna bayê û xorîna avê ciwantirîn bejna bilind yara wîye. Li gorî wî ciwanîya yarawî hîna hevseng ne hatiye kiring beramberî ciwanîya xwezayê. Di vê derbarê de (Rêbiwar Fayîq) dibêje : “ Ev eşqa ciwanîyê pelkêş dike ji bo eşqa ciwanîya yezdan. Goran dibêje; Xudawo te di cîhanê de jin xolqandîye. Her ev çêkirina te ciwanîya hemû tiştên din ji bo xwe birîye. Ji ber wê jî ez nikarim bêjim tiştek din ji jinê xweşiktir heye. ”²³⁰

Di vir de ji mere eşkere dibe ku li cem wî jin ji hemû heyînên din ê xwezayê ciwantir û naziktire. Eşqa naz û eşqa ciwan jine. Bi heman şêwe di vê helbesta wî de bingeha pernasîzmê bi ser wî de çespaye. Ji ber ku digeh radeye ciwanîya jinê. Ji ber vê jî Goran helbestên sudê bi gehîne civakê, sîyastê yan jî her tiştêkî din ne gotîye. “Ciwankarî bingeha serekî a hunera hemû mijarekî helbestîye. Ji ber ku tama hunera helbestan zêdetire. ji rêka îstatîkayê helbestan dête bûn”²³¹ Ew jî wekî pernasîzman xwe dur digire ku helbest jêr xizmeta civakê debe. Pernasîst dibêjin : Armanca serekî ya di helbestê de berdestkirina ciwanî û tam girtinêye. Her li cihekê ciwanî li ber çavên wan bike ewê dikin hêvênê helbestekî nû û bi şeweyê ciwanî dadirêjin. Goran jî ji vê ne dure, her tiştê ku didît ciwane bi ser de derbaz ne dibû. Ji ber vê jî armanca Goran û Pernasîstan ciwanîye.

²³⁰ Rêbiwar Fayîq û Herzeleyî, h.g, h.s.

²³¹ Rêzan Salih Mewlud, h.b, r. 110.

Di vê helbestê de Goran girîngîyekî zêde bi wezin û serwayê daye. Bi şêweyekî pir xweşik bi kar anîye. Ev jî yek ji bingeheên pernasîstan bû ku girîngîyekî zêde bi wezin û serwayê didan. Goran jî di helbestên xwede heman rêçke girtîye. Her wekî di vê helbeste de wezna tilîya malî bi karaniye dibêje :

Çen/ ciwan/ er / wa / be / qu/ ne / qun. (4+4)
Sir / ku / gur / cu/ si / pî û / xir/ pin . (2+2+2+2)

Ev wezne jî wezna heşt kiteyîye, ji vêre wezna heşt kiteyî tê gotin. “Wezna heşt kiteyî di folklorê kurdî de gelek heye. Em çiqas berbi navçeyên kurmanca ve herin emê ew qasê zêde bibînin.”²³² Ji ber wê jî herî zêde helbestên Goran li ser bingeha vê weznêne. Goran zivirîye ser çavkanîyên folklorê kurdî, di helbestên wî de jî bi şêweyekî berçav eşkere dibe. Her wekî di vê helbestê de jî eşkere bûye :

Pêy/ naz / e / nê / be / ser / er / za. (4+4)
Ciwa / nê / le / bej / nê/kî / ber / za. (4+4)

Goran di helbestên xwe de çend corên serwa (qafîye) bi karaniye. Bi taybetî jî serwaya mesnewî (Cot serwa) di gelek helbestên xwe de bikar anîye. Goran daxaz diket ku şîr bi tamamî ji wezin û qafîyê de rizgar bibe û dibêje: “Eger pêtivîya wezin û qafîyê digorê de nebe, daxaz û mebestên dil gelek bi sanahî û eşikratir der diket”²³³ Dur ketîye ji serwaya yekgirtî her wekî (Kakey Felah) di derbarê durketina Goran ji serwaya yekgirtî berbi serwaya mesnewî ve çûyîn dibêje : “ Qafîye jî girîngîyek û nirxekî taybet hebû li cem Goran. Lê belê wî di helbestên xwe de tama yek qafîyê şewandîye. Gelek qafîyeyên du du bikar anîye. ”²³⁴ Her wekî di helbesta Rewtekî Ciwan de dibêje :

Le jêr zerdey xoretawa. A
Benaw çîmenî gwê awa. A
Çen be aheng çen be sihrawî. B
Egerê qaz yan mîrawî B
Ya kew Leser befrî nizar. C
Bo lotkey hezar be hezar. C

²³²Pexşan Elî Ehmed, h.b, r. 73.

²³³Ferhad Pîrbal, Kironolojîyay şîrî nwêy kurdî 1898-1958, G. Şîn, j. 3, Hewlêr, 2004, r. 37.

²³⁴ Ferhad Pîrbal, h.g, r. 101

2.1.3. Helbesta Ciwanî Bê Naw :

Her di derbarê hêvîya xweşikbûna jin û xwezayê de Gorandî helbesta (Ciwanî Bê Naw) di xwaze bêje : Giringî di alîyê jinê de ye. Ka ew jin kîye ? Keça kêye ? Ne girînge ji kîjan jînegeyê ye û serbi çi netewêye ? Di derbarê vê helbestê de (Dr Maruf Xeznedarî) dibêje : “Didema nivîsîna vê helbestê de helbestvan ji yafayê bûye, Tê xuyakirin ku Goran li ser şeqamekê , çav bi nazdarekê ketîye û navê wê nezanîye. Lê belê îlhama xweşikbûna wê girtîye û ketîye wesifkirinê de.”²³⁵ Dibêje :

Raste min rêbiwarim, serpêy erwanim.
Belam wa ciwanî tu karîkrd le giyanim.
Elêy nek her êsta, Omrêkî dirêje.
Bew dest û pencanet birînim sarêje
ey kiçe kaleke ciwanî tir ba zor bin
le baxçey behara gulbaxî ber xor bin
ba rengîyan perdaxit bê û cêgeyan ser çil bê
be watey xelkî tir ba nawîyan şagul bê(b.p, r. 65)

Li cem wî ya girîng ewe ku, ew ciwanî û rumet dîmena xwezayî xweda pê beşîye. Di dilê goran de bûye hêvênêkî xweşik. (Dr Meruf Xeznedar dibêje : “ Goran karîye misogerîyekê ji jinê çêbike. Hemû jinekî Kurd yan jî bîyanî Rojhelat û Rojava be. Goran wekî matiryalekê jin gehandîye pileyekî bilind û aramgeha (Tac Mihel) çêkirîye. yan jî wekî van awazên kû (Rîmiskî korsakov)êçêkirîne jibo wesfa şehrezadê ji baregaya mîrê çîrokan bo wî dibêjît, yan jî ji seyraneka şevêkî beharê daye. Bi vî awayî jî Goran bûye helbestvan, hunermend û mîmarekî afrêner.”²³⁶

²³⁵ Maruf Xeznedar, h.b , r. 548.

²³⁶ M. Cehfer, Rêbiwar Heme Tofiq , h.b, r. 308.

Helbestvan her di vê helbestê de bi şeweyekî balkêş behsa xweşikbûna xwezayê dike. Tenê yekî wekî Goran bi hurî dikare balê bide vê ciwanîyê. Dikare bi awayekî bêxe ber çavan ku mirov hest jî pê neke. Lê belê ew awir dide bi şeweyekî ciwan di çend peyvan de dîyar dike wekî dibêje :

Gîyanî min bo telê wewêşe peroşe.
Ke le jêr sêberî tu tirka xamoşe.
Le hemu asmana estêrey ber beyan
Exate dilî min hestêkî sipî û ciwan
Le textêk heldestê hezar û yek nexme
eweyan şîrîntir dête giwê m zor nizme.....(b.p, r. 65)

Di vê rêzika helbestê de “ Pernasbûna Goran di alîyê ne pejirandina Felsefeya bi sud deye (Sant sîmon de) Gelek bi xweşiktî derdikeve, bi dîtina helbestvan Goran (Felsefeya Pernase) hertim bi amêr û babetên ciwan di jîyanê de balekê lê nade li cem mirov feramoş kirîye.”²³⁷Ji ber wê Goran karîye her di wê xwezaya xweşikde li pey tiştên dilgir de bi gere. Her çiqas ev ne li ber çavanin jî û veşartîne. Lê belê nehênîyekî mezin û ciwan di pişt van de xwe veşartîye. Ev jî canê ciwanperestî û keyfxweşîya Goran derdixê holê jibo nihênîyên veşartîyên ciwanîyê. Di vir de “ Hizrê helbestvanî di wişa (Xamoşê)deye. têla wewêşe anîye dema dikeve jêr (Totirk) de. Ev dîmene li cem kesên asanî ne bi tame belam hest nazikî û hurd bîbîyê helbestvanî bo xwêzayê û dewrûberê wisa kirîye, kû tele wewêşeke ciwanîyeka gelek mezin hebî û çêj û tama bi derûnê bidet.”²³⁸ yan jî livir de dibêje:

Kanîyekî runî ber tirîfey mange şew.
Le binya bilerzê mirwarî zîx û çew.
Ciwantire le lay min le deryaî bê sinor.
Şepolî bate ber tîşkî roj şlp û hur !
Qij kalî lêw alî pirşingî nîga kal,
Ey kiçe ciwanekey sergona nextêç al!
Derbest nîm rêbwarim, derbest nîm rewtenîm
Ezanî şîpirze û derbestî êcgar çîm?
Hî ewey nîgarêk le yadim kêşrawe,
şoxêkî nayabe, belam ax, bênawe.(b.p, r. 65)

²³⁷ Pîrbal, reg û rîşekanî tazebûnewey şîrî kurdî, r. 202 .

²³⁸Rêzan Salih Mewlud, h.b, r. 112.

Di vir de taybetmendiyên hunerî yê bi sud û rast di van rêzikê helbestê de bi bandore. Kanîyekî biçûk a xwezayê gelek ciwantire ji deryayekî bê bin û bê sinor. Goran “ Di helbestên xwe de hinek caran jî amêrên helbestên xwe bê bandor kirîye. Lê belê nirx û girîngîya we pê bexşîye. Li ber çavê mirovan sade û heman girîngî û ciwanî pê bexşîye.”²³⁹Di vir de goran karîye wêneyê komek tiştên hestkirî û heyberî bikêşe. Lê belê xwendevan û mirovên asayî bi wan tiştên asayî û hestkirîre ne gehane û ne dîtîne.

2.1.4. Helbesta Bo Kîçekî Bêgane :

Di vê helbestê de bandora rêbaza (Huner ji bo huner) bi temamî pêve dîyare. Goran bi xwe derbarê sud wergirtina ji wêjeya inglîz de dibêje :“Di destpêkê de ez bi wêjeya inglîz li pey hunera ji bo huner diçûm û min berhemên van wêjeyan di xwend wekî (Con Kîtis û Oskar Wayeld).”²⁴⁰Di destpêkê de wekî ciwan perestekî behsa xweşikbûna , laş, por, çavê şîn, bejin, nîgar û dîmenê keçikekî bîyanî dike. Ev pesindayîn jî ji bo keçekî Ewropîye. Lê belê ev xweşikbûn hemû di jin yan jî keçikê de heye. Lê hîna jî wekî xwesteka dilê wî ne çêbûye. Hîna birçiyê dîmenên xweşik yê din ne. Dibêje :

Emanem gişt la ciwan bûwe û la ciwane.

Belam hergîz tenya ciwanî emane.

Boy neşkanum tunyetî û arezuy dil.

Her gerawe melî bîrsîm çil û çil.... (b.p, r. 66)

Piştî jî tê li ser behsa xweza û eşqa xwe ya ji bo ciwanîya gula sor. Lê çiqas jêr navê gulê de rastî eşan jî hatîbe her pesna wê dike. Dibêje :

Le heç baxêk gulêkî surim dîbê.

Boy çûm hezar dirk la pêm çeçîbê!

Her ewendeş gîrodey gulî sûr bûm

Naşareza û pepûley dûr be dûr bûm!(b.p, r. 66)

²³⁹ Fazil Mecîd Mehmûd, h.b, r. 65.

²⁴⁰ Nesrîn Reûf İsmael, h.b, r,175.

Di vir de helbestvan karîye komek wêneyê xweza û jinê bi hev re kom bike. Helbestên xweşik jî jê çêbibe. Pişt re jî dibêje :

Emca îtir kewtumete beyanî
Bo ciwanekî tirî peş aşinayî.
Ciwaney tirîş her wekû em ciwanane.
Ney tiwanîwe damirkênê em gîyane.....(b.p, r. 66)

Di vir de Goran xwe di cihê vê de dibîne û van ciwanîyan hemûyan jî nasnake. Hîna agirê dilê wî ne temirîye. Li her cihî li pey ciwanîyê digere. Heya nefesa xwe a dawî jî li pey ciwanîyê digera û helbestan ji bo wan dihunand. Ev helbest berevajî helbestên dine, di destpêkê de behsa xweşiktîya jînê dike û pişt re tê li ser xweşiktîya xwezayê. Pişt re jî neynikê li gel yên din vedike. Bingeha (Huner ji bo huner) di helbestên goran de tê wateya ; (Ciwanî ji bo ciwanî).

Di helbestê de vê destnîşan dike, canê wî yê têhn li pey wateyek nû ya xweza û jinê digere. Ji ber vê jî helbestvan gelek bi hurî û jîrî tev digere. Helbestvan li her cihê ku dîmenan dibîne têne dike hêvênê helbestekî nû. Di helbestên xwe de biharê geş dike. “Erkê ciwanîyê di helbestan de dîtîye. Wekî : (sitêrk, heyîv, gul, yanjî nazdara ku ber bi kanîyê ve diçe bi gozeya avê). Goran karîye van dîmenan bikêşe û ev dîmen li her cihekî jî heye.”²⁴¹ Ev jî erkê ciwannas û pernasîzmane herde li her cihekê evîndarê xweşikbûnê ne û xwe tenê di xweşikbûnê de dibînin.

²⁴¹Nesrîn Reûf îsmael, h.b,r,177.

2.1.5. Helbesta Bestey Dildar :

Li vir jî Goran xweşikbûna xwezayê kirîye hêvîya xweşikbûna jinê. Helbestvan li pey xweşiktîya jinê û hemû xweşiktîya kevin a xwezaya Kurdistanê geraye. Lê belê kesek ne dîtîye wekî yara wî şox û şeng be. Ji ber wê jî xweşikbûna çî keçikan ne wekî xweşikbûna yara wîye. Dibêje :

Le jêr asîmanî şîna.
 Le pal lutkey berfîna.
 Kurdistan geram.
 Dolaw dol pêwam.
 Ne le şar û ne le dê.
 Nemdî kes
 Wek to ciwan bê!
 Toytu bes
 Kiçe kurdêk dil pêy şad bê,
 wek firîşte ûperîzad bê!(b.p, r. 54)

Goran li hemû bajar û gundên Kurdistanê geraye kesek ne dîtîye wekî yara wî xweşik be. Ji ber wê jî me got Goranê dînê xweşik. Giringtirîn zareva li cem wî xweşikbûne. Di nava helbestên wî de gelek caran dubare bûye û bikar anîye. Goran di derbarê ciwanperest û pernasîzman de dibêje : “ Zilamekê bîne pêş çavê xwe, ew ciwanîya ku di asîmanê û erdê de heye , di deng û reng de, jiber çî hest bi çî ji wan naket. van ciwanîyên ku ji kirdeweyên şîrîn de hene hemî li nik wan hîç be. recayê dikem ew zilame dibe behaya jîyna wî çî be”²⁴²

²⁴²Pîrbal,, reg û rîşekanî tazebûnewey şîrî kurdî, r. 202.

Dîsan goran di vir de hestên xwe yên beramberî xweşikbûnê dîyar dike. Wekî pêwîstiyekê dibîne, pêwîste xelk jî girîngiyê bidin ciwanîya xweza û jinê. dîsa dibêje:

Ne barîkî, ne goştin,
 Ne kiçoley, ne şajin,
 Ne zor çaw reşî
 Ne êcgar geşî
 Belam be nîgay şîrîn:
 Nemdî kes
 Wek to betîn
 Toîyt û bes
 Lêt bê bizey mange şewî!
 bejin rêk û rewî kewî..... (b.p, r. 54)

Di kombûna van helbestan de goran xweşikbûna xwezayê û ya jinê bi hêvî kirîye. Ev çend têbînîyên li jêr ji me re dîyar dike ku çawe helbestên wî hatîne dabeşkirin:

Helbestvan di helbesta (Afret û Ciwan) li jêr navê xweşikbûna xwezayê de behsa xweşiktîya jinê dike. li çavê ciwanîya xwezayê berê xwe didete ciwanîya jinê. Bi vî awayî corên hevokan dabeş kirîye. Di destpêkê de bi (8) rêzikan behsa ciwanîya xwezayê dike. Bi vê rêzîkê jî destpê dike.

Be asmanewe estêrem dîwe.
 Le baxçey behar gulim çînîwe. (b.p, r. 43)

Vêca hatîte ser pê helgotina ciwanîya jinê û bi (6) beytên ciwan wesifa jinê dikew bi şewazeka hunerî bingehêka endazyarî çê dike jibo girêdana herdu ciwanîyên jin u xwezayê. li vî beytê de ciwanîyên jinê derdixê û dibêje:

Belam tabîet hergîza û hergîz
 Bê rûnakîye bê bizey azîz (b.p, r. 43)

Di destpêka helbestê de xweşikbûna xwezayê dide dîyarkirin. Di naverok û dawîyê de jî behsa xweşiktîya jinê dike.

Di helbesta (Rewtêkî Ciwan) de helbestavn bi (12) rêzikan behsa sadeyî û heyînên xwezayê dike û wesfa cûleyên tayr û gîyandara diket û dibêje :

Yakew Leser befrî nizar.

Bo lutkey hezar be hezar. (b.p, r. 44)

Di vê helbestê de tenê di dawîya rêzika yekem de behsa xweşîkbûna jinê dike. Dibêje :

Pêy naz enê be ser erza.

Ciwanê le bejnêkî berza. (b.p, r. 44)

Bi heman awayî di helbesta (Bestey Dildar) de bi çar (4) rêzîkên biçûk û kurt behsa xwezaya kurdistanê dike û dibêje.

Le jêr asîmanî şîna.

Le pal lutkey befrîna .

Kurdistan geram

dolaw dol pêwam (b.p, r. 54)

Piştî van çarîkan (4 beytan) di helbesta tevlihev bûne li gel ciwanîya jinê ye heya dawî û dibêjê:

Ne barîkî ne goştin.

Ne kiçoley ne şajin.(b.p, r. 54)

Lê belê helbestvan di helbesta (Ciwanî bê naw) de, berevajî helbestên dine. Di rêzîkên destpêkê yê helbestê de behsa jinê dike. Ji 7 rêzîkan pêktê û dibêje:

Qijî kalî lêw alî pirşingî nîga kal.

Ey Kiçe ciwanekey ser gona nextêk al.....(b.p, r. 65)

Vêca bi pênc rêzîkan behsa xweza û xweşîkbûnê dike. Di naverokê de dibêje:

Gîyanî min bo telê wewêşe peroşe.

Ke le jêr sêberî tutirka xamoşe..... (b.p, r. 65)

Di dawîyê de wesifkirina xweşikbûna xwezatê dike. Her dawî jî tê li ser xweşiktîya jinê. Bi sê rêzikan wesfa xweşiktîya jinê dike. Heman rêzika yekem di helbestê de dubare dike, heya dawî li helbestê tine.

Her wiha di helbesta (Bo Kiçekî Bêgane)de dubare ji destpêkê de helbestvan behsa xweşikbûna jinê dike û dibêje :

Zor qijî zerd serincî rakêşawim

Zor çawî şîn dawîye pirşing le çawim.....(b.p, r. 66)

Ji naverokê de dihête ser behsa ciwanîyên xwêzayê û dibêje:

Le heç baxêk gulêkî sûrm dibê

Boy çûm hezar dirik le pêm çeçqîbê.....(b.p, r. 66)

Ji dumahîyê de dihête ser wesifkirina ciwanîyên jinê û berdewam dibe ji helbesta xwe ta dumahîyê û dibêje:

Koşî germ û derunî sard û sirbû.

Zimanî nerm, nîhadî ecgar dir bû.....(b.p, r. 66)

2.2. Xweşikbûna Jinê Di Helbestên Goran De:

Helbestvan di derbarê wesfkirina xweşikbûna jinê de, ji bo razîkirin û ciwan kirina helbestên xwe hewil daye peyvên xweşik û sade bi karbîne. Ev jî li gel xweşikbûna jinê, li gel nazîk, bejin û nîgarên wê tê. Goran dema pesnê jinê dide, wekî li beramberî peykerê wê sekinîye û bi vî awayî wêneyên wê dikêşe. “ Xet bi xet endamên leş û ruxsarê û bizûtin û nazîkî û deng û hest û nest û jê hatî wêneyên ciwanyê di nexşînin û çêdikin.”²⁴³

2.2.1. Helbesta Cîlwey Şano :

Helbestvan di vê helbestê de behsa xweşî û şahîyê dike. Dibêje tenê xweşiktî dikare aramîyê bi leş bi bexşîne. Ji ber wê jî pernasîst dibêjin : “ Ciwanî sedemê rizgarkirin û mayîna armancaye, çavkanîya bextewariyê ye. Goran jî ev pîrensîbe ji wan wergirtiye û di helbestên xwe de bikar anîye.”²⁴⁴ Her wekî dibêje :

Heyatî ciwanî, cemalî bizotin û gîyanî.

Wicudîşwe û naz,

Le xiwawe behreyeke pir be pêste bo afret.

Ewîş be sed îecaz

Zîyaî sirur erjênête jînî însanî !

(b.p, r. 107)

Di vir de xweşikbûn deronîyê hunik dike. Bi awayekî paqij têxe di canê mirovan de. Di heman demê de hêza jîyanê jî pê di bexşîne. Ji ber vê jî Goran “Sudê ji teknîkên pernasîzmê werdigire. Zarevayê Reha yê di nava laşê jinê de dîyar dike. Tenê (xweşiktî û bes) dikare bextewerîyê bi mirov û cîhanê bi bexşîne.”²⁴⁵

²⁴³Letîf Mihemed Hesên, Rehendekanî ciwanî kiç le honirawaye bo kiçêkî bêganey goran de, G. Şîn, j. 19, Hewlêr, 2006, r. 78.

²⁴⁴Pîrbal,, reg û rîşekanî tazebûnewey şîrî kurdî, r. 203.

²⁴⁵Pîrbal, h.b, h.r.

Helbestvan di helbestên xwe de canê xwe dike qurban, ji bo xweşiktîya jinê dike feda.
Dibêje :

Fîdat bim ey jinî ciwan, ey cemalî sinetkar.

Belê : delilî seadet exîte pêş enzar.

Belam hemu tawê

Dewam eka.... le pirêka weku melî awat

Ke to firît heyhat

Awîş le perde epêçrê, nîşaneyek, nawê

Le to bimênê: penaye be xatirey meîyus,

Welê le ew, le seadet: sifir... sifir... efsus (b.p, r. 107)

Goran ji bo jinê dibêje : Her mifteyekî ji bo mirovan vekirina derîyekî yê xweşî û şahîyê ye. Tu hunermend û çêkerê hemû xweşîyên di jîyanê deyî. Goran karîye ji goşt û hestîyan çend peykerên jinê çêbike. Li pey wê tiştê veşartî û bêdeng di gere ku aramîyê bi dilê mirovan di bexşîne.

2.2.2. Helbesta Awatî Durî :

Goran hertim evîndarê xweşiktîya laşê jinê bûye. Di gelek helbestên xwede pesna xweşiktîya jinê dike. Tenê yekem helbestvane ku bi vî awayî li ser xweşikbûna jinê serwer be. Di gelek helbestên xwe de pesnê xweşikbûna jinê dike. Goran jî wekî pernasîzman peyama xweşikbûnê dide naskirin. dibêje:

Kiwanê zulfî reş?

Kulmî al û geş ?

Kiwa heykelî cemal ?

kwa husnî bê mîsal ? (b.p, r. 45)

Goran di vir de pirsyarê dike. Li pey zolfa reş, kolma al bejin, husnê bê wêne û durîya hêvîya xweşiktîya jinê digere. Wekî ku di navnîşana helbesta wî de dîyare. (Hêvîyên Dur).

Eger ciwanîya jinê jî nebîne lê hertim di hizir, xeyal û mejîyê wî deye. Ji ber vê jî dibêje :

Babê xendey pir aheng bê !

Nexmey nazî şox u şeng bê!

zirey bazin bê !

Berew lay min bê!

Harey heyasekey.

Wirişefî kirasekey!..... (b.p, r. 45)

Daxwaz dike yara wî were, bi hemû xweşikbûna ruyê xwe ve were. Li gorî wî xweşikbûn cewherê jîyanê ye. Karîye di hemû tiştan de xweşikbûnê bi dest bixe. Di helbestên xwe de gelek girîngî bi formê daye û kirîye rêgezê serekî ji bo razîkirina helbestên xwe. Bi taybetî wezna serwa (Qafiye) a helbesta wî û girîngîyê zêde bi serwayê daye. Wekî ((reş, geş, cemal, mîsal....hwd). Ev jî bingehek din ya pernasîzmê ye. Li gorî wan qafye di helbestê de wekî mîxekî zêrîne. Ji ber wê jî goran ev beravajîye ji wan wergirtîye û di helbestên xwe de bi karanîye.

2.2.3. Helbesta Huznî Peçe :

Xweşikbûna jinê li cem Goran wekî tîrêjekî a heyva şevê ronî dike ye. Wekî sitêrk û şevê hertim geşe. Çavkanîyên nehênî yên jîyanê ne. Hêvîya wî ewe xwe bike qurbanê hest û nestê nazik yê jinekê. “Goran jî ku bi rehbera nû kirina helbesta kurdîyê tê hejimar kirin. dimen û nexş û wênew çêşin û şêwazên heykelê di helbestên xwe de bikar anîye”²⁴⁶Dibêje :

Witim fiday cemalit bim ey perî şêwe.

Ewa tiwayewe hestim be sozişî girayet.

Çîye ke heykelî mer mer, xubarî wa pêwe.

Qemer şikat û sikala eka le hewrî xefet. (b.p, r. 39)

²⁴⁶Kemal Hisên Xembar, Çend lêkolîneweyekî edebî , Weş. Roşinbîrî, Hewlêr, 2006, r. 73.

Goran ew qas aşiq û dînê xweşikbûnê ye, qet naxwaze bejna yara xwe bike peykerek û wesfa wê bike. Ji ber ku wê toz bigire. Li gorî wî heyv jî sikale dike. Nabe ewrê xemgîn li ser bejna peykerê yarê be. Ji ber ku li cem Goran xem û xefet bandorê li ser laş,nîgar û sîmayê nazik ê jinê dike. Goran rewşenbîrîyekî bilind hebû. Ev jî yek ji berjengên pernasîzmane. Bi xwe dibêjin :Em komek kesên keyfxweş yên civakêne. Ji ber wê jî ev keyfxweşîye li cem goran jî çêbûye û eve jî bûye sedemê pernasîbûna goranî.

2.2.4. Helbesta Bo ciwanî sere rê :

Di vê helbestê de goran wekî pernasîstekê hewil dide bi ciwantirîn şêwe wesfê ru û dîmenekê bike. Dur be ji xwesteka laşê jinê. Belkî berevajî wê tenê ciwanîyê dike. Li gorî wî eger ciwanî di tişteke de nebe, ew tişt bê nîrx û bê bihaye. Dibêje :

Sil meke le meylî be germî ruwanînm.
Pîyawêkim ciwanîye qîblegay ayînim.
Serncêk min eydem lew bejin û balaye.
Le sîneî pakewe bo ciwanî tenyaye....(b.p, r. 53)

Di vir de goran peyama heskirin û dildarîya xwe ji bo yara xwe dîyar dike. Gazî dike were cem wî. Bêyî çî sansorekî civakî. Helbestvan di vir de “ Îdaya ciwan perestîyê dike û misoger dike. Tenê singê paqij ji bo ciwanîyê ye.) Eger em bi firoîdyane temaşeyî nava qesîdeyê bikîn, tenê (Paqijî) wê li ber çavê me bikeve.”²⁴⁷Xweşiktî li cem wî tenê ne yek tişte belku rêjeyeke. Ji ber wê dibêje :

Emewê ke derçûm lem dêye beyanî.
Xatîrem helgirê ciwantirîn nîşanî !
Çunkî ax! eger çî êwe min emirênin, belam
To, xot û dêt lay min her emênin,..... (b.p, r. 53)

²⁴⁷ M. Cehfer, Rêbiwar Heme Tofiq , h.b, r. 51.

Goran xwe li cihê wê dibîne gelek ciwanî dîtîye û ne girînge nasbike yan jî nasneke. Ya girîng ew e ku evxweşîkbûn diçe xaneyê (nest) ê û li bîra wî dedimîne. Dibe sedemê hizrekî nû ji bo danîna helbestekî nazîk û bilind. Dibêje :

Toyîş legel her ciwanêk ebînm ta emrim.
Ebête mirwarî bo milwênkey şîerm ! (b.p, r. 53)

Ev ciwanîye sedemeke ji bo jidaîk bûna helbestekîdin jîbo ciwanîyê û evîniye, divî helbestî de binemayekî ji hizrên pernasan deîyar dibê wekî dibêjît:

Serncêk min eydem lew bejin û balaye.
Le sîneî pakewe bo ciwanî tenyaye.... (b.p, r. 53)

“Ev dîtina goran ji heman bîngeha pernasîzman (Huner ji bo huner) wergirtîye. Pernasîzm, xweşîkbûn di nava xwe de armanceke. Nabe amrazekî giştî ji bo armancekî din.”²⁴⁸Eşkere dibe ku ev rêbaz bi temamî bandora wê li ser helbestvan çêbûye, tevî hest, deron û can bûye. Li cem Goran xweşîkbûn armance û girîngtirîn heyîne di helbestên wî de. Wekî amrazekî bi kar nayne.

2.2.5. Helbesta Gulî Xwênawî :

Di vê helbestê de helbestvan sudê ji çîroka (Gul û Bilbil) a (Oskar Wayeld) wergirtîye. Teknîka helbestên rojavayî bikar anîye. Ji ber ku divê helbestê de bi taybetî bîngeha pernasîzmê bi serde hatîye. Demaku dibêje :

Kiç le rêy ciwanîta, kiç le rêy ciwanîta.
Kiç le rêy nîw nîgayî hatuçooy kanîta.
Payîze, gelay dar rijawe, bax rute.
Gul kiwanê ? gul lêwî be bize pişkute !.....(b.p, r. 47)

²⁴⁸ Pîrbal, , reg û rîşekanî tazebûnewey şîrî kurdî, r. 203.

Di vê helbestê de “ Goran mînakek xweşik a pernasîzmê hîlbijartîye û ji bo behreyê jê girtîye. Ev behre jî ji Oskar Wayeld û Helbestvanên din yê pernasanwergirtîye. belgeyek din ê pernas bûnagoranîye.”²⁴⁹Ev jî di encama zîrekîya wî de çêdibe. Hertim xerîkî xwendina berhemên Ewropî û cîhanî bû. Karîye sudê ji wan bigire. Ji bo helbestekî nu ya kurdî bi zimanekî sade û bitam bikar bîne.

2.2.6. Helbesta Ciwanî Le Ladî :

Helbestvan dema wesfa keçîkekî gundî dike. Bi wêneyekî fotografi û balkêş wesfê dike. Hestê xwendevan dirijîne, wêneyekî wisan têxe pêş çavên wan, wekî di rastîyê de li pêş çavê wane. Dibêje : Goran, “ Helbestên wî dîyalogî û çîrokîne, kemereya (sînemaya tugrafîne) yan jî dîmenên (sên) . Mirov dikare hinek corên helbestên wî bike muzîka Operayê û gelek serkeftî be. ”²⁵⁰ Ji ber wê dibêje :

Êwareye wa derkewe sa ciwane kiçî dê.
Ey wîrdî qise û besteyî gişt kurgelî ser rê !
Sutawî cwanîtin hemû kêy kurî kê !
Êwareye wa, helgire sa gozeyî taze !....(b.p, r. 57)

Li gorî wî xweşikbûn bandorekî mezin li ser mirovan dike. Dema ku kurekî axa yan jî hejarekî, li pey keçekî xweşik çû bi asanî dest jê bernade û derbaz nabe. Pêwîstîya wî bi canê fedayî heye. Eger em bi hurî temaşeyî dîmenên vê helbestê bikîn wê cîhanek di xeyalên mede çêbibe. Wekî em xwe di nava bûyerên helbestê de dibînin. Ev jî hizrekî balkêş a ciwan nasîyê ye.

2.2.7. Helbesta Le Dirzî Peçe :

Goran di vê helbestê de derbarê hestên ciwannasîya xwe a bermberî xweşikbûna jinê dibêje. Xwestîye jinê ji Efsane û Efsanegerîyê derbixe. Ew wesfên di helbestên kurdî ji bo jinê kirîne efsane durin ji rastîyan. Eger em wêneyê helbestekî kilasîk bikîn tabloyek, zilf zincîrî, birjang tîr biro şîr, emê bibînin ku wêneyekî bi tirs a jinê çêbûye.

²⁴⁹Ferhad Pîrbal, h.b, r. 203.

²⁵⁰Rizgar Hesên, Îtirafekey Şêrko Bêkes, internet, (Kurdistan net, info) Siwêd, 2009 .

Mirov ji ber wê ji heyîna jinê acize û jê direve. Di helbesta (Dirzî Peçe) de helbestvan dibêje :

Le Pir nazanm çon serm helbirî
Beramberim bejnêk derkewit wek perî
Legel ewey le ebawe ala bû
Le dîmenî şîrînî aşkirabû.....(b.p, r. 58)

Ev jî dîmenekî gelek veşartîye. Çi kesek heye wekî Goran ? Çi çavek heye wekî çavê Goran) Dibin wê hemû pêçana çarşeva reş de wesfa xweşîkbûna jinê dike. Çarşeva reş bêyî girtina ser û çav ne xweşîke. Lê belê tiştê nikare xweşîkbûnê ji çavên goran veşêre. Goran “ Bi jin anîna kilasîkî û heskirinê re peywendîya vê ne daye dîyarkirin.”²⁵¹ Ev jî wêneyekî kême, tenê yekî wekî Goran ciwan perest dikare hest bi van wêneyan bike.

2.3. Îsîtatîkaya Şîrî Di Helbestên Goran De :

Goran ji bilî xweşîkbûna xweza û jinê , xweşîk bûnek ji meznahîya helbestan u tama helbestan di helbestan de jî çêdike.

2.3.1. Helbesta Bo Gewreyekî Şîrî Dost :

Goran di helbestê de behsa xweşîkbûna helbestê dike. Wekî xweşîkbûna jinê wsfa helbestê jî dike. Ev jî li gel bingeha pernasizman hevdû digire. Ji ber ku me got: (Rêbaza pernasîzmê taybete bi helbestê) Ji ber wê helbestên wî wekî heyînekê safe. Divê derbarê de Rêbiwar Fayîq dibêje: “Semaya helbesta Goran wekî semaya laşê balkêş ê jinêye. Helbest semaya endîşe û can.”²⁵²

²⁵¹M. Cehfer, Rêbiwar Heme Tofîq , h.b, r. 48.

²⁵²Rêbiwar Fayîq û Herzeleyî, h.g, h.s.

Ji ber wê jî Goran di derbarê çavkanîya Behreyî de dibêje. Hunera helbestê bi serbestî û azadî bi mirovan ve girê dide. Li gorî wî dema helbest bi xweşiktî , bilind û hunerî ji dayîk dibe. Mirov jî dikare bi eşqekî bi rastgoyî di nava deronîya xwede derbixe. Dibêje :

Şîerî ciwanit ewê qurban, şîerî ciwan.

Şîerêk geşe û zerdexene ba be jiyan.

Şîerê çeşnî estêre bicrîwênê

Rûn bê naxî derîyay derûn binwênê (b.p, r. 109)

Yanjî dibêje :

Be ser şîera kesê zale serbest bê.

Berella bê, be areqî eşiq mest bê.

Bo min weha elwe îtir xamoş bim

Ba le maydan win bim û feramoş bim(b.p, r. 109)

Di vê rêzîkê de eşkereye ku armanc tenê nivîsînek ya helbestek tam û xweş wergirtinê ye. Bi temamî li gel hev yekgirtîne. Pernasizm helbestan dur digire ji hemû aliyên din ê jîyanê tenê xweşîkbûn ne be.

2.4. Zivirîna Samanê Folklorî Di Helbestên Goran De :

2.4.1. Helbesta Derwêş Ebdula :

Di vê helbestê de Goran di zivire ji samanê Folklorî ya gelê xwe û şimşala Derwêşê Ebdula gelek pê xweştir û naziktire. (Bithovin) dibêje :

Ewendem bîst le mosîqa xiroşî rohî bêgane

Mîzacî kûrdewarîm têkçû we derwêş ebdûlla

dexîlt bim desa bew lawik û ay ay û heyrane

Şepolî zewqî mîllî pir derûnî mat û çolim ke

Le Bithovin gelê zîyatir be ruhim aşinay wella.

De ey derwêş, sikalayek legel ruhî kilolim ke !

(b.p, r. 112)

Goran ji Derwêş Ebdula re dibêje, Ji şimşalê folklorî zêdetir bandora deronî li ser hebû. Li beramberî sîmfonyakanî bithovin jê re dibêje; bi dengê rihî. Êş şikan û aramîyê bi singê mirovan di bexşîne. Di vir de jî Goran nêzîkî pernasizman dibe. Ewan jî bi hişkî berê xwe dayîne kel ûpelê kevin yên Yunanîyan. Zivirîna goran jî di vir de eşkere û dîyare ji bo folklorî kevin a gelê xwe.

Her wiha divê helbestê de goran gazinda li gelê xwe dike, ji ber ku qedrê huneran nizane. Li gorî wî berhem afrênerekî wekî Derwêş têz û paya wî di nava civaka kurdî de ne cihê giringîyê bû dibêje :

Belê dîyare le naw qewimî besîta qedirî sinetkar
 Weku eksî qemer waye le naw hewzêkî lîxinda.
 Belam textî rufah û tacî hurmet mîlletî huşîyar
 Be ustadê eda wek to le naw şimşalî kun kunde.... (b.p, r. 111)

Ji ber ku li cem Goran Derwêş Ebdula kesekî bi coş û xuroşe. Muzîk û dengê defna wî resentîya civaka kurdî pêve dîyare. Di nav singê kesan û ciwanperestan de perwerdeya ciwanîyê dike. Ji ber wê jî pernasizm heyîna xwe di nava vê helbestê de derdixîne. Goran xwestekên xwe di tiştê de komdike ew jî dema dizivire heskirinê xwe yên bûrî di vê defê de komdike. Li cem xelkê jî ne giring bûye. Pernasizm awirek di van tiştan dawê ku xelkê pişt goh avêtine. Ji ber wê jî helbesta wî diçe nav xana pernasîzman.

2.5. Xweşîkbûna Xwezayê Di Helbestên Goran De :

Xweşîkbûna xwezayê jî wekî xweşîkbûna jinê di helbestên wî de bi bandore. Di helbestên wî de hertim wesfê nazîktîya xwezayê û bihara kurdistanê hatîye dayîn. Bi şêweyekî gelek balkêş wêneyê (Bihar, Zivisatan, Peyîz û Havîna) Kurdistanê kêşaye. "Hezîmanek li cem goranî radîbe bi wênekêşana xwezayê, bivi karîş goran geşe bi formên şîrî didet"²⁵³ Goran erkê ciwanîyê bi xwezayê bexşîye. Her wiha di helbestên xwe de behsa, çîya, newal, dul, kanî, baxçe û gulê Kurdistanê kirîye. Wekî di van helbestên li jêr de derdikevin.

²⁵³Nîhad Camî, Ezmunî şêrkoîy (Xwêndineweyekî sîmolojîye bo ezmunî şîrî şêrko bêkes), G.Karwan, j.213, Hewlêr, 2007, r.15.

2.5.1. Helbesta Beyan :

Goran wekî pernasizmekê hewildaye di çend wêneyê helbestên xweşik de hestên xwe beramberî xwezayê vegotin bike. Di heyîv, sitêrk û asîmanan de xweşikbûnê digire û dibêje :

Ellahu-ekber mela banig dane
 Tarîk û lêlî berî beyane
 Mangî be cêdaw le seferî şew.
 Zerdele tirsî qasipe qasipî kew !
 Estêrey mexrîb wek qetirey emel
 Kizkiz etikête naw befirî ser kel ! (b.p, r. 119)

Di vir de eşkere dibe ku ew helbestên Goran dibêje, qet berjewendîyek yan jî hizrekî îdeolojî a sîyasî tê de dîyar nabin. Tenê ewe di singê kesekî ciwanperest de derdikeve. Ji ber wê jî li gorî Goran ew amêr û babet li gel wî ciwan bû ku sudê wan ne bû dijî tiştên bi sud wekî pernasizman.

2.5.2. Helbesta Dîmenekî Behar :

Goran bixwe perwerdeya xwezayîye. Di dariştina helbestên xwe de sud ji xweza soz û renên rengaw reng wergirtîye. Hemî serdeman helbestên wî bi zindîty maye û dihête naskirin. çunkî “ Helbesta mezin û ciwan jî , her ji wan corên helbestane ku ji hemî serdeman de dihête xwendin û babetên wî jî babeteke zîndî û tejîye ji nîqaşê”²⁵⁴Di dîmenekî bihara rengîn û kesk de wesfê rewşa hewayê bêhna xweş dîlgira biharê dike. Dibêje :

Nesîmî bonxoş, kizebay fênîk wek neway îlham !
 Semay ciwanî perî tebîet dênête encam!
 Qasipe qasipe kew, nexmey çulekew bulbulî dengxoş
 Pîyaley neşe, hetta be rohî berdîş eka noş !
 Wek bigrî be kul dinîyay sermestî qaqay pêkenîn
 Le hemu astê firmêskî kanî germî helqûlîn..... (b.p, r. 138)

²⁵⁴Mohemed Xidir Mewlud, Newzad Refet şairî efrênerî şîrî nwêy kurdî, Weş. Rewşenbîry, Hewlêr, 2008, r.107.

Di vir de wêne bi xwe wesfên xwe dike û şahêdîya xweşîkbûnê dîkin. Ev helbeste jî dure ji amêrên bi sud. Tenê ji bo xweşîkbûn û tam girtinêye wekî bingeha pernasizmane. Eger em bi hurî balê diîn ser Goran dema wesfa xwezayê dike tenê zarevayê (Huner ji bo huner) yan jî (Ciwanî li jêr navê ciwanî) berdest dike û ber çavê me jî dikeve.

2.5.3. Helbesta Bêdarîyek :

Goran di vê helbestê de vê dîyar dike, bandora xwezayê gelek li ser hebû. Eger dengê bilbil jî bi bihîse , wê demê helbestek din a kurdî ji dayîk dibe. Daxwazê ji bilbil dike bi xwîne, ji bo hestên xwe yên xweşîk birijîne. Dibêje:

Ey bulbulî şebeqî şew ! bixwêne.

Hestî (ciwan peristî)m biuirûjêne.

Ba be zebrî mestîm be awazey niwêt.

Wêlî daristan bim katêk ! xelk enwêt !

Eger eşîqî huner, wek to, ey bulbul

Le naw regma legel xwêna bida pil

(b.p, r. 146)

Goran di xwaze deme xelk di xwêdene jî li pey ciwanîyê bigerê û di quncikekê de çêbike. Ev jî her geranle li pey xweşîkbûnê, goran bi pernasizman ve girêdide.

2.5.4. Helbesta Dîmenî Rêgaw Ban î Geşt le Hewraman :

Helbestvan di van helbestan de yek bi yek wesifa cihê arkolojî ya navçeya hewreman dike. “ Kesek ne di wêjeya kurdî belku di wêjeya gelên din de jî nikare wekî goran wesfa ciwanîyê di helbestan de bike. Klêzyo, xelata Nobel a wêjeyê îsal wergirt. Di meydana roman nivîskar û wesfê dîmen û xwezayê de. Goran di meydana helbestan de ji wî ne zêdetir be ne kêmtire jî.”²⁵⁵ Her wekî dibêje :

Komele şaxêk sext û gerdinkeş.
Asmanî şînî girtote baweş
Serpoşî lutkey befrî zor sipî
Be daristan reş na dolî kipî
Cogey awekan tîyaya qetîsmaw
Her eron naken pêçî şax tewaw....(b.p, r. 117)

Ev dîmen ji hestekî nazik derketîne. Di derbarê wê de serkeftina helbestvan destnîşan dike. Ev jî ciwanîye di her tişteki debe. (Xweza yan jî jin) yan di her tişteki din debe. Ev jî hunerekî girînge hemû kesek nikare bi vî awayî wesfê dîmenan bike. Ji ber wê jî Goran wekî Pernasizman hatîye naskirin. Goran her çitişta dîtîye tevî peyva ciwanîyê kirye û helbestên nu afirandîye. Dema em helbesta (Geşt le hewraman) dixwînin em hest dikîn di nava buyerê dene. Ji ber wê jî helbestên wî wekî tabloyekî rengaw reng tê berçavê me.

²⁵⁵ Îtrafekey Şêrko Bêkes, Rizgar Hesên, internet, (Kurdistan net,info) Siwêd, 2009 .

BEŞASÊYEM GORAN ÛRÊBAZASEMBOLÎZMÊ

MIJARA YEKEM :RÊBAZASEMBOLÎZMÊ

Livir de derbarê serheldana vi rêbazi taybetmendi u cor u zaraveyan dixine ber bas:

1. Sîmbulîzm Beş û Zarevayên Wê :

Rêbazekî wêjeyîye, piştî rêbaza pernasîzmê derketîye. Di dawîya Sedsala 19 an de li Firansa derketîye. Zarevayê sembolîzmê di zivire ser “Sedsala kevin a Yunana kevin, ji bilî vê jî dîrokekî kevin û aloz hebû.”²⁵⁶Piştî wê komek ji nivîskar û helbestvanan çend berhem belvakirin. Ji bo damezirandina dibistanekî binavê Sembolîzim. Ev zarevaye di wêje û hunerê de belvabûye, li giştî welatên cîhanê jî. “ Di derora salên 1880 an de çend ciwanek, ji wan Sîtvan, Malarmî, Bodlêr û hinek nivîskarên din jî ku pêşî rolê wan di damezirandina pernasîzmê de jî hebûnigayên berfirehyên wan bilind tir ji çarçova pernasê de helfiry berve cîhaneka berfireh tir ew jî cihana veşartîyên ruhê bû.”²⁵⁷ Sembolîzm tê wateya(Symbolism), yan jî di zimanê erebî de tê wateya (Remzîye). wata Remiz, hêma û Sembol.“Di ferhenga zaravên rewşenbîry bi manaya ceveng xwazî tê.”²⁵⁸ Bingeha herî serekî a sembolîzman (Hêma û Remiz) bûn. Di rêya hêmayê de hunerên xweşik û bilind di helbestande pêşkêş dikirin. Xeyal, hizir û hestên xwe yên veşartî di rêya remiz û hêmayê de dîyar dikirin. Ev rêbaza wêjeyî “dijî rêbaza Rîyalîzim, Naturalîzm, Formalîstî Pernasîzmêye.”²⁵⁹ Sembolîzim yan jî hêmagerî “ Beşeke ji hêmayê ji bo destnîşankirina çend wateyên taybet di rastî û bawerîyan de.”²⁶⁰ Sembolîstan ji rastîyê di revîn û li dijî disekinîn. Ji ber wêjî di rêya hêmayan de destnîşan dikirin. Ev dibistane “ pişt bi îha ve girêdide. Bi şeweyekî ne zindî ji alîyê deronnan ve bi wate dikirin. Her wiha ew alîyên ziman nikarin raste rast

²⁵⁶Rînye Wîlik, Mefahîm neqdiye, Wer. Dr Mihemed Esfur, Al-kwet, 1987, r, 217.

²⁵⁷Pîrbal, Qutabxane Edebîyekan, r, 141.

²⁵⁸Osman Yunis Eytuty, Ferhenga Zaravên Rewşenbîry, Weş. Yekem, Weş. Azadî, Dihok, 2007, r. 49.

²⁵⁹Osman Yunis Eytuty, h.b, h.r.

²⁶⁰Mihemed Çîya, Ferhengî Felsefî, Weş. Duwem, 2004, r, 170.

bêjin.”²⁶¹ Hêma tê şîrovekirin ku pêktê ji “ Firman dinava heman cora sîstemê de derdikeve holê.”²⁶²

Sembolîst ji şewayê zindîtî ji helbestan dur dikevin. Tenê girîngî bi remz û hêmayê dayîne. “ Ev bi şeweyekî eşkere xwe ji zindîtîya helbestan dur digirin, hizir û fikrên xwe di rêya destnîşankirina hêmayan de dîyar dikin.”²⁶³ Hizir, fikir û têgihştina li cem sebolîstan de û xelkê asayî cîyawaze. Ji ber wê jî Bodlêr di vê derbarê de dibêje “Cîhan destpêka hêma û destnîşankirinê ye. Ew rastîya veşartî a li cem xelkê asayî heyî di rêya şîrovê û destnîşankirina hêmayê re hest dikin.”²⁶⁴ Hêma peywendiyêkî bi hêz peyda dike di navabera xwendevan û mijarê de. Sembolîzm “ Dibistanekî nûye li ser du astan kar dike. Yekem: Hewildana gehîştina ezmûna helbestan di wî aliyê nazik yê xwe de. Duwem: Piştgirîya bi çarçuveya hunera serbixwe a nerm. Dikare ezmûna helbestên xwe bi wate bike. Rewşa wê jî bi gehîne xwêner, bi çêkirina kêşandina meqletîsê di rêya helbestvan de ji bo wan di kêşe. wekî dirêya muzîk û teşkîlê de çêdibe.”²⁶⁵ Con Moryas wekî damezrênerê vê dibistanê tê nasîn dibêje : “ Ev rêbaze nûye, dijî zanîst û axaftina zindî raport, hest dil, wesf, babeta sekinîye. Helbest remza berbi hizrê vediçe ruyekî hestî berde dibe.”²⁶⁶

Rêçkeya sebolîstan hêdî hêdî li hemû welatên cîhanê wekî beşekî ya wêjeyê, helbestvanên sebolîzmê xwe ragehandin. Di rêya manofestu belavkirinê wêjeyî di govar û rojnameyan de. Ji ber vê jî ev dibistane gehîştîye payek bilind. “ Rêbaza sebolîzmê di sala 1980 an de gehîştîye paya bilindû çalak. Rêzek ji helbestvanan di sala 1885 an de ketin peyrewkirina sê pişeyên mezin ê sebolîzmê de. Gelek hi van helbestvanan ne Firansî bûn. Mînak : Çend helbestvanên mezin ê Belcîkî di nava Sebolîstan de bû. Ji wan : Îmêl Virharîn, Morîs Metre Lîng, Her wiha çend helbestvanên din yê Emerîkî Rusî, û Yunanî jî di nav wan de bû. Bi şeweyekî giştî sebolîzmê cîhan girt dinava xwe.”²⁶⁷

²⁶¹Newzad Ehmed Eswed, Ferhengî Zareway Edebî û Rexneyî, Weş. bînayî, Silêmanî,2011, r. 208.

²⁶²M.H, Ebramiz, Tîyore Modernekanî Edeb û Rexne, Wer. Osaman Ehmed, Weş. Jîr, Silêmanî, 2009,155.

²⁶³Museb Edihem, Qutabxane Edebîyekan, G. Raman, J. 185, Hewlêr,2012, r.107

²⁶⁴Reza Seyîd Hisênî, h,b ,r 156-157.

²⁶⁵Ebdu - elrezaq el-esfer, h.b, r.85.

²⁶⁶Kemal Meruf, Remz le Şiirekanî Şêrko Bêkes da,G. Raman, j.101 , Hewlêr,2005,r. 69.

²⁶⁷Reza Seyîd Hisênî, h.b ,r.162.

2. Taybetmendîyên Sembolîzmê :

Ev rêbaze jî wekî rêbazên din ê wêjeyî, xwedîyê çend zagon, rêsa û taybetmendîyane. Evên li jêr girîngtirîn bingeha taybetmendîyên Sembolîzmên.

1- Sembolîzman, hizir û bawerî û felsefeyek taybet a xwe hebûn. “Di alîyê fikrîde sembolîzm bi saya bandora felsefeya ayîdyalîzmê de çêbû, ji metafîzîkê îlham wergirtîye. Di sala 1880 an de li firansa çêbû.”²⁶⁸ Di cîhana sembolîstan de rastî ne girîng bû. Ji ber ku “ Sembolîstan bawerî bi aqilê navxweyî û neagahîyê hebû. Li gorî wan rastî nikare armanca wan dîyar bike û xwestekên wan bi cih bîne. Ji ber wêjî piştevanîya cîhanekî ayîdyay xeyal û wênyan dikir.”²⁶⁹ Sembolîst di alîyê felsefeyê de Ayîdyalist bûn. Xweza di alîyê wan de xeyalekî livî bû. Herwiha li gorî nêrîna wan rastîya tiştan heman ew tiştêkê em bi hestên xwe di derona xwede çêdikin. Ev jî buye armanca sembolîstan. “ Xwe dibir di wê şewazê de ku peywendî bi hurkarîyêkî mantiqî û hizrî (Ebistirakit) hebû.”²⁷⁰

2- Lehîstin û cih goherîhan hestên mirovan di helbestan de cihê goherîna hestan dîtnê bi bîstinê ve girê dide. Hesta bêhnkirin û tamkirinê ketîye ber hestên din. “ Zimanê hestan li cem sembolîstan pişt bi wêneyên xwe ve girê dide. Hemû corên wan ji bo çend wate û gûzarişt kirinê ye li corên deng û reng û hesta dest lêdanê û bizûtin û bihn û tam kirinê.”²⁷¹ Erk û karê hestê mirovan bihestek din de sipartîye. Ji bilî em digoherîn “cih goherîna hestan û wezîfeya hestan li gel hevdû, di zimanê erebî de jêre tê gotin (Terasil elhewas) wate, hestên (tam, xwarin, destlêdan, gohdarkirin û dîtin). Di karê de cihê hevdû digirin. Mînak: Dema helbestvanek dibêje : Bi gohê xwe ez te dibînin, yan dibêje bi çavê xwe te maç dikim.”²⁷² Sembolîstan hêmayê di destnîşankirina hestan de dîyar dikin. Ji ber wê jî hestên li cem xwêner bi temawî û mij girî derketîye.

3- Mijgirtina di helbestê de, helbestvanên dinav vê rêbaza wêjeyî de di nava helbestan de kar li ser mijê dikirin. Li gorî wan pêwîste helbeste tejî be ji hêmayan. Berevajîya helbestên eşkere û rast li cem wan ne pesend bû. “ Mij rêgezêkî herî serekî a helbestên hêmagerîye. Jiber ku mij ayîdyal,ciwanî û xwenê bi helbestê di beşxîne. Berevajî vê helbestên eşkere û rast tiştênwekî xweşiktî, ayîdyal û balkêşî û xwenê di

²⁶⁸Reza Seyîd Hisênî, h.b ,r. 162.

²⁶⁹Newzad Ehmed Eswed, h.b, r 210.

²⁷⁰Ebdulrezaq, Alasfr, h.b,r. 86.

²⁷¹Ebdulrezaq, Alasfr, h.b, r. 86-88.

²⁷²Newzad Ehmed Eswed, h.b, r. 211.

kuje.”²⁷³ Bi hemû şeweyekê xweşiktî, sitatîkiya helbestê di hêma û mija peyvan de dibîne. Tenê “Jimareyek sembolîstan li ser hemûyan (Malarmye) pîvana vê yasayê dikir peyv û destewanje yên ku bi kar dianî tenê bi xwe jê fêmdikirn û şîrove dikirin. andirîye cîd ji despêka berhemên xwe de bi navê (Paludes) dibêje : Pêşîya ku ez berhema xwe jibo xelkê şîrove bikim, Ez dixwazim xelk vê berhemê ji bo min şîrove bikin.”²⁷⁴

4- Wêneyê helbestan û mûzîka helbestan di aliyê wan de girîngîyek û taybetmendîyek a xwe heye. “ Çavdêrîkirina muzîk û helbestê,mûzîk peyva helbestê ye.Sud wergirtina ji dengê veşartî ê kesan, hev awazbûna dengê giştî rêzikên helbestê deye.”²⁷⁵ Peyv û peyv karî di nava helbestên sembolîstan de pişt bi hêmayê ve girêdide. Em dikarin bêjin,wezin, qafye ,muzik û wêneyen helbstên wan pir bû ji wateyên nedîyar û ruyê wê di şewazê helbestên wan de dîyar bû. “ Li gorî bawerîya sembolîstan ji bo karanîna hêmayê wêne û ritim du amêrên gelek girîngîn. di reya hêma û îhayan dikare haletên agahî û digel hendek tem û mijî ve jibo nav helbestan tèn vegûhestin. Di rêya ritim û muzîka helbestan de dikare wateyê bidîn sing û deronî û xwestekên wan ê veşartî.”²⁷⁶

Li cem sembolîstan “wezin û qafîye hêdî hêdî hat şikandin. Lê belê tenê li cem hinek kesan ji derveyî helbstên, yekemîn car di heman demê de Helbesta Azad (Vers Liber) li cem (Rambo di sala 1886 an de derket .”²⁷⁷Sedema bikar anîna helbesta azad eve ku “ Dabeş kirina wan peyv û morfîmane ku bi şewazeka cuda li ser ruyên rupelan daye. li cem kilasîkê ruyên reş u sipî yê rupelan bi şewazeka wek hev hatibuye beş kirin.”²⁷⁸ Her wiha zimanê sembolîstan alîkarîyek bû ji bo fêmkirina wan. Ji ber wê jî dixwestin ev zimane şibandina wê nemîne. Helbestan bi zimaneke din ê xweşik binivîsin. Ji bo vê armancê jî “Bangeşeya zimaneke nû û ne asayî ji bo helbestan dikirn. Ji bo ku ziman ji şibandina wezin û qafyeya kevin rizgar bibe. Li gorî ramanên wan ziman pêk tê ji çend hêmayekê, hem ji bo cîhana ji derve hem jî ji bo cîhana deronî.”²⁷⁹

²⁷³Newzad Ehmed Eswed, h.b, r. 211.

²⁷⁴Reza Seyîd Hisênî, h.b,r, 164.

²⁷⁵Ebdulrezaq, Alasfr, h.b, r, 86-88.

²⁷⁶Newzad Ehmed Eswed, h.b, r.210-211.

²⁷⁷Pîrbal, Qutabxane Edebîyekan, r. 146.

²⁷⁸Perwîn Ebdulla , Şîrî wêneyî, G. Şîr, j. 2, Hewlêr, 2006, r. 54.

²⁷⁹Newzad Ehmed Eswed, h.b, r.211-212.

5- Xweza li cem wan pire ji wênayên hêmayî, remiz û sembolî. Helbestvan dikare di wê xwezaya xweşik de hêmayên cuda cuda bidest bixe. Xweza li cem wan pire ji rihê mirovatî. Ew wênayên xweşik yê xwezayê mirov giringîyekê didê tê bi wateya rihê veşartî yê xwe pê eşkere dike. “Helbestvanê sembolîzmê (Brû Nêtîer), di derbarê peywendîya rihê mirovan bi xwezayê re dibêje : Her dîmenek rewşek a rihîye. Bi vê axaftinê re vê eşkere dike ku hunermendên semolîzmê pêwîste rewşa rihî a di nava dîmenê xweza û jîyanê de bidest bixe.”²⁸⁰ Li cem wan xweza girîngîyek taybeta xwe heye. “ Xweza û heyînên xwezayê pir bereket trin amêrên hêmayêna, helbesvanên xweza perwer piraniya kerestên hêmayê ji xwezayê çê dikin . ”²⁸¹

6- Xewin û xeyal bi eşkereyî di helbestên semolîstan de bi bandor bûye û giringî dayîne. Bi wî corî di rêya xwin û xeyalan re dikarin bi gehin berhemên hunerîyên xweşik ku pirin ji hêma û remiz. “ Pozîtîvîzm û Rîyalîzman di xwestin xwin û xeyalê ji wêjeyê derbixin. Dubare di rêya sembolîzmê ve hatîye di nava wêjeyê de.”²⁸² Bi vî corî re sembolîstan girîngî bi xwin û xeyalê didan. “ Ji ber ku çalekîyên nestên mirovan bi wate dikir. Helbestvan li cem Firoîd ew keseye ku dizane çawe xwin û xeyalê di berhemên ciwan ê hunerî de dibite sedemek bo têrkirina hezên kip kirayî. Mirov û hunerê li gel xwê bi tamamî nêzîk dike.”²⁸³ Li gorî bawerîya wan xweşikbûn û sitatîka helbestê di rêya xwin, xweyal û hest mirovan de çêdibe. Ji ber wê di helbestên remzî de “ Xweşikbûn armanca herî dawî a helbestê ye. Tenê rêya gehîştina xweşikbûnê pêktê ji xeyal, îha, xwin û wateyên hêma û wênayên hêmayê.”²⁸⁴ Ji ber wê jî em dikarin bêjin sembolîstan di xwestin herin cîhana rehayî. Cîhana xeyal, karkirin, rewşa deronîya tarî , mij û hestên nasîk û berfireh.

7- Yekek din ji bingeh û taybetmendîyên sembolîzmê ewe kû nabe di helbestê de peyamên sîyasî, refarî, ayînî û civakî hebe. Armanca helbestên ne ewe ku behsa van babetan bike. Belku wate û armanca helbestê di nava rihê xwe deye. Jiber wê jî divê derbarê de (Bodlêr) dibêje : “ Armanca helbestgeranê ne li pey rastîyê ye. Belku armanca wê helbesta dinava xwe deye.”²⁸⁵

²⁸⁰Pirbal, Qutabxane Edebîyekan, r. 145.

²⁸¹Fazil Medcîd, h.b,r.169.

²⁸²Reza Seyîd Hisên, h.b, r.163.

²⁸³Kemal Meruf, h.g, r.69.

²⁸⁴Newzad Ehmed Eswed, h.b, r. 210.

²⁸⁵pirbal, Qutabxane Edebîyekan, r. 147.

Her wiha sembolîstan di gotin : “ Helbest ne nîgar kêşe. Belku livînekî a rewşa rihîye, meydana helbestê di wê de destpê dike ku peywendîya wê li gel rastîyan birîbe. Ev meydan jî heta dawî berdewam dibe.”²⁸⁶

3. Qonaxên Sembolîzmê : ²⁸⁷

Çend qonaxên cuda hane ku sembolist bivan qonaxan de çûyne:

3.1.Qonaxa Yekem : Qonaxa destpêkê yan jî qonaxa Bodlêr (1867)

Bodlêr yek ji zanayên her du qonaxên pernasîzm û sembolîzmê ye. Li ser asta pozîftîf û negatîfe. Ew di xwezayê de gelek kur naçe wekî romansîyan jî di sozdayînê de zêde nake. Bi şêweyekî gelek kur jî agahdarê şêwe û waza muzîkê bûye. Wekî heman şêweyê pernasîzan. “ Di helbestên Bodlêr de muzîkekî bilind heye,wêneyên xweşik yên rengan reng jî tê de heye ji bilî rûyên hestîyar yên derûnî.”²⁸⁸

3.2.Qonaxa Duwem : Qonaxa berbi gehîştina lutkeya bilind ve.

1- Stîvan Malarmî (1842-1898) Malarmî di qonaxa sembolîzmê de bergirê rastîyê bûye. Di alîyê xwestekan de jî xwedîyê taybetmendîyan bû.

2- Pol Vêrlîn (1844- 1896) binav û deng di sala 1881 an de destpêkir. Dema di rojnamegerîyê dest bi karkir, diçû kolana latîn û komek helbestvan li derdora wî komdibûn. Ji wîre balkêş dihat... Di destpêkê de pernas bû lê belê helbestên wî herî zêde wekî yên Goran bû. Herî zêde helbestên wî serbixwe bûn û bi çirêbazekê ve ne girêdayî bû. Tenê bû sembolek û bû damezirênerê sembolîzmê , bêyî ku ji vê armacê û şîyarbûnê agahdar be.

3- Arser Rîmbaw (1854-1891) her di 15 salîya xwe de dest bi nivîsîna helbestan kirîye. Di pêşengê helbestvana de sembolek bû. yan jî dinava wan kesên bandora wan li ser bizotneweya lawan bû. Helbestên wan di nava sadeyî, alozî û asanîde hatîye naskirin.

²⁸⁶ Reza Seyîd Hisênî, h.b, r.165.

²⁸⁷Ebdulrezaq, Alasfr, h.b, r.88-93.

²⁸⁸Heme Kerîm Arîf, Nawdaranî Edeb, Weş. duyem, Weş. Hemdî, Silêmanî, 2012, r. 286.

3.3.Qonaxa Sêyem : Qonaxa Piştî dawîya helbestvanan

di dawîya Sedsala 19 an û destpêka sedla 20 an de dibistana Sembolê goherîn bi ser de hat û berbi lêjbûnê ve çû. Dema helbestvanên ciwan li derora malarmî kombûn zîrekî û jîrîya wan nebû. Ji ber wê heya asta zêde çûyînê li ser rêya wî diçûn. Ji ber ku xerîb bûna wan ji nermîya helbestê û rizgar bûn ji peywendîyên giran, helbestan ji awaz û wezin û qafyeyê rizgar kirin. Ji wan helbestvanan jî wekî me li jêr dîyar kirîne: ²⁸⁹

- 1- Elbert Saman (1858-1900)
- 2- Henrî Du Rînîn (1864-1936)
- 3- Firansîs Ceymis (1868-1938)
- 4- Pol Valerî (1871-1945)

4. Dîyartirîn kesayetên vê dibistanê :

Dîyartirîn kesayetên simbolîzmê li Firansayê, cihê ji dayîkbûna simbolîzmêye. Pêktên ji ²⁹⁰

- 1- Bodlêr û Xwendevanê Rembo
- 2- Pol Valêrî
- 3- Li Elmanya Rîlkew Sîtîvan Corc
- 4- Li Emerîka Yîmî Loîl
- 5- Li Bêrîtanya Oskar Wayeld

Herwiha nivîskarên din yê simbolîzmê ev bûn. “ Marsîl Prost (Firansa) Morîs Metarlîng û îmêl Verharin (Siwîsre) , Adgar Alan Po (Emerîka) , Wîlayam Betlerîtis (îrlanda) , Rîlke (Elmanya) Eliksandir Blok (Rusya) Entiwan Maçador û Robîn Daryo (îspanya).”²⁹¹

²⁸⁹Ebdulbasit Bedir, Mezahib eledeb elxerbî, Weş. Dar elşuaea, elkwêt, 1995. r. 140 .

²⁹⁰Mihemed fituh ahmed, el-remiz wel-remziye fi el-şîr el-muasir, Weş. duyem. Weş. dar el-mearif, el-qahîre, 1978, r. 48.

²⁹¹Pîrbal, Qotabxane Edebîyekan, r.154.

5. Hizir û Bawerîyên Sembolîzmê :

Ev dibistane komêk hizir û bawerîyên taybet yê xwe hene. Bi corekê her kesek bi xwaze helbestekê binivîse, yan jî bi çer ser rêbazên vê dibistanê, pêwîste li gorî rê resim û pîrensîbên wan biçer. Di vir de emê girîngtirîn hizir û bawerîyên Sembolîzmê eşkere bikin:

1- Yek ji hizir û bawerîyên girîng yê sembolîzmê durketina ji rastî û pîrsgirêkan bû. Belku di beramberî wê de berbi xeyalê ve diçûn . “ Durketina ji cîhana rastî, bi hemû pîrsgirêkên civakî û siyasî, berbi cîhana xeyal ve çûyîn. Bi corekî sembolîzm wateya aqil û hestên sozdarîne.”²⁹² Her wiha semolîst dibêjin : “ Heta tu dikarî, pêwîste tu ji rastîya hişkî durbikevî. Rastîyekî eşkere çêbikî.”²⁹³

2- Sembolîst hertim li pey xeyalê de digerin. Hemû demê daxwaza cîhanekî xeyalî dikin û li pey digerin. “Li cem sembolîstan, mirov nêçîra çend hêzekî ne diyar û şûme. Ji ber wê pêwîste ev rewşa mirinê û çarenivîsa xwe, ji corekî xwin û Efsaneyan eşkere bikî.”²⁹⁴ Li pey cîhanekî bê wêne û nediyar valetî û rih di gere. Hizir û bawerîya olî ji bo wan vedigerîne. Ji ber wê jî sembolîstan xwenê xwe ji derveyî cîhana hest xwenên bi tirsde çêdikin.

3- Bikaranîna zarevayê cuda û kêr . “Wergirtina şewaza wateya nû, piştê jî bikaranîna zarevayê xwezayî wekî zarevayekî avabûn, destnîşankirina nav çûna xwînî ya roj hest kirin bi nemayîna tiştêkî.”²⁹⁵

4- Têkdan û ji rê derketina qalibên wezin û qafyeyê, Di aliyê sembolîstan de wezin û serwa rê li pêşîya gotina helbestên bilind û xweşik digire. Ji bo vê armancê “Daxwazd dikirinber bi helbestên azad biçin. Berdewambûna li ser wezin û helbestên azad, bi armanca hev ahengbûnekî gel muzîkê ye.”²⁹⁶ Ji bo yekemîn car sembolîstan karîne helbestên azad bînin di nava wêjeyê de. Bi awayekî azad û serbixwe, lehistinê bipeyvan bikin. Li gorî wan “ Helbest dema azad be û bi azad tê nivîsandin ji destê qafyeya çavlêkirinê rizgar dibe. Peyva giring a bingehîn li cem Malarmê û Rembom û Bodlêr peyda dike.”²⁹⁷

²⁹²Mihemed fituh ahmed, h.b, r. 48 .

²⁹³Pîrbal, Qutabxane Edebîyekan, r. 151.

²⁹⁴Pîrbal, h.b, r.153 - 154.

²⁹⁵Mihemed fituh ahmed, h.b, r. 52.

²⁹⁶Mihemed fituh ahmed, h.b, h.r.

²⁹⁷Pîrbal, Qutabxane Edebîyekan, r.153.

6. Kok û Hizir û Bawerîya Sembolîzmê :

Li gor zanyarîyên çavkanîya koka hizir û bawerîya vê dibistanê, di zivire ser rêbaza “Mînak : Yan (Almisil) a Eflaton. Rêbaza wê li ser bingeha rastîyê damezirand. Rêbaza wê wateyekê di hinek rastîyên mînakî dîke û dibêje : Aqlilê dîyar û hişyar ê mirovan, aqilekî xwedî sinore. Mirov jî aqilekî ne hişyarî heye ku ji wî aqlî ne berfirehtire.”²⁹⁸Di dawîya sedsala 19 an de çend sedemekî girêdayî civakî û rewşenbîrî kombûn ji bo ji dayîkbûna sembolîzmê. Li ser destê Bodlêr û çend nivîskarên din. Ji wan sedeman :²⁹⁹

- 1- Faktorên Girêdayî : Xwe di hurbûna aborîya mirovan de dibîne.
- 2- Faktorên Civakî : Xwe di şerê hişk yê civakî ku di nava hinek nivîskar hizrêmenda de dibînin û xwe di azadîya serbixwe, reftarê berdayî de dibîne.
- 3- Faktorê Hunerî : Ev ji ber wê bawerîya ku li gorî wan ziman sekinîye di wateyê de di helbestên hur yên wan de. Ji ber wê qet nemaye ji xweyî sembolîzmê.

Sembolîzma Hevçerx: Fikrê ewrupî di navenda sedsala 19 an de dijî ew pêşkêşîya felsefeya rast a heyînên kevin bû di rêya aqil û mantiq û zanîst da şîrove dikir. Lê belê ew pêşkêşîye li dijî maye û sekinî di çareserkirina wan pirsgerêkan de. Hilweşîna sembola û eşkerikirina veşartî. Ji ber wê “Komek ji wan hizirmendan li gorî wan veşartîyek heye hîna ne hatîye zanîn. Cîhanek heye ronahîya zanîst û mantiq çênêkirîye. Ji bo itrfakirina sekinîna aqil danîye. Ji bo bigehe wê zanyarîya tamam, gehîştina bi wê çênêkerê. Ev jî bûye sedemê pêşkêşîyek nû jibo fikrên di Ewropa de. Ew jî berbi bingeha ne aghîyê ve çû.”³⁰⁰Ji ber wê sembolîzm di karanînê de tevîhev bûye. “ Her nivîskarek li gorî xwesteka xwe bi kartîne. Ev jî bûye sedemê ne kare pênaseyekî kom ji bo sembolîzmê bê danîn. ”³⁰¹

²⁹⁸Mihemed fituh ahmed, h.b, r. 45.

²⁹⁹Mihemed fituh ahmed, h.b, r. 55.

³⁰⁰Nur Selman, Mealim el-rmzîye Fî el-şîr el-sowfî el-erbî, Beyrut, 1954,r. 47.

³⁰¹Fezîle madî, h.b, r. 246.

7. Alîyên Baş û Xirap Yên Vê Dibistanê :

Alîyê baş yê vê rêbazê ewe ku, helbestvan rizgar dike ji girêdana wezin û qafyeyê. Helbestvan bi azadî peyvan li gorî dilê xwe hildibijêre. Dikare bi xwesteka xwe lehîstîkê bi peyvan bike. Li kuderê armanc bû bêyî ku bi zivire ser wezin û qafyeyê. Ev rêbaze cara destpêkê karîye helbestên azad derbixîne. Helbestên azad jî pêktên ji “Çend parçe beytekî ne wezna ne yeksan. Di vê helbestê de yeketîya kalib û formê nîne. Yeketîya helbestê bi wan yeketîya fikir, xeyal û wêneya dîyar dike ku di helbestê dehene. Kurtî û dirêjîya beytan jî bende bi rastîya naveroka wan beytan.”³⁰²

Alîyê xşrapî yê vê rêbazê : Ew rexneyên pêşkêşî vê rêbazê kirin pêtên ji “Tevlîhevîya helbestê bi alîyê deronî û kêrberhemî dijwarî û veşartinekî gelek dîkin. Ji bilî dubarekîrîna hinek wajeyên wateyan. Li gel xasyetekî hevbeş di kok û hebûnan de, wekî reşeba bêhna şîn . Xirabîyekî din dîyarkirîna helbestêye bi corek ji muzîkê.”³⁰³

Ew dibistanên li piştî dibistana sembolîzmê derketin pêk dihatin ji :³⁰⁴

- 1- Suryalîzim.
- 2- Împîrîşîponîzim.
- 3- Anrşîzim
- 4- Dadîzim
- 5- Vorîzim
- 6- Fotorîzim
- 7- Natoralîzim
- 8- Hîyumanîzim

³⁰²Reza Seyîd Hisên, h.b, r.166.

³⁰³ Kemal Meruf, h.g, r. 69-70.

³⁰⁴Museb Edihem, h.b, r. 107 .

MIJARA DUWEM:SEMBOL (REMIZ) DI HELBESTÊN GORAN DE

Livir de em behsa zaraveyên vê rêbazi u gelek mijarên taybet bivî rêbazi dikin, goran jî weki helbestvanên di gelek corên sembola di helbestên xwe de bikar anine:

1. Zarevayê Hêma :

Bê guman di kevin de her axaftinek giringba, bi çend zarevayan pênase jêre dikirin. Da ku girîngîya vî zarevayî pê were naskirin. Hêma jî yek ji wan zarevaya ne ku dîrokek dur û dirêj heye. Cihekî giring di nava mijarên wêjeyî de girtîye. Ji qonzxekê ji bo qonaxekdin, ji xwendevanekê ji bo xwendevanek din û ji serdemekê ta serdema din wateyên hêmayê hatîne kirin û fêmkirin.

Zarevayê Hêman “ Her di kevin de dîrokê van tiştên kumirov ne karîye bi zamanekê bêje, bi şêweyekî ne raste rast hêma jêre kirîye. Hêma ew ku tiştêkî yan jî wateyekê destnîşan dike. Di rêyekî de peywendîya di navbera remiz heyînên din yê cihgir çî di helbest û çîrokê de û berhemên din yê hunerî debe.”³⁰⁵

Her wiha remiz “ Nîşanekê danîye ji bo wateyek di tiştêkî yan jî hizrekê de. Ji wan jî hêmaya jimarên, hêmaya cebirîyan di beramberî rastîyan de tê.”³⁰⁶ Eger em dinava demê burî de geranekê bikin, goh bidîn xwestekên mirovan emê bibînin, her yekê ji bo deronîya xwe remzekî kirîye Çirayekî ji bo ronî kirina wan heyînên neşirîn yê di tarîyê de çêdibin. Bi vî rengî hêma “ Wêne, tişt yan jî çêkerekî di wateyekî debe di rastîya wayeya xwe de ye.”³⁰⁷ Di hemû serdemekê de tirsek di ber rewşenbîrîyê de hebû. Ji ber wê jî wan nekarîne pirsgirêkan bi şêweyekî raste rast bêjin. Piştevanîya bi karanîna remzê kirinê, ka ev pirsgirêk çî kesîbe yan jî civakî be bi şêweyekî di çîrok yan jî helbestan de gofîne. “ Remiz di sê alîyan de derdikeve xwestina qesîdeya de neşo nima dike. Wergerandina babetekî sade ji bo babetekî remzî. Goherîna navê (Common Noun) ji bo navê taybet yê (Proper Noun) dîryar dibe.”³⁰⁸ Hêma “ Bi şêweyekî ew tiştên hestpê dikirin yan jî hest pê nayê kirine. Bişêweyekî hur û cuda bê sînor cîyeweze li

³⁰⁵Kemal Meruf, h.g, r. 68.

³⁰⁶Mihemed Çîya, h,b, r. 170.

³⁰⁷Lê Morgan û Ewanî tir, Binemakanî Rexneyî Edebî, Wer. Samal Ehmedî, Weş. Rojhelat, Hewlêr,2014, r,510.

³⁰⁸Malkim biradbirî û Cêmis Makfarlin, Modêrnizm, Wer. Behzad Hewêzî, Weş. yekem, Weş. Rojhelat, Hewlêr, 2008, r,219.

pişt xeyalê wêjeyê ye. Xwendevan jî cuda fêmdikin û li pey rewşenbîrî û hestên xwene.”³⁰⁹Bi vî awayî di helbestan de girîngîyek zêde ji bo remzê hatîye dayîn.

Helbestvan herî zê de bi remzê wêneyên helbestên xwe dewlemend kirîne. Ji bo ku babetên wan zêdetir balkêşbin û alîyê wan yê hunerî jî bilind be. Peyamên xwe jî bi şêweyekî bi gehîne xwendevanan. Ji ber wêjî remiz (Sembol) di helbestên nû da gelek bi kartên. Bêyî remzê helbest biharê ciwanî û sitatîkîya xwe ji dest dide. Remiz bi şêweyekî giştî du zareva heye :³¹⁰

- 1- Anîna tiştêkî di cihê tiştêkî din yan jî ihad ji bo tiştêkî din dike.
- 2- Remiz di du tiştan de kar dike yek eşkereye ya din jî veşartîye.

Hêma “Zarevayekî gelek dîyare di nava wan alîyên ji bodanîne dizivire û digêre. Hêma jî yek ji wan zarevayan ne ku di hemû zarevayên din de pesand kirîye. Sedemê pesendkirina wê jî di zivire ji bo : Hêma ne zarevayekî xerîbe li cem kurdan, bi şêweyekî berfireh ji alîyê rexnegirên kurd ve bi karhatîye. Qet tevlihevîyekê jî çênake wekî gelek caran hêma çêdike. Bi taybetî jî li gel îşaret 'û nîşanê.”³¹¹Her wisa jî“Hêma coreke di peywendîya di navbera singê helbestvan û derdora wî. Di rêya xwestekê de nayê heîskirin. Lê belê bi rêya xeyal ve tê girêdan. Helbestvan bi rêya hêmayê li pey tiştên veşartî di gere.”³¹² Di vê pênaseyê de ev ji bo me eşkere dibe ku , ya ku di nava helbestvan û derdor de dibe pir hêmaye. Wateye hêmayê jî pira gehîştina helbestvan û derdore. Nikare xwestekên xwe bi hêma bike. Belku xeyalê hêza wê şikandîye, helbestvan di xwaze di rêya hêmayê de behsa tiştên veşartî bike. Zimanê asayî jî nikare bêje . “Hêma kar li ser zimanê helbest û zimanê helbestvan bi kar tîne dike. Pêwîste zimanekî bilind , pir wate û berfireh hebe. Wisan li xwendekar bike girîngîya deronîya hişk bêxîne û bi gehe wê raseyê rastîyan û tamê werbigire.”³¹³ Bi karanîna zimanekî bilind di çarçuveya hêmayê de tê dîtîn. Ev jî wisan li xwendevan dike ji wateya tiştan fêmneke. Ji bo ku xwendevan ji wateya tiştan fêm bike pêwîste here nav naveroka tiştan, da ku bi gehe wateyekî rast. Ji ber ku her tiştê ku westan tê de hebe bêgoman tama wê baştire. Wisan li xwendevan dike her di çarçuveya tiştan de bimîne.

³⁰⁹Imad Weysî Xalid, Çeveng Di Hozana Rîyalîsta Kurdî da devera behdînan 1970 - 1991 ,Weş. Wezarefî Perwerde, Hewlêr, 2004, r. 80 .

³¹⁰Aso Omer Mustefa, h.b, r. 164 .

³¹¹Pexşan Sabîr Hemed, Remiz Le Şîrî Hawçerxî Kurdî Kurmancî xwarû Kurdistanî Îraq (1970 - 1991), Weş. yekem, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r, 5-9.

³¹²Erselan Bayîz, Sîmay Şîrî Kurdî Diway Raperîn, Weş. Serdem, Silêmanî, 2003,r, 145.

³¹³Perêz Sabîr,Rexney Edebî Kurdî û Meseley Niwê Kirdnewey Şîrî, Weş. Yekem, 2006, r, 579.

Hêma pêktê ji “ ji lêvê dengêkî hêdî derketî re : wate, livandina lêvê bi gotinên ne fêmkirin yan jî îşareta lêvê. Her wiha gotinên remiz bi nişana îşaret, çav biro dev û lêv”³¹⁴ Li jêr eşkerekirina vê pênaseyê de ev ji bo me dîyar dibe ; mirov ji bo gotinê hinek zar û ziman bi lebetên xwe yê laş bikartîne wekî, çav, biro, dev û lêv. Ev jî jêre tê gotin remiz. Hinek caran tirs wisan mirov dike mirov bi vî zarî gotinên xwe dibêje. Ev axaftinane jî bi şeweyekî kêmtê dîtî. Ev denge jî komek wate dinav xwe de digire bi rêya livîna dev çêdibe.

2. Dîroka Bi Karanîna Hêmayê

Remiz corekî gelek kevne di axaftinê de. Dîroka serhildana wê di zivire destpêka mirovatî, civakî û şaristanyetê. Mirovan her di kevin de ji bo tiştên derdor remz danîye û rojane bi kartîne. Hêdî hêdî xolqandîye û belavkirîye. Ev jî ji ber çî sedemekê be civakî, olî û siyasî jî bibe. Hêma jî ji civakekê ta civaka din cîyawaze . Lê belê “ Li gel serhildana wêjeyê û dinava rêbazên wêjeyê de bi bandor bûye. Ji ber wê jî karanîna remzê gelek kevne. Em dikarin vê destnîşan bikin, remiz herî zêde dinava helbestên nû û yê hevçerx de bikar hatîye.”³¹⁵ Remiz di helbestên nu yê kurdî de di nava xewin xeyal û wêneyê helbestên helbestvanê kurdî de girîngîyekî ya xwe hebûye. Belku bi bandora rêbaza wêjeyanên Ewropî di helbestên nu yê Erebî de serî hildaye.

Li gorî Bodlêr “Cîhan cengekî lêvan lêve remiz destnîşankirîye, rastî ji mirovan veşartîye. Tenê hunermend dikarin wan tiştên jîyanê çêbikin û li hevbidin, ew jî bi ezmunek a sembolê ye.”³¹⁶ Bizava hêma gerî pêktê ji “ Bi kurî li pey tiştên veşartî yê jîyanê, xwezayê û xweşîkbûnê û sehr û ciwaniye digere. Wekî tirajedyayê bin bi sembôl û hêma ne rast û rast amêz.”³¹⁷ Wate hêma ji wê cîhana ku mirov tê de jîyanê peyda dike çêbûye. Lê belê pêwîste aramîya hizra berfireh bike. Hinek kur diçe heya di gehe wan çavkanî û zanyariyên li rex hêmayê xwe veşartîne. Bi vîre digehe wan tiştên di jîyanê de veşartî .

³¹⁴Yusif Letîf, G. New Şefeq, Weş. New Şefeq , j. 58, r. 11.

³¹⁵Yusif Letîf, h.g, h.r.

³¹⁶Pîrbal, Rêbaze Edebîyekan, r. 143.

³¹⁷Muhsîn Aware, Lejêr Sabatî Şîr da, Weş. Yekem, Weş. Roşenbîr, Hewlêr, 2006, r, 48 .

3. Sedemên Bi karanîna Remzê :

Sedemên bi karanîna remzê li cem mirovan de di zivire ser komek sedem û faktorên girîng. “ Edonîd dibêje: Helbest rastîyê digohire, ne ji rûyên ku bi şêwazeka sîyasî yan ji abûrî yan civakî, lê belê ji rûyên ku dizivire û wêneyeka nû ji bo rastîyeka nû baştir û dewlemend tir pêşkêş dike.”³¹⁸ Wekî me li jêr dayîn dîyarkirin.

3.1. Sedema Hunerî û Wêjeyî :

Gelek caran helbestvan ji bo bingeha berhemekî hunerî a bilind çêbike xwe dide alîyê remiz hêmayê. “ Helbestvan ji bo ku ezmûna wî bilind û afrênerbe , hêmayê bi kartîne. Gelek caran jî wekî corekê pîvan û rabûna asta zanebûna helbestvan jî pêve tê girêdan .”³¹⁹Sedemê bikaranîna remzê di bingeha helbestê de dizivire ser zarevayê nû ya helbestê. “Hêmaya edebî pêk tê ji peyvek yan jî çemkeka nîşannê axaftinêye jibo tiştêkî yan jî buyerekê ”³²⁰Pêwîste xwe ji eşkerekirina navê xwe bi parêze û berhema helbestê kişif neke. Belku geran û pîrsyar mayîna peyama helbesta hunerî firehtir bike. Watew û armancê wê teng neke lê belê ji bo kom kirina wênew remizan de jibo xeyalên şîrî û xwendina jor bi jor liber çavên me çêbiket.Bi giştî bi karanîna remzê huner û wêjeyê sedema bandora wêjeya rojava bû. Ev bi karanîna rêbazên wekî Sembolîzm, Dadaizim, Soryalîzm û Pernasizmê.... hwd ye.

3.2. Sedemê Civakî :

Di gelek deman de mirov ji ber edet û toreya civaka ne karîye komek babet û xwestekên xwe yên eşkere bêje. Ji ber wêjî remzê bi kartîne bi taybetî jî di vegotina hinek babetan de. Ev jî dibe rêgirek li ber helbestvan nikare bi eşkereyî bêje jiber vê çendîjî babet bi şêwazekî tem û mijî derdikeve. “ Wekî gelek ji nivîsînên Adgar alan pode dibîne. Dinava mija xeyalan de derxistîye û gelek lêkdanê raveyî û cîyawaz rakirîye.”³²¹

³¹⁸Sabah Îsmâil, Çemik û sitatîkay şiwên le edeb de, weş. Yekem, Weş. Erabxa, Kerkuk, 2005, r.137.

³¹⁹Safiye Mihemed Ehmed, Ladan Le Şîrî Hawçerxî Kurdî de, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r.182 .

³²⁰Azad Ahmed Mehmed, Şeş lêkolînewey şîrî, Weş. Yekem, Weş. Aras, Hewlêr, 2008, r. 68.

³²¹Ekrem Qeredaxî, Sembolîzm Le Edeb û Hunerda, g. Aynde, j. 70, 2007,r. 74.

3.3. Sedemê Sîyasî :

Helbestvan ji bo xirabîya rewşa sîyasî û hebûna tirs sansorê desthiladar, gelek deman de wisan bi helbestvan dike di gotinê de bisekine. Bi neçarî di hinek axaftinên xwe de remzê bi kartîne ji bo destnîşankirina armancê xwe. “ Remiz di hinek helbestên ramyarî de giringî pêdaye, ev jî sedemekî taybet a xwe heye. Goran jî ew qas rastî sitem û meynetê hatîye êdî naxwaze navê wan kesan bîne û rexnejî li wan sîyasîyan girtîye. Naxwaze êdî rastî îşkenceyek zêde were. Ligel vê jî naxwaze dest ji rexne kirina zordarên navxweyî jî bîne .Neçare biçe ber bi remzê ve û herkesekê remzekê hildibijêre.”³²²

3.4. Sedemê Ayînî :

Ev sedem jî wekî sedemên din gelek caran astengî xistîye pêşîya nivîskar û helbestvan. Ji ber wê jî berbi karanîna remzê ve çûyîne. Evê jî di geştên ayîn û ayînzana de bi bandor bûye.

3.5 Sedemên Deronî :

Ev sedeme jî herî zêde di hest û nest û derona kesan de tê dîtin. “ Mirov jî di jîyanê de belku ezmûna başî û xirabîyê encam dabe. Pêwîstî bi tişteki dîyar heye. Wê de bi wê tiştê alîyê wîjanî ya xwe yan jî dil tezîya di deronîya wan de dubare dibe. Vê demê bi nerîneka taybet berê xwe didite van tiştên û bi nerîneka guncaw bo vê ezmûnê Bi derbazbûna demêre ev tişte dibe remiz ji bo vî corê wîjdanê.”³²³ Ew xwestekên wî yê hatî qedexekirin bûye sedemê ku berbi karanîna remzê ve here. “Bi pişgirîya helbestvaba ji bo xeyal û wateya hinek rewşên di nava sing û babetê veşartî remzê bikar tîne.”³²⁴

³²²Amir Tair, Nîma Yuşîc û Ebdulla Goran (Nwê kiridinewe û dabiran), Weş. Yekem, Weş. Hacî Haşîm, Hewlêr, 2006, r. 145.

³²³Şukirî Ezîz El-mazî, Tîyorî edeb, Wer. Serdar Ehmed Gerdî, Weş. Yekem, Weş. Mardîn, Hewlêr, 2010, r. 168.

³²⁴Safiye Mihemed Ehmed, h.b, r. 182.

Di nava kurdan de jî bi karanîna hêmayê dîrokekîdur û dirêj heye. wekî bikaranîna (Ejdîha) hêmaye ji bo çavtirsînê. (Calcolok) hêmaya paşketinêye . (Şêr) hêmaya zîrekîyêye. (Rovî) hêmaya bi fêlbazî û hîlekirinê ye.

4. Corên Remiz (Hêma, Sembol) :

Piştî mirov hatin ser ruyê erdê, avahî û pêdiviyên xwe çêkirin bi hêza xêr û şerê komek remzan serîhilda. Heya ku mirov bi rêya van remiz û diroşman armanca xwe bi gehînin remzê. Ji ber ku xwedîyê wateyekî berfireh û veşartîye. “Huner bigiştî wêje bi taybetî bangawazî ji wan rastî û xweşîkbûna bi şêweyekî asayî nikare bêje . Hîgl wekî filozfekî mînakekî gelek girîng di derbarê xeyal û wêjeyê bi du şêweyên cuda dike: Xeyalê asayî û xeyalê afrêner. Curê duwem taybete bi kesê afrêner kukarê hunera wêjeyî a serkeftî pê dike.”³²⁵ Remiz li gorî bingeha xwe dibe çend corek. Ji ber ku her kesek yan jî her grupekê remiz di nava xwe de bi karanîna ji bo des anîna van sembolan bo armancên xwe. Her corek ji corên remzê taybetmendiyên xwe heye, cudakirina sinorê nêva remzan jî karekî girane. Remza efsaneyê tevlî nava ayîn û dîrokê bûye. Bikaranîna corên wê di zivire ser çend rewşên wekî aborî, ramiyarî, civakî û deronî...hwd. Evan jî bandorekî zêde li ser helbestan hebû. Di nava van remzan de (Ayînî, Efsane, Dîrokî, Çandî, Reng) her yek ji wav xwedî peyamekêne.

4.1. Hêmaya Ayînî :

Eger em temaşeyî burîyê xwe bikin emê bibînin ku hemû tiştêk di çarçûveya ayînê de hikmê li ser kirîye. Ji ber ku di wî serdemî de Mizgefit cihê belevakirina rewşênbirya xelkê bû. Ev jî li gorî ayîna îslamê ye li gorî hemû ayînên din jî cihê belavkirina hizir û fikrê wan hebû. “ Civaka kurd jî wekî tê dîyarkirin dîrokekî ji derveyî ayînê nîne. Êdî ev ayîne yan asmanî be yan jî li ser ruyê erdêbe.”³²⁶ Em dikarin bêjin kesên di nava civakê de jîyan dikin nebê ayînî. Civaka kurd dîrokek ji derveyî ayînê nîne. Ji ber ku destpêkê de bi ayînê ve hatîye girêdan. Xwedîyê peyama û diroşma ayînê bûye.

³²⁵Mihemed Dilêr Emîn, Fazil Mecîd Mehmud, Şikirdinewey regeze şîrîyekanî (Bêsarani) be serinc û dîdgay nwêwe, G. Zankoy Raperîn, j. 6, 2016, r. 19.

³²⁶Eta Qeredaxî , Karîgerî Kelturî Ewan le ser Kurd, Weş. Yekem, Weş. Wezaretî Rewşenbîrî, Silêmanî, 2001,r 16 .

Di ayînê de jî hêmaya pêrevokê (Cadu) berçavan dikeve.“ Cadu û ayîn ji wê cudakîn ayîn pêwîstî bi baweanîna yezdan yan jî heyînekî zindî. Caduyî pêktê ji wê duruşmê ku pêwîstî bi heyînek din heye.”³²⁷ Di virde dîyare ayîn pêwîstî bi mijarên ji asîman tê xwarê ye. Bawerîya wajî pêwîstî bi kesan kirîye. Caduyî jî wisan pênase kirîye karû duruşme. Ev kar û duruşme jî pêwîstî bi heyînekî dî û Mirovên dine. Ji me re eşkere dibe ku xwedî mijarên asîman Yezdane û xwedîyê caduyan jî keseke yan jî çend keseke. Yek ji van zîndîyan jî dibek ku Ehrîmen be. “ Piştî wê hêma û remzê ji alîyê ayînê ve rê daye komek hêma ji bo vî alî jî danîye. Ev jî pêktê ji : Hêmaya Xaç, nîşana ayîna Xiristîyana ne. Bojuvazîyan jî hêmaya bazneyekî wekî galîskeyekê bi kar anîne. Jûlekekan jî Sitêrka Dawud kirîne hêmaya xwe. Sîxiyan Xanda helbijart, Zerdeştîyan jî Faravahar kirîne ya xwe. Silaviye nîw pakanizman destê xweda destnîşan kirîne....hwd.”³²⁸

Çavkanîyên remza ayînê di nava helbestên hevçerx ê kurdî di van xalan de dibînin:³²⁹

- 1- Ayînen asmanî û pirtûkên pîroz yên wekî Qurana Pîroz.
- 2- Ev hêmaiynên peywestin bi hinekayîne dine, rêberên wan wekî (Zerdeşt, Manî û Buza.... hwd)
- 3- Pêxemberan zivirîna wan a dinava jîyanê mucîze. Bi taybetî jî nikarin mucîzeyê eşkere bikin. Ji ber ku ji zanîsta mirovan derdikevin.
- 4- Sirodên ayînê, duakirin, niza, qurbanî, sond xwarin, cejin û hebûna bonê ayînan.
- 5- Ew remzên pêwîstî bi sofîgerî û kesayetîyên mezinê vê derbarê.
- 6- Pîr û zilamên baş, Şêx û rêberên rastgoyî.
- 7- Cihên pîroz yên wekî mizgeft, perstgeh û goristan.
- 8- Xewin.

³²⁷Pexşan Sabîr Hemed, h.b, r. 292.

³²⁸Ekrem Qeredaxî, h.g, r. 74.

³²⁹Yusif Letîf, h.g, r. 19.

9- Cadu nuşte û pirtûk girtin û xwendina paşeroja wan, (Wekî xwendina fincana qehwê . Falik).

4.2. Hêmaya Efsaneyî :

Em nikarin di çend rêzikan de efsaneyê nasbikîn. Lê belê em dikarin hinek balê bidîn ser ew jî dema mirov tiştên di rastîyê de ferahem nabin berbi xeyalê ve diçin û jî rastîyê dur dikevin. Rêya efsaneyê wêneyê zindî gerdun û ew civaka tê de jîyan dîke dikêşe. “Hemû efsaneyek hêmaye ji bo xwe. Lê belê hemû hêmayek nabe efsane.”³³⁰ Gelên xwedîyê efsaneyê jî rêk û pêkîya wane. Wekî beşek ji wêjeya folklorî di samanê girîng yê gelde tê jimartin. Hizra netweyekê fikir û jîyana wan eşkere dîke. Di rêya xeyal û fantazîyê de dur dibe jî jîyana asayî rast ya di nava civakê de. Rêya çêbûna efsaneyê eve mirov li pey nemirîyê geraye. Dema mirov nekare pelewaniya xwe di rastîyê de derbixe, efsane wê pelewantiyê bi mirovan di bexşîne.

Efsaneyê rolekî mezin di jîyana mirovan de dîtîye. Bi rîya efsaneyê kariye xwestekên xwe bi cihbîne. Mirov berdewam li pey pirsyara jîyan û gerdonê de, li pey bersivê gerayîye. Efsane berhema hizrê mirovane. Mirovan jî di destpêkê de bi pirsên balkêş destpêkirîye. Dr Xelîl Ehmed dibêje : “Ev gerdune çîye ? Kê çêkirîye ? Çawe ? kengî ? jiber çî ? Derketîye ? Ev pirsyarene hemû hizirê mirovan di nav xwe de girtîye. Heya niha jî pirsyarkirina ji xwe berdewame. Efsane di demekî dur û dirêj de dîrokek a gelan bersiv bû ji bo bersivan.”³³¹ Li gorî vî fikrê efsane nikare di mirovan de bê danîn li gel mirovan dijî û çêbûye. Di kevin de mirov hizra kahîna kirîye, efsanejî li gel van hizrên mirovan hatîye derxistin. Heya niha jî li gel mirovane. Ji me re derdikeve holê ku pirsyarên bê bersiv mirov di rêya efsaneyê de bersiv girtîye. Efsane bûye bersivêk ji bersivan. Wate ewên di bûrîde çêbûna çûyen di nava dîrokêde. Ji bo carek din em hizra kesan bikîn pêwîste di nava mijaran de lêhurbûnekî bi şeweyekî nû bikîn. Dîrok dîke wêneyek ya helbesta xwe di nava mijarên helbestî de corek lêhurbûnek dîke. Ev hurbûne jî dibe efsaneyekî nû. Ji ber ku di qalibê efsaneyekî nû de çêkirîye. “Helbest bi xwe ji dariştina efsaneyê yan afirandina efsaneya nû pêktê.”³³²

³³⁰Ebdula Xidir, Mewlud İbrahim, Hêmay Efsaniyekan leDîwanî (Nalî ,Salim, Kurdî) Da, G.Ekadîmiyayî Kurdî, j.18, Hewlêr, 2011, r.176.

³³¹Mewlud İbrahim Hesên, Pêkhatey Efsaney Kurdî, Weş. Yekem, Weş. Renc, 2007, r. 60.

³³²Kemal Meruf, h.g, r. 87.

Di nava kurdan de jî efsane çavkanîyekî dewelemende nava helbestên helbestvana . Heya radeyekê efsanekirina helbestên kurdî pesend kirîye. Di alîyekê de ji ber rewşa aluzîya kurdewarî di aliyên din de jî pêşketina civakî bandora wêjeya bîyanî ewrupa û ereban.

4.3. Hêmaya Dîrokî :

Di vir de armanca me dîrok û hemû beşên wêne. Dema mirov di destpêka jîyanê de liser erdê xolqandîye, her çi kirîye û çi serhatîye. Hemû ew hurî karênku di aşitî, şer, nexweşî û heldana ji bo li pey rastîyê û serkeftina bi ser pirsgrêkên neyaran ku dibne beşek ji vê tomarkirinê. Gelek babetên ji van û yên balkêş jî jêre têgotin dîrok. Dîroka wêjeyê jî lêkolînekî di serhildana wêjeyê deye. Yekem afrênerê wêjeyê eşkerikirina komek remz û hêmayane Di bûrî û nihade jî heye wêje bi giştî û taybet wêjeya kurdî çend qonaxên dîrokî yên diyar heye. Em dikarin bi rêya dîrokê re van qonaxan bibînin. Her wiha yek ji van çavkanîyan mirasekî berfireh ji bo nivîskar û helbestvanan bi cih hiştîye. Buye cihê goftogoyê li ser dîrokê. Wisan kirîye helbestvan bikin remiz. Ji ber ku zîrekî, xîyanet, bûyer û çend tiştên din jî dinava xwe de digire.

Dîrok yek ji wan çavkanîyê girîng û berfireh li cem helbestvanan ku “Piraniya wî Pêktê ji bûyer hemû coran ku helbestvan berbi remza dîrokê ve dibe. Di alîyekê de ezmûna xwe pê dewlemen dike . Di alîyê din dejî kesayetên dîrokî wekî demamikakî werdigirin ji bo wateykê bidin helwesta helbestvan. Yan jî kêmasîyên çerxa nû pê derbixe.”³³³ Helbestvanan her kesî li gorî hêza xwe hêma bi karanîne. Hizrên xwe pê gotîne ji bo ku ezmûna xwe pê dewlemend bike. Gelek caran di babetên sîyasîde helbestvanan hêma bikar anîne. Babetên xwe pê veşartîne ji bo ku wan nasneke. Bi taybetî jî bûyera wekî (Enfal û Kîmyabaran) kêma helbestvan hene ku di derbarê wê de ne nivîsî be. Ev her du bûyer bûne hêmaya rojekî giran teji êş û nexweş ku bi serê gelê kurd de hatîye. Bi hezaran zilam, jin, keç , kur zarok, bê cih û warkirîne. Dema dayîk carekê dibîne mergê zarokê wî dişewite. Ev hemû hêmayên bê hêvîyê ne ji bo van bûyerên ku bi serê gelê kurd e hatîne.

³³³Siruşt Cewher Hewêz, Taze Kirdinewe Le Şîrekanî (Azad Dilzar) da, Namey Master, Kolêja Zimanê, Zanîngeha Selaheddîn, 2008, r.45.

Remzên dîrokî yên di nava helbestên Hevçerxên kurdî de ji van bebetan çavkanî girtîne :³³⁴

1- Mêjoyî dêrîn û rîçelekî netewey kurd, Destnîşankirin û bikaranîna medyaya wekî remzekî ji bo kurd. Li pişt mirinê jî desthilatdarên kurd bi armanca şanazî kirinê.

2- Dîroka wê neteweya ku ketîne ber zulm û zoriyê û çirmisîne û ji bav birîne, Mînak : Filistîn, Liblan, Vîyetnam, Efrîqa, (Reşikên li her cihekê ban), Kunxu, cêrnîka....hwd.

3- Dîroka hevçerx, bi taybetîjî di nava dîrka hevçerx a kurdî de,du bûyerên tirajedîk wekî Helebice û enfalê... hwd.

4.4. Hêmayên Kel û Pelên Kevin (Çand, Kelepûr):

Behskirina çandê behskirina di rihê resen yê neteweyetîyê deye. Ev jî ji ber girîngîya rihî di nav laş deye. Eger rih nemîne laş jî mirîye. Ji ber ku çand jî pêwîstî bi fikrên berfireh heye, em nikarin di çend destewajan de girîngîya çanda bidîn eşkerekirin. Ji ber ku rihê mirovan giştî û mirovên nîştîmanperwer û helbestvan dagîr kirîne. Kelpor xwe di girîngîyekî corawcor a hêmayê de dibîne. Hine tiştên di nava kelûpelê kurdî de hêmaya ji bo jîyana wî demî wekî bab û bapîrên me. wekî (Destar) ku raste rast ew wêneyê kevin yê bab û bapîrên meye. Tînin ber çavê xwe û sud jê girtîne bi kartînin. Helbest jî ji sud girtina û karanîna hêmayê bê beş nebûye. Bikaranîna hêmayan di nava helbestê de bi taybetî hêmaya kel ûpela tamedî taybet pê dibexşîne. Me dizivirîne serdema ruhayetî û sakara jîyanê be giştî û bi hêza peywendiyen civakî . Kelepûr bûye pirek a jîyana me ya îro me berbi pêşerojê ve girêdide. “ Helbestvan jî pişt bi kel û belên mîlî ve girê dide, bi awayekî himbêza xwe ji wan re vekirîye. Wekî Pîremêd sud ji kelepûr neteweyî wergirtîye. Peyva (Xwênî Sîyawêş) di nav gotinên kevin ê kurdî de nîşana xwîn rêjandinê ye. Wekî remzekî danîye ji bo xebat û qurbanî danê gelê kurd bikar anîye. Mem û Zîn remzek ya kel û pelên kurdîne sembola heskirinê ye bi wefayî û didarîyê ye.”³³⁵

³³⁴Pexşan Sabîr Hemed, h.b, r. 317.

³³⁵Aso Omer Mustefa, h.b, ,r.182.

Helbestvanên kurd jî karîye di alîyê çavkanîyan de bi şêweyekî berfireh sudê ji çanda gelê xwe werbigire. Bi şêweyekî hunerî û cîyawaz di nava mijar û helbestên xwe de bikar bîne. Tê eşkerekirin ku ev bazara li gel çandê di nava helbestvanan de cîyawazîya xwe heye. Di alîyê girîngî dayîn, sud wergirtin û nexşandina helbestan deye. Her wiha çawe girêdana wan bi rastîya îro ve di cihê pêwîst de.

4.5. Hêmaya Rengê :

Yek ji corên hêmayê ye ku nivîskar ji bo helbestên xwe bi kartîne. Di rêya vê hêmayê de çendîn wêne û tabloyên cuda cuda reng rêje kirîye. Her wekî çawe reng amêra serekî a nîgar kişan dinêye û girîngîyekê pê dide. “ Reng jî ji (wêne , zexrefe, heykel, nexş û nîgar) û piranya karên huneryên berçava pêk tê, wate çav wî dibîne çi bi lê mêzekirineka sade û normal û rût yan jî bi kûrî û lê hûr bûnê û vegohestin jibo nava mêşik û hizirê.”³³⁶Di wêjeyê de bi giştî di helbestan de bandora xwe heye. Wekî “ Li cem Sembolîzman de wekî çawe nîgar kêşan bi şêweyekî diyardir dibînin. bi heman şêwe jî figer û hêl û reng dikin hêma ne tenê sih û ronahî bi şêweyekî rastî.”³³⁷

Bi karanîna hêmayê ji qonexekê ta qonaxa din ji rêbazekê ta rêbazekdin di nava afrêneran de li gorî mercên wan eşkere kirîne. Her wiha reng ji bilîwateya serekî ya xwe çend wateyên din jî di nava xwe de digire. “Bi karanîna hêmayê ji helbestvanekî ji bo helbestvanê din digohreli pey ser barê deronîya wan. Her wiha bi karanîna reng jî ji bilî wateya xwe wateyekî din jî radigehîne.”³³⁸

Reng hêmayên helbestên dirazîne :³³⁹ Rengê reş hêmaya zilm, şev û tariyê ye. Rengê spî hêmaya serbestî, ronî û rojê ye. Rengê sor, hêmaya ji bo xebatkirin û şehîdbûn û fedakarîyê ye. Rengê zer jî, hêmaya westandina gelek di jîyanê de serneketina di jîyanê de, tekoşîn û mirina werza biharê ye. Rengê kesk jî, hêmaya ji bo hêvî ciwanîya xwezayê. Rengê şîn jî hêmaya ji bo paqijî û geşbînîyê ye.

³³⁶Muhsîn aware, Key şîr lagal beşe hunerîyekany di tek dekatewe, G. Nûserî nwê, j. 20, Hewlêr, 2002, r.65.

³³⁷Pîrbal, Rêbaze Edebîyekan, r.147.

³³⁸Fazil Mecîd Mihemed, h.b, r.162.

³³⁹Hesên Xazî Kak Emîn, h.b, r. 266.

5. Hêma û Sembol Di Helbestên Goran De :

Helbestvan Goran her wekî helbestvanên din kariye gelek sembolan dinav helbestên xwe de çêbiket. Bi şêwazekî hunerî û balkêş helbestên xwe bi sembolan dewlemend biket. Ji van sembolan de ku goranî bikar anîne pêktên ji:

5.1.Hêmaya Ayînî :

Helbestvanan ji bo ve gotina armanca helbesên xwe berbi hêmayên ayînî ve çûyîne. Wekî kodekî bi kar anîne ji bo gehandina armancên xwe. Goranê helbestvan jî di çend helbestên xwe de hêmaya ayînî kirîye wesîleyek ji bo zêde eşkerekirina peyamên helbestên xwe . Her wekî di helbesta (Diwa Serinc) de dibêje :

Belam ehremenî gelay bax sîsker
 Bêzare le,cukey denukî kurdî
 Rawkerî daristan le baldar pîsker
 Cêy çîney lê tenîm be dawî wirdî..... (b.p, r. 162)

Di van her du rêzikan de helbestvan ehrîmen bi kar anîye ku bi wateya xwedayê şer û xirabîyê tê. Di ayîna Zerdeşte Ehrîmend alîgirê karên xirape dijî (Ahura Mazda) ku xwedayê başîyê ye. Her wiha di nîva rêzika duwem de helbestvan armanca xwe zêdetir eşkere dike. Ev Ehrîmene (Xwedayê şer û xirabîyê ye) rengê kurdan nade ji bo azadî û serxwebûnê. Belku buye hêzekî serkuter û çespandinê. Li dijî tevgerekî azadîya gelê kurde.

Her wisa Di helbesta (Sewze Gîyayî Payîz) de Goranê helbestvan dibêje:

Taze sirwey bay qudsî (îsa fû)
 Gîyan ekatewe ber dunyâî mirdû
 Ey gîya sewzekey dil ferehawî
 Wek to ser germî sewday hetawî(b.p, r. 137)

Di ayîna Xiristîyana û îslamê de behsa percuyên (îsayê Kurê Meryemê) kirîye. Yek ji percuyên zindîkirina mirîyane, ji bo ku ji xelkê xwe re bêje ev rêkirina xwedayê mezine. Goranê helbestvan Pêximber (Îsayê Mesîh) wekî hêmayekî ayînî bi karanîye. Hêza zindîkirina mirîyan heye û Yezdanê mezin ev percuaî pîroz daye wî da ku rihê bêxe di laşê mirîyan de. Ev Pêximbere hêmaya bê bab ji dayîkbûnê ye û li xaçdanekî bê gunehê. Xwedayê mezin wisan kirîye di nav xelkê de zêde rêza wî hebe û pileyek mezin a wî hebe. Her wekî di nava qurana pîroz de jî hatîye di fermîne:

إِذْ قَالَ الْحَوَارِيُّونَ يَا عِيسَى ابْنَ مَرْيَمَ هَلْ يَسْتَطِيعُ رَبُّكَ أَنْ يُنْزِلَ عَلَيْنَا مَائِدَةً مِنَ السَّمَاءِ قَالَ اتَّقُوا اللَّهَ إِنْ كُنْتُمْ مُؤْمِنِينَ)³⁴⁰

Bê goman armanca helbestvan di vir de ewe can bexşîna bi cîhana mirîyan de. Jareka din bi (fû) yeki wê dunîyaya mirdî zîndî veke.

Her wiha di helbesta (Be Rêgada... Berew Konfirans) dibêje :

Newey şêrko selahedîn.

Palewanî xezay rêy dîn!

Ewey bo pasî qelay Qudis.

Wek berdî ruyî şura, bê tirs

Le ber şîr û tîra westa

Ta dengî hey aman ! hesta :

Le giroy xaç

Ke xacîyan kirdibu be paç

Bo ruxandin

Bo asya pir le mirdin.

Pir le kelawey şarkirdin..... (b.p, r. 230)

Di van çend rêzikên serî de Goran (Selahedînê Eyûbî) wekî hêmayekî olî bi karanîye bi armanca şanazîkirinê. Ji ber ku Selahedînê Eyûbî serokekî kurd bûye. (Qudis) ji destê xaç perestan rizgar kirîye. Bi vê re jî goran şanazî pê kirîye. Ev jî dinava xwe de şanazîya bi neteweya kurde.

³⁴⁰Qurana pîroz , sureta el-maîde, ayeta 112.

5.2.Hêmaya Efsaneyî :

Wekî ku me di pêşîyê de jî behsê kir ev hêmaye herî zêde li gel hest, soz û derona mirovan şer dike ne li gel aqil. Di vir de Goranê helbestvan di helbesta (Bestey Dildar) de bi zîrekî hêmaya efsaneyê bi kar anîye û dibêje :

Ey gewre kiçî " Zeos "
 Xûşke ciwanekey " Vînos "
 To eperistim
 Boye wa mestim
 Bo ayînim egerê
 Hendê kes
 Ba car bidirê
 Toyît û bes!.....(b.p, r. 55)

Di vir de her du efsaneyên Yunan (Zeos û Vînos) ku dîrokek gelek kevin heye. Helbestvan di vê helbestê de bi şêweyekî hûnerî kar li ser hêmayan kirîye. Di cihê gunçaw de bi karanîye. Bê goman ev jî carekêdin hêza helbestvan derdixe. Pisportîya helbestvan jî di efsaneyên ji derveyî kurdan de nîşan dike. Bi karanîna efsaneya (Zeos) Hêmaya ji bo desthilat û mezîniya Efsaneya Yunane bi xwedayê zindanê nasîye. Yek ji xwedayên jêr navê mayîna mirovan şer li dijî xirabîyê kirîye. Her wekî efsaneya (Venos) eger em temaşebikîn emê bi bînin arman xweşikbûne. Bê goman di efsaneya Yunan de (Venos) bi wateya xweşikbûnê tê ku xwedawenda xweşiktî û heskirinê ye. Helbestvan ev her du hêma li cihê yara xwe bikar anîye.

Her wiha helbestvan di mijara (Eroy Oxir) di rêzîkekê de hêmaya (Huma) bi şêweyekî gelek ciwan û hunerî vegotîye wekî dibêje :

Le lay xelqî gedaye gerdî jêr pêy mulkî dildarî
 Be sayet wek huma tacim le ser nakey eruy oxir ?
 Be lerze û zel zeleyew pilpilaney dewrî pûşînit
 Bînay hestîm hemu zêr û zeber nakey eroy oxîr? (b.p, r. 77)

Em dibînin di vê rizika helbestê de Goran ê helbestvan (Huma) bi kar anîye. “Huma yan humayon ew baldêre xelkên kevin wisan zanîne ku bikeve ser pişt wan yan jî jêr sîbera wan ew digehe bilintirîn payeyê.”³⁴¹ Di nava kurdan de huma remza bilindbûn û paşayetiye. Dikevin de eger yek biba paşa pêwîste huma li ser milê wan dayne. Bê goman efsaneyekî dîrokîye di nav kurdan de wakî hêmaya padişahiye hatye dîtin. Helbestvan (Besayet wek huma tacim le ser nakey) Armanca wê beramberî xwe tacê naxe serê xwe paşayeti wekî heskirinekî balkêşe Huma wekî axaftinekê bû ji bo xweş bextîyê.

Her wiha helbestvan di şîra (helbesta Peşîman) de dibêje :

Kifre lay min le yar rencan.
Pêy lê enêm ey zuhrey ciwan !
Herze goyîm kird herçîm wit.
Wa ew çilkem befirmêsk şit.
Be firmêskî peşîmanî
Ey zohrey naz, zohrey ciwanî.....(b.p, r. 61)

Helbestvan di vê helbestê de hêmaya zohre bi kartîne, armanca wî xweşikbûne. Ev jî carekîdin pişsportîya helbestvan dide eşkerekirin ser bi gerdunnas û zanîna navê hesarayên gerdûnê. Her wiha dikare bi efsaneye Yunan lêk bidê xudawenda ciwanî û heskirinê (Efrûdêt) bûye. Armanca helbestvan di karanîna vê hêmayê de misogerîyê li ciwanîya yara xwe dikir.

Goranê helbestvan di helbesta (Ey lawî kurd) de efsaneyek din bikartîne, dibêje:

Ew ejdîhaye jar pijêne.
Parû le naw dem firêne.
Rencder le birsa mirêne.
Wek piling şirke bidirêne !
Ba Kurdistan serfirazbê.
Beheştî nîemet û nazbê !(b.p, r. 307)

³⁴¹Kemal Xembar, Berew Cîhanî Şîrî Çend Şairêk, Weş. Yekem, Weş. Bilawkirdnewey Aras, Hewlêr, 2008, r. 97.

Di nava netewa kurd de efsaneya ejdeha hêmaya ji bo zordariyê û sitemê. Di encamêde ji kesên sitemkar û zordare gotîye Ejdeha. Helbestvan jî ewwekî hêmaya sitemkar bi karanîye û kirîye hêmaya kesê zordar. Di nava efsaneya kurd de Ejdeha bi navê Ejdeharê hef serî hatîye . Ev jî ew alîyê zordariyê her ji bo helbestvan efsaneyea ejdeha wekî hêmayekî ji bo dagirkerên xaka kurdan bi kar anîye. Bê guman behsa serdema dagirkirina Kurdistanê dike, di serdema Behsîyande. Her wiha di heman helbestê de (Piling) bi karanîye ku hêmaye ji bo zulmekî bihêz. Bi karanîna Piling wekî beramberî Ejdeha hêmaya sitemê daxwaza lawê kurd dike. Piling jî beramberî dagirkeran û zulmê sitemê sekinîye.

5.3.Hêmaya Dîrokî :

Bê guman dîrok gelek caran ji bo helbestvanan bûye hêvênê helbestên wan. Dîrok, wekî amêrekî hêmaya amêz di helbestên xwe de bi karanîne. “ Helbestvan ji bo pêkanîna wêneyên helbestan gelek caran sud ji bûyer û kesayetên dîrokî girtîye.ku herdu rûiyên erênî u nerênî û şewaza damezirandina wan û şewaza vegêraneka copî kiriye ne naveroka dîrokêye.Belku rehendekî nû pê dibexşîne, heya li gel hizir fikrên serdema nû de di guncê.”³⁴² Goranê helbestvan di vê derbarê de sudekî zêde ji dîroka kurd û cîhanê dîtîye û di helbestên wî de bibandor bûye. Di helbesta (Yadî pîremêrdî biwêj) de dibêje :

Em behare

Le ser girdî mame yare.

Bo yanze car

Niwê gulaley surî behar.

Xwênî rijaye ser gîyay sewiz.

Xwên pengî xiwardewe wek hewiz

Bo yanze car

Sewize gîyakey girdî yare

Mûy sipî kird wek çûrî şîr

Tûkî kelley bo yanze car

Ba riştîye ber pêy rêbwar.... (b.p, r. 253)

³⁴²Şaxewan Ferhad Mihemed, Kurtîle Şîr Le Edebî Hawçerxî Kurdî da, Weş. Yekem, Weş. Rojhelat,Hewlêr, 2014, r.167.

Goran di van çend rêzikên jor de (Niwê gulaley surî behar) hêma ji bo helbestvanê mezin ê Kurd Pîremêrd ku kuça dawîyê kirîye li girê mameyar de kirîye. Goran piştî derbazbûna 11 salan li ser Pîremêrd re ev helbest gotîye. Her wiha helbestvan di helbestk din de ku helbesta (Şehîd) behsa rojekê dike ku têde xwepêşandaneke li dijî desthilata wî demî kirîye. Li jêr navê bi destxistina mafê xwezayê ê gelê me hatîye kirin. Her wekî dibêje :

Hezar û nosed û sî bû, şeşî eylul ke rojhelat.
Xirîwî wîstinî heq kewte naw şarî silêmanî.
" Helo beg " ew ciwaney pir dilî bu bo weten awat.
Le pêş cemêkewe ta ber sera ruy helmetî hanî
Legel yaranî eywit: ey hikumet ta nekey tesbît
Huquqî kurdewarî nayewê kurd întîxabatit
Ewaney bang kiran û to be quwet dewiryan egrît
Denî û qazanc peristin hîç nebê pêyan mubalatit!.....(b.p, r. 199)

Goranê helbestvan di vê helbestê de behsa xwepêşandan 6/ 9 / 1930 an de ber derîyê seraya bajarê Silêmanî dike. Bê goman li jêr navê mafê kurd ev xwepêşandane çêbû tê de kurdan daxwaza mafên xwe dikir. Helbestvan bi sud dîtina vê dîrokê carek din vê dîrokê û wê rojê li me dide zivirandin. Di rêya helbesta xwe de heya kurd hebe wê ev roj jî zindî bimîne.

Helbestvan di helbesta (Xebatî Gel) de helbestvan dibêje:

Leş gelay dar bû rijaye ser şeqamî panî şar.
Xwênî lê erja weku lafawî baranî behar.
Mêşk û kelley zor bijabû, sing û gerdin têkşika !
Mêşkekanî pir hîwaw singekanî pir (şerar)
Gerçî xurem day ekird baranekey kuştarî gel.
Gel, belam westabû mehkem çeşnî kêwî (îstîwar)..... (b.p, r. 361)

Goran di vê helbestê dîroka rojekî wisan vedigêrît ji bo me ku laşê mirovan wekî pelên daran li ser şeqam ketîbûn û xwîn li ber wan de diçûn. Em dibînin ku çawe bûyerekî tehl a gel bûye îlhama helbestvan. Helbestvan di vê helbestê de wesfa wan rojên giran ji bo nivşê nû dubare dike. zilm û sitemkarîya wî serdemî dike helbestekî zindî, da ku kurd êşa bab û bapîrên xwe ji bîr neke.

Her wiha di helbesta (Cejnî Newroz) de dibêje :

Be surekî tir estêrey însan gir
 Qewmî konî xistewe cejnî agir.
 Kam qewmî kon kam cejnî berz û pîroz ?
 Qewmî madî ! cejnî bilindî Newroz !
 Ew newrozey ke hezaran behare
 Le dêy kurda girî agirî dêyare..... (b.p, r. 154)

Di van rêzikên jor ê helbestê de helbestvan bi sud dîtina ji dîroka kurd û dewleta madî behsa qewmê kurd dike. Her wiha bi hêmaya dîrokî qewmê Arîye wekî ji navbirina zilm sitemkarî û zordariyê. Her ji ber wê jî Goran behsa vê cejna kevin a netewa kurd dike ji ber ku diçe navqela dîrokê de ku serdema dewleta kurd a Medî bû.

5.4. Hêmaya Çand û Kelepûrê :

Helbest faktoreke ji bo nîşandana derdên civakî. Helbest wekî zengileke ji bo şîyarkirina endamên civakê. Di vir de emê helbestek ya Goran bidîn dîyarkirin ku ew jî helbesta (Le bendîxane) ku dibêje :

Ey tirîfey mangî sipî derkî delaqe
 Ba pîs nebî xot mede lem kurdî êraqe !
 Wilateke dagîrkiraw, netewe dîle
 Bawlay duşmin namerdêtî, merdî zelîle !
 Kay le ber seg danrawe, îsqan bo espe !
 Serle cêy kilik bend kirawe, kilik le ser çespe !
 Şêwênrawe bedestî qest şîrazey karî
 Ta asan bê bo surfilî çiriç îstihmarî
 Wek bizin mij dem binête ciwanawî newtî
 lêy derhênê diwa denik û filisî destkewtî.....(b.p, r. 170)

Goran di van çend rêzikan de wêneyê zilm û sitemê kêşaye, di wî sedermî de bi ser civaka kurd de kêşaye. Ji bilîdîtina zulm u zorî û wêneya wê serdemê dibîne. Di rêya çend peyvên kelepûrê milî de zilm û sitemê dide nîşandan. Peyvên wekî (Kaya li ber seg danrawe, êşqan bo espe) ev bixwe dinava xwede remzeke ji bo ne dadperwerîyê. Ji ber ku di bingehê de (Ka) ji bo hespî hatîye danîn, (Hestî jî) ji bo se hatîye danîn. Bi goherîna cihê wan re hevbeşîya wan berevajî kirîye ji bo nîşandana zilm û sitemkarîyê.

5.5.Hêmaya Reng :

Her di kevin de mirovan wateyek ji bo rengê xwezayê danîne, wekî pêwîst dîtine ji jîyanê re. Helbestvan jî di vêderbarê de ne disekinî bi corekê êş , diltengî, xweşî ya rojan bi reng ve gêrdane. Goranê helbestvan jî di vê alî de zanîye û bi şeweyekî ciwan û teji ji balkêşîyê reng bi jîyanê ve girêdaye. Hewildaye di rêya rengên xwezayê de êşên xwe pênasebike.

Her wekî di helbesta (Payîz) de dibêje :

Payîz! Payîz !
 Bukî pirç zerd !
 Min mat to zîz
 Her du hawderd!
 Min firmêskim to baranit.
 Min henasem to bay sardit.
 Min xem to hewrî giryanit
 Diwayî nayê dadim dadit
 Hergiz hergiz,
 Payiz payiz !.....(b.p, r. 135)

Bê goman peyîz rengê zere bi ser rengên vî werzî de serwer dibe.“Wekî eşkereye, ew wêneyê Goran bê wêneyê vê corê wesfêye ji bo peyîzê ye da ku pêşîya goran nekirîye. Goranê helbstvan jî pelên daran gelek caran xweşik wesif kirîye. Darekî rut û bê pel wekî jinekî mil rut çûye.”³⁴³ Her wiha hêmayeke ji bo werîna pelên daran û mergê xwezayê. “ Di vir de goran li gel remza xwestekan de yek digire. Remza xwazan

³⁴³Hawjîn Silêwe, Derya Cemal Hewêzî, Wêney lekçiwandinî paîyz le şîrî (Goran) û (Qubadî Celî Zade), G. Ekađîmîyay kurdî, j. 20, Hewlêr, 2011, r. 68.

jî di xwezayê de neynîka deronîya xwe çêdike. (Min) û (Xweza) dibin yek.”³⁴⁴Bi corekê helbestvan hatîye di rêya rengê zer ê payîzê de xwe bi pelên peyîzê ve berhev kirîye. “Hemî dema helbestvan kur dibe jibo nav xesletên tiştaw henaseyeka sar wekî bayê sar yê werzeka berfê yan jî henase û aheka xemên şoxekî derdixe.”³⁴⁵

Helbest van di rêya rengê xwezayê de dibêje : Wextê mergê min jî gelek nêzîke ku dibêje em her du jî xwedî yek derdîn. Ji ber wê “ Teksta helbestên bandora rastîya fantazîya helbestvane.”³⁴⁶

Her wiha di helbesta (Ey Gelawêj) de dibêje :

Dilim wa gêj eda gerdawî yeis û naumêdî reş.
Meger to bêyte îmdadim, gelawêj ey sitarey geş.
Meger to ey gelawêj ey bizey lêwî seher gahan.
Meger to bisrewênî qulpî êşî qelbî bê saman
Le çawî towepirşingê egate rohî bedbextim
Eka mestî tesellî ta şewî diwayî serî sextim.....(b.p, r. 141)

Tê dîyar kirin ku rengê reş di cîhanê de bi taybetî di rojhelata navîn de renekî ji bo xem û buyeran bi kartê. Carek din jî helbestvan bi sud dîtina ji rengê xwezayê û rengê reş wekî şev, ev jî rêgezê di xwezayê de ye diltengî û ne hêvîyê destnîşan dike. Di vir de rengê kerenga reş bi êşa mirovan ve girêdaye.

Helbestvan di helbestek din bi navê (Hewrî Payîz) de dibêje :

Belê! bigirî hewir baranî payîz bê wiçan bigirî
Leser baxçey gulê wa sîs ebê axir çilî umrî
Bigirmênê tep û nim dabika bîkate şest hergîz
Newestê qulpî giriyanî newestê hewrekey payîz
Tebîet zerd û jakawe, le halî gîyankenîştaye,
Nîşaney matemî payîz le firmêskî diriştaye !(b.p, r. 136)

³⁴⁴Kemal Xembar, Goran Ew Şaîre ke Buwe raberî tazekirdineweh.k, r. 54.

³⁴⁵Heyder Cewher, Arkiolojîyay Epistîmî Mîşêl Foko Xwêndinewey ew dîwî şîrî (Paîzî) Goran, G.Nûserî Nwe, j. 34, Hewlêr, 2006, r. 48.

³⁴⁶Serdar Ehmed Gerdî, Piraktîzekirdinî Sitiratejîyeyê Helweşandinewey Le Şîrî (Payîz) î Goran de, G.Ekadîmîyay kurdî, j. 23, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r. 197.

Di van rêzikên jor de helbestvan dirêya rengên zer ê payîzê de behsa mirin û weşana pelên darên sîsbûn dike. Di vir de rengê zer hêmaya derbazbûna xwezayê ye werîna pelka û mirina xwezayêye. Dema di werza peyîzê de rengê kesk ê xwezayê namîne, berbi zerbînê ve diçe. Ev rengê zer di hizra peyîzê de bi kar hatîye ku belgeyeke ji ser werza payîzêye.

Helbestvan di heman helbestê de di rêzîkek din de dibêje .

Dilopî sard û fênîk ba le ser dar û dewen birjê.

Pepuley zerdî altunî le ser liq helwerê bipijê.....(b.p, r. 136)

Di nîve rêzîka duwem de helbestvan (Pepuley zerdî altunî) wekî hêmaya zerbûna pelên daran bi karanîye. Dîsan jî ji bo werzê payîzê zerbûna xwezayê di vî werzê deye.

Di vir de “Eşkereye ku nu xwazekî wekî Goran karîyê heyea radeyekê bi şêwazekî xweşik û pesend de goran bi ser helbestên kevin de bibe.”³⁴⁷ Ji ber wê jî Goran wekî bab û serkirdeyê nûkirina helbestên kurd î tê danîn. Bi taybet li başûrê Kurdistanê. Derbarê vî babetî jî (Letîf Helmet) dibêje: “Goran piştî ragehandina xebateka mezin di helbestên xwe de , ji despêkê re bi xwe û piştî di gel pişikdariya (Şêx Nurî Şêx Salih) gelek ji jêderên rewşenbîrîya kurdî bi tîyora danana wî xebatî nas dîkin.”³⁴⁸ Her wekî me dizanîn helbestvan goran li vî serdemî de nemaye , lê belê peyva nû xwazîyê û nû gerîyê hemî gava her digel navê goranî de tê . “ Li gel derbazbûna zeman (Goran) jî hîna peyvên nû modern, û hevçerx di helbestên Gorande mayîne. Hemû ew nujenîye piştî Goran jî di salên 70,80,90 û 2000 an de jî ne karîne di helbestên Goran de nu xwazîyekî serekî nûgerî jê werbigire.”³⁴⁹

³⁴⁷ Abid Baban, Çwar Werzey Şiir, Weş. Yekem, Weş. Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 40.

³⁴⁸ Letîf Helmet, Çend mêjw û çend nawêkî taybetmend ûcîyakar le nexşey şîrî nwêy kurdi de, Wer. Mukerem Reşîd Talebanî, G. henar, j. 92, Silêmanî, 2013, r. 109.

³⁴⁹ Hêmin Omer Xoşnaw, Îşkalîyetî xwendinewe rexneyekani şîrî (Goran). G. Zankoy Raperîn, j. 6, 2016, r. 161-162.

ENCAM

Piştî geşta me ya berfiruh dinava jîyan û berhemên Goranê helbestvan de, bandora rêbazên pernasîzm û Sembolîzm di helbestên wî de. Me karîye di dawîyê de em bi gehin çend encamên cor bi cor. Em dikarin di van xalên li jêr de eşkere bikîn.

1- Goran dibin bandora wêjeya bîyanî de, zanîn û girîngîyekî zêde bi Pernasîzm û Sembolîzmê daye. Têgehiştinek baş di derbarê van rêbazên wêjeyî de hebû.

2- Rêbaza Pernasîzm li ser bingeha (Huner ji bo Huner) damezira. Goran jî yek ji wan helbestvana ne ku ruîyê hebestên xwe berev ciwanîyê araste kirîye. Tenê xweşîkbûn bi bê bûna armançekî dîyarkirî bi armanca komkirina cemsêra xweşîkbûnê ye.

3- Di alîyê formê de karîye goherînekî zêde di forma helbestên xwe de bike. Bi taybetî wezin û serwa. Ev jî bingehêk din a hizra pernasîyê û goran jî jê sud girtîye.

4- Di alîyê ziman û hîlbijartina peyvên hevokan de, goran zivirîye ji bo samanê Folklorî peyv û gotinên ser zimanê xelkê bi kar anîye. Ji ber wê jî gelek ji peyvên hevokên wî sade û resenê kurdîne. Di vir dejî sud ji pernasîzman wergirtîye. Ew jî zivirîne ser çavkanîyên Yunanî (Girekî).

5- Goran karîye bi şeweyekî gelek serkeftî bingehêk endezyarî ji bo helbestên xwe daye. Ew jî bi tevlikirina xweşîkbûna xweza û jinê bi şeweyekî gelek xweşik û balkêş. Karîye xweşîkbûna xwezayê di xweşîktîya jinê de berçav bike.

6- Goran di encamê koma van helbestan de karîye li jêr ronîkirina taybetmendîyê Pernasîzmê de şîrove bike. Em dikarin di çend xalên li jêr de dîyar bikîn:

A- Di wesifkirina xweşîktîya jinê de (7) helbestên helbestvan dikeve jêr bingeha pernasîzman de wekî helbestên (Cilwey Şano, Awatî Durî, Huznî Peçe, Bo Ciwanî Sere rê, Le Dirzî Peçe, Gulî Xwênawî û Ciwanî le Ladê).

B- Ew helbestên ji bo wesifkirina xwezayê hunandîye (4) helbest dikevin xaneyê pîrensîbên vê rêbazê de. Ew jî (Beyan, Dimenekî Behar, Bêdarîyek, Dîmenî Rêgawban le Geştî Hewreman de).

C- Di hêvî û aşnaîy û awêzana herdu ciwanîyan de xweza û jinê de (5) helbestên helbestvan hevdû digirin. Li gel bingeha taybetmendîyên pernasan wekî di helbestên. (Afret û Ciwanî, Rewtêkî Ciwan, Ciwanî Bê Naw, Bo Kiçekî Bêgane, Bestey Dildar) .

7- Hêma di gelek helbestên Goran de bi eşkiray dîyare. Lê belê di hindekan de pêwîste xwendevan bi hurî bi hizirin daku jê fêmbikin. Ev jî yek ji pîrensîbên rêbaza simbolîzmêye, pêwîste helbest bi şaş û mij be ji bo ku xwendevan bi xwe li pey veşartina remzan de bigere û bi destbixe.

8- Goranê helbestvan di karanîna hêmayan de sud ji babetên cor bi cor wergirtîye, wekî babetên xwezayî, ayînî, dîrokî, sîyasî û efsaneyî. Karîye bi şêweyekî gelek serkeftî van babetan di helbestên xwe de bi karbîne.

9- Di nava ayînan de ayîna Zerdeşt gelek bi karanîye, ev jî dizivire ser resenîya kevin a kurdî.

10- Goranê helbestvan bi helbestvanê xwezayê hatîye naskirin. jiber ve sedemê di karanîna hêmaya rengê destekî bilind hebû bi taybetî rengê zer. Ji ber ku hemû xweşikbûn di rengê peyîzê de dîtîye wekî hunermendekî nîgar kêş bûye.

11- Di karanîna remza efsaneyê de destekî bilind hebû li cem efsaneya mîlîyan efsaneya cihanî jî bi karanîye. Ev karejî ji ber xwendina helbestên helbestvanên hevçerxên îngilîza û bandora wan liser helbestên goran de bû.

12- Di karanîna remzê de serkeftina şêwazê çêkirina corên remzê bi karanîye. Bihayekî sitatîkî û xweşik bi helbestên xwe daye. Karîye ew wate û armancên ku hebû bi gehîne xelkê. serbarê van remizên ku dinava gelên rojhelat bi giştî û gelên kurd bi taybet karîye remizên cîhanî jî bikar bîne.

ÇAVKANÎ

PERTÛKÊN KURDÎ:

- Aşina, O. (2001). *Reşîd Necîb Jîyanî û Berhemekanî*. Weş, Yekem. Weş, Wezaretî Perwerde. Hewlêr.
- Aşina, O. (2002). *Goran, Nûsîn û pexşane Wergêrawekanî*. Weş, Yekem. Weş, Wezaretî Perwerde. Hewlêr.
- Arif, H. K. (2012). *Nawdarani Edeb*. Weş, duyem. Weş, Hemdî. Silêmanî.
- Aware, M. (2006). *Lejêr Sabatî Şîr da*. Weş, Yekem. Weş, Roşenbîr. Hewlêr.
- Baban, A. (2012). *Çwar Werzey Şîr*. Weş, Yekem. Weş, Rojhelat. Hewlêr.
- Bayîz, E. (2003). *Simay Şîrî Kurdî Diway Raperîn*. Weş, Serdem. Silêmanî.
- Bekir, M. (2004). *Kêş û rîtmî şêrî folklorî kurdî*. Weş, yekem. Weş, wezaretî perwerde. Hewlêr.
- Bêdar, C. H. (2013). *Derwazey şîrnasîn*. Weş, Yekem. Weş, Bazari Zanist. Hewlêr.
- Birî, M. B. û Makfarlin, C. (2008). *Modêrnîzm*. Wer, Behzad Hewêzî. Weş, yekem. Weş, Rojhelat. Hewlêr.
- Borekeyî, S. S. (1375). *Mejuy Wêjey Kurdî*. Weş, Yekem. Weş, Çihir Tebrîz. Bane Kurdistan.
- Cefer, M., Tofîq R. H. (2007). *Goran le yadeverî havçerxekanîda*. Weş, yekem. Weş, dezgay çap û pexşî Hemdî. silêmanî.
- Çîya, M. (2004). *Ferhengî Felsefî*. Weş, Duwem.
- Deştî, O. (2009). *Hêmin Name*. Weş, Rojhelat.
- Ebramîz, M. H. (2009). *Tîyore Modernekanî Edeb û Rexne, Wer. Osaman Ehmed*. Weş, Jîr. Silêmanî.
- Ehmed, P. E. (2009). *Şêwazî şîrî Goran*. Weş, Yekem. Weş, Renc. Silêmanî.
- Ehmed, S. M. (2012). *Ladan Le Şîrî Hawçerxî Kurdî de*. Weş, Hacî Haşim. Hewlêr.
- Ehmed, S. M. (2014). *Şêwazî şîre Kurdiyekanî Pîrbal Ehmed*. Weş, Yekem. Weş, Rojhilat. Hewlêr.
- El-mazî, Ş. E. (2010). *Tîyori edeb*. Wer, Serdar Ehmed Gerdî. Weş, Yekem. Weş, Mardîn. Hewlêr.
- Eswed, N. E. (2011). *Ferhengî Zareway Edebî û Rexneyî*. Weş, bînayî. Silêmanî.
- Eytuty, O. Y. (2007). *Ferhenga Zaravên Rewşenbîry*. Weş, Yekem. Weş, Azadî. Dihok.
- Farûqî, O. (2011). *Şîrî Kurdî û Şêwazekanî Le Sereta Heta Emro*. Weş, Roşenbîrîm. Hewlêr.
- Fetah, R. O. (2013). *Romansîzm le şîrekanî Hêmin û mihemmed Nurî de*. Weş, Yekem. Weş, Mukiryani. Hewlêr.
- Gerdî, E. (1999). *Kêşî şîrî Kilasîkî Kurdî û Berawirdkirdinî legel Erozi Erebi û Kêşî Farsî da*. Weş, Yekem. Weş, Wezaretî Roşenbîrî. Hewlêr.
- Helebceyî, M. S. (2013). *Golistan jîyanî navdaran û şairanî kurd*. weş, yekem. weş, Hivî.
- Hemed, P. S. (2012). *Remiz Le Şîrî Hawçerxî Kurdî Kurmancî xwarû Kurdistanî Iraq (1970 - 1991)*. Weş, yekem. Weş, Hacî Haşim. Hewlêr.
- Hesen, H. S. (2004). *Şîr û şemşîr*. Weş, Yekem. Weş, dezgay çap û belavkirdinevey aras. Hewlêr.
- Hesen, M. Î. (2007). *Pêkhatay Efsaney Kurdî*. Weş, Yekem. Weş, Renc.
- Hisên, H. (2007). *Rêbaze Ederbîyekan*. weş, yekem. weş, Dezgaha Aras. Hewlêr.
- Hisênî, R. S. (2006). *Qutabxaney Edebîyekan*. Wer, Heme Kerîm Arîf. weş, yekem. weş, Wezaretî Perwerde. Hewlêr.

- Hilmî, R. (1956).*Şîr û Edebiyatî Kurdî*. B. Yekem. Bexda.
- Huseyn, C. E. (2008). *Îstatîkay Deqî Şîrî Kurdî Kurdistanî îraq (1950-1970)*. Weş, Yekem. Weş, Dezgay çap û pexşî Serdem. Silêmanî.
- Îbrahîm , M. E. (2012).*Pêkhatay Zimanî Şîrî le Rewangey Rexney Edebî Nû ve Ezmonî Şairanî Hewlêr Wek Nimûne*. Weş, Yekem. Weş, Mukiryani. Hewlêr.
- Îsmail, N. R. (2010). *Erkî Şîr le edebî kurdî de salanî (1920 - 1958)*. Weş, Yekem. Weş, rojhelat. Hewlêr.
- Îsmail, S. (2005). *Çemik û sitatîkay şiwên le edeb de*. weş, Yekem, Weş, Erabxa. Kerkuk.
- Kak Emîn, H. X. (2008). *Nûkirdinewey Şîrî kurdî salî 1932 ta salî 1949 le kurdistanî îraq da*. Weş, Yekem. Weş, rojhelat. Hewlêr.
- Kefaîy, M. E. (2011).*Edebî Berawirdkarî*. Wer, Hejar Rehîmî. Weş, Yekem. Weş, Rojhelet. Hewlêr.
- Lê Morgan, Ewanî tir. (2014).*Binemakanî Rexneyî Edebî*. Wer, Samal Ehmedî. Weş, Rojhelat. Hewlêr.
- Mehmud, A. A. (2008). *Şeş lêkolînewey Şîrî*. Weş, Yekem. Weş, Aras. Hewlêr.
- Mehmûd A. E. (2012).*Bunyadî Ziman le Şîrî Hawçerxî Kurdî de (1985-2005)*. Weş, Duhem. Weş, Hacî Haşim. Hewlêr.
- Mehmûd F. M. (2007). *Sirût Le Şîrî Goran de*. Weş, Yekem. Weş. Dezgay çap û Pexşî Serdem.
- Mela Kerîm, M. (2009).*Nalî le Kilawrojney Şîrekaniyewe*. Weş, duhem. Weş, Aras. Hewlêr.
- Mewlud, M. X. (2008). *Newzad Refet Şairî efrênerî Şîrî nwêy kurdî*. Weş, Rewşenbîry. Hewlêr.
- Mewlud, R. S. (2009).*Endêşey Şîrî Lenêwan Rêbazî Kilasîk û Romantîkî Kurdî Le Kurmancî Xwaruda*. weş, yekem. weş, Şehab. Hewlêr.
- Mihemed, Ş. F. (2014). *Kurtîle Şîr Le Edebî Hawçerxî Kurdî da*. Weş, Yekem. Weş, Rojhelat. Hewlêr.
- Mustefa, A. O. (2009).*Beha îstatîkekanî Şîr lay Pîremêrd û Şêx nûrî Şêx Salih û Goran*. Weş, Yekem. Weş, Xanî. Dihok.
- Panîz, B. (1386). *Dîwanî Goran Ebdulla Goran*. weş, sêyem. weş, Dalahû. tehran.
- Pîrbal, F. (2005). *Reg û rişekanî tazebûnewey Şîrî kurdî*. Weş, Yekem. Weş, dezgay kurdistan. Hewlêr.
- Pîrbal, F. (2009).*Rêbaze Edebîyekan*. Weş, sêyem. Weş, Şivan.
- Qeredaxî , E. (2001).*Karîgerî Kelturî Ewan le ser Kurd*. Weş, Yekem. Weş, Wezaretî Rewşenbîrî. Silêmanî.
- Remezani, A. (2015).*Destpêkek ji bo zanista edebiyata modern*. Weş, Yekem. Weş, peywend. Îstanbûl.
- Resûl, I. M. (1990).*Edebiyatî Nûêy Kurdî*. Weş, Ferkirdinî Bala. Hewelêr.
- Sabîr, P. (2006).*Rexney Edebî Kurdî û Meseley Niwê Kirdnewey Şîrî*. Weş, Yekem.
- Salih, A. K. (2012).*Rexney Komelayetî û Piraktîzekirdinî le Şîrekanî Goran*. Weş, Hacî Haşim. Hewlêr.
- Taqane, E. (2001).*Tofîq fikret û Şaire nwê xwazekanî kurd*. Weş, yekam. Weş, wezaretî perwerde. Hewlêr.
- Tair, A. (2006). *Nîma Yuşîc û Ebdulla Goran (Nwê kiridinewe û dabiran)*. Weş, Yekem. Weş, Hacî Haşim, Hewlêr.
- Xalid, Î. W. (2004).*Çeveng Di Hozana Rîyalîsta Kurdî da devera behdînan 1970 - 1991* .Weş, Wezaretî Perwerde. Hewlêr.

- Xelîl,Z. (2013).*Ferhengî Zimanî şîr û çend Xwendineweyek Dike*. Weş, Yekem. Weş, Rojhilat. Hewlêr.
- Xembar, K. H. (2006). *Çend Lêkolîneweyekî Edebî*. Weş,Roşenbîrî. Hewlêr.
- Xembar, K. (2008).*Berew Cîhanî Şîrî Çend Şaîrêk*. Weş,Yekem. Weş, Bilawkirdnewey Aras. Hewlêr.
- Xeznedar, M. (2006).*Mêjoy Edebî Kurdî*. B, şeşem. Weş, Yekem. Weş, Belawkiriwey Aras. Hewlêr.
- Zal , A. (2015).*Zimanê Kurdî*. Weş, Duhem. Weş, Bizim Buro Enqere.

PERTUKÊN EREBÎ:

- Bedir, E. (1995).*Mezahib eledeb elxerbî*. Weş, Dar elşuaca. elkwêt.
- Ehmed, M. F. (1978). *El-remiz wel-remziye fi el-şîr el-muasir*. Weş, duyem. Weş, dar el-mearif. el-ahîre.
- El-esfer, E. (1999).*El-mezahib el-edebîye lede el-xerib*. Weş, el-esed . Dîmeşiq.
- El-hawî, Î. (1983).*El-bernasîye aw mazheb el-fen lîl fen fi el-şîr el-xerbî wel-erebî*. Weş, duem. Weş, Dar el-seqafe. bayrut (lubnan).
- Hisên, H. (2012). *Antolocîya el - şîr el-kurdî*. Weş, el-seqafe. Erbil.
- Luîs, S. D. (1983).*El-sure el-şîrîye*. Wer,Ahmed Nesîf el-cenabî wa axerun. el-kwêt.
- Qurana pîroz. Sureta El-Maîde, Ayeta, 112.
- Şanûf, H. E. (1957).*Şîr êlşair Elkurdî Elmeasir Ebdulla Goran, Neqîle Enîl-Azerbaycaniye, şekor Mestefa*. Weş, Darelcahiz. Bexdad.
- Wilîk, R. (1987).*Mefahîm neqdîye*. Wer, Dr Mihemed Esfur. Al-kwet.
- Xembar, K. (2008).*Ebdulla Goran, Raîden Lihereket Tecdîd Elşîrîl Kurdî*. weş, Xanî. Dihok.

KOVAR:

- Aware, M. (2002). *Key şîr lagal beşe hunerîyekany dî tek dekatewe*. G, Nûserî nwê. j, 20. Hewlêr.
- Bîmar, E. (1970).*Daniştinêk Legel Goran*. G, Beyan. J, 2. Bexda.
- Camî, N. (2007). *Ezmunî şêrkoîy (Xwêndineweyekî sîmolojîye bo ezmunî şîrî şêrko bêkes)*. G,Karwan. j,213. Hewlêr.
- Cewher, H. (2006). *Arkiolojiyay Epistîmî Mişêl Foko Xwêndinewey ew dîwî şîrî (Paîzî) Goran*. G,Nûserî Nwe. j, 34. Hewlêr.
- Debax, E. (1988).*Goran û Goldesmet û tazekirdinewe lu honrawe de*. G, Roşenbîrî nwê. J, 118.
- Ebdulwahîd, A. (2006).*Kêşey Nûkirdinewey şîr, Kêşî xomalî û raberayetî şîrî nwê*. G, Karwan. j, 66.
- Ebdulla, P. (2006).*Şîrî wêneyî*. G, Şîr. j, 2. Hewlêr.
- E dihê, M. (2012).*Qutabxane Edebîyekan*. G, Raman. J, 185. Hewlêr.
- Emîn, M. D. û Mehmud,F. M. (2016).*Şikirdinewey regeze şîrîyekanî (Bêsarani) be serinc û didgay nwêwe*. G, Zankoy Raperîn. j, 6.

- Gerdî, S. E. (2012). *Piraktîzekirdinî Sitiratejîyetî Helweşandinewe Le Şîrî (Payîz) î Goran de*. G, Ekadîmîyay kurdî. j, 23. Weş, Hacı Haşim. Hewlêr.
- Helmet, L. (2013). *Çend mêjw û çend nawêkî taybetmend ûcîyakar le nexşey şîrî nwêy kurdi de*. Wer, Mukerem Reşîd Talebanî. G, henar. j, 92. Silêmanî.
- Heqnas, E. û Perîşan, M. (2014). *Towanaxwazî Dengêkî Taybet Le Herzî û Werzî Cuwamêrî da*, Nûserî Nûê. J, 66. şobatî 2014.
- Hesen, L. M. (2006). *Rehendekanî ciwanî kiç le honirawey bo kiçêkî bêganey goran de*. G, Şîn. j, 19. Hewlêr.
- Îsa, H. S. (2011). *Rolî wişey haw watakan le binyatnan û ciwan kiridînî şîr*. G, Ekedamîyay kurdî. j, 19. Hewlêr.
- Letîf, Y. (2005). G, New Şefeq. Weş, New Şefeq . j, 58.
- Meruf, K. (2005). *Remz le Şîrekanî Şêrko Bêkes da*. G, Raman. j, 101 . Hewlêr.
- Muhemed, D. E. (2016). *Pêgey şîrî kilasîky kurdî le edebî rojhelatî de*. G, Zankoy Raperîn . j, 6.
- Pîrbal, F. (2004). *Kironolojîyay şîrî nwêy kurdî 1898-1958*. G, Şîn. j, 3. Hewlêr.
- Qeredaxî, E. (2004). *Deselatî Ciwanî Sirûşt û be perawêzkirdinî xwdy Kurd wekû biker le şîrî Kurdistanî Goran da*. G, Karwan. J, 188-189.
- Qeredaxî, E. (2007). *Sembolîzm Le Edeb û Hunerda*. G, Aynde. j, 70.
- Silêwe, H. û Hewêzî, D. C. (2011). *Wêney lekçiwandinî paîyz le şîrî (Goran) û (Qubadî Celî Zade)*. G, Ekadîmîyay kurdî. j, 20. Hewlêr.
- Xembar, K. (2011). *Goran Ew Şaîre ke Buwe raberî tazekirdinewe*. G, nûserî nvê. j, 58.
- Xidir, E. û Îbrahîm, M. (2011). *Hêmay Efsanîyekan le Dîwanî (Nalî ,Salim, Kurdî) Da*. G, Ekadîmîyayî Kurdî. j, 18. Hewlêr.
- Xidir, K. Î. (2014). *Tarîkî şew û Pencerey îşq*. G, Nûsrî Nûê. J, 660.
- Xoşnaw, H. O. (2016). *Îşkalîyetî xwendinewe rexneîyekanî şîrî (Goran)*. G, Zankoy Raperîn. j, 6.

NAMEYÊN EKADEMÎK:

KURDÎ:

- Hesen , E. E. (2007). *Lêkçûn û Ciyawazîyekanî Nûkirdinewe Lay Goran û Nîmayoşîc*. Namey Doktora.
- Hewêz, S. C. (2008). *Taze Kirdinewe Le Şîrekanî (Azad Dilzar) da*. Namey Master. Kolêja Zimanê. Zanîngeha Selaheddîn.

EREBÎ:

- Ebûd, H. (1984). *El-tebîet fî el-şîr El-erebî El-measir*. camîet el-besre. rîsalet macîster.

- Madî, F. (2012). *Dewir alemîye we mezahîbuhu fî tetewir el-edeb we zuhur ecnasîhî el-edebîye*. rîsale Macistêr . cezaîr.
- Selman, N. (1954). *Mealim el-rmzîye Fî el-şîr el-sowfî el-erbî*. Rîsale lînîl şehade (ustaz fî el-elum) El-camîa el-emerîkiye fî Beyrut.

ÎTERNÊT:

- Alerebî, W. B. Y. (2008). *Nezerîye elfen lîlfen*. (www.alukah.net).
- Alîsawî, A. S. (2006). *Al brnasye*. (www.furat.alwehda.org.sy).
- Edad alnedwe alalemeyee lîlşebab alîslamî. (2006). *Al biransîye (Mezheb Alfen lîlfen)*. (www.protsaid-online.com).
- Hesen, R. (2009). *Îtirafekey Şêrko Bêkes*. Siwêd. (Kurdistan net,info).
- Herzeleyî, R. F. (2008). *Bemihwerbûnî Jin Le Şîrî Afret û Ciwan Goranî şair de*. (www.pcdk.org).
- Îçmen, R. (2015). *Ebdulla Goran(1904-1905), Helbestvan û Nivîskar:* (Tavrost.blogspot.com.tr/2015/05/abdulla-goran-1904-1962-helbestvan.html).
- Pîrbal, F. (2009). *Goran sîrwanî pernas le şîrî kurdî de* (www.raman.com).